Kurd Newyama

Rojnameya Gîştî ya Hefteyî — Hejmar 15 / Sal 1 — 17.12.2004

Kurdish weekly newspaper — Kurdische Wochenzeitung

Newsprint Media GmbH Dreieichstr 3A 64546
Mörfelden; Entgelt bezahlt; VKZ 65774

Birnebun
Postfach 90 03 48

Av. Sedat Yurttaş: Ev îlan plana dewleta tirk tevlihev kir

Rûpel 3



Wêne: Avestakurd.com

Bingeha Muzika min li ser Muzika me ya Klasîkê avakirîye. Ango, ez bawerim bingeha min Gelek saxlem e



Rûpel 9

Serok wezîrê berê yê Almanya Helmut Kohl got

„Ez bawer nakim ku Tirkiye pîvanên kopenhagenê bi cî bîne“

Rûpel 7

Bîranîna şehîdên Qamişlo

Rûpel 6

Li Hewlêrê festîwala strana Kurdî

Rûpel 15

“Textor wê ji birçînan nemirin” Pijîşkên kurd û rewşa wan piştî guhertinên li Elmanayayê

Rûpel 7

Nêrgiza Omerî Jina Kurd

Rûpel 7

Allerjî



Rûpel 12

D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1,70 EUR

4 196577 401503 15

Ewrûpa go erê erê, lê belê !

Rapora ku endametiya Tirkiyê ji bo Yekitiya Ewrûpayê tewsiye dike li Parlamentoya Ewrûpayê hat pejirandin.

Di pêvajoya muzakereyan de dewleta Tirk mecbûr e ku nav û mafên gelê Kurd nas bike û weha di nav YE de cîg bigire, an bi statuyek din qayîl bibe.

Dewleta Tirk ji bo destpêkirina muzakereyan li benda biryarek bê şert û merc e. Serokwezîr Erdogan û gelek rêvebir û berpirsiyarên Tirkan eşkerekirin ku ew “şirîkatiya bi îmtîyaz” jî qebûl nakin. Li gora wan Tirkiyê “pirsa Kurdî” jî di nav de hemû kriterên Kopenhagenê bi cîh anîne.



Di rapora pêşniyaziya YE de ku di 6ê Çiriya Pêşîn de hat weşandin daxwaziya çareserkirina pirsên kêmneteweyan dihat kirin. Wan rojan jî Tirkiye tevlihev bû. Di vê mijarê de rapor li ser raporan hatin nivîsandin. Rûpelên rojname û ekranên telewizyonan bi vê mijarê hatin dagirtin. Di çarçoveya Tirkiyê de axaftinên ku dikare navên “maqûl” jî lê bibe hatin kirin. Lê di encamê de ji bo vê mijarê tu gav nehat avêtin. Dewleta Tirk xwe ker û lal kir.

Rûpel 3

Bi îlanekê du maske hatin xwarê

Di 8 û 10 û 14ê mehê de bi dorê, di rojnameya International Herald Tribune, di rojnameya Le Monde û di rojnameya Frankfurter Allgemeine Zeitung de îlanek bi qasî nîvrûpelî ku ji aliyê 200 Kurdan ve hatibû îmze kirin, bi sernivîsa “Li Tirkiyê Kurd çi dixwazin?” derket.



Rewşenbîr, hunermend, nivîskar û siyasetmedarên Kurd yên cûrbecûr di pêvajoya endametiya Tirkiyê ji bo YE de ji berpirsiyarên Tirk û Ewrûpî re daxwaz û hêvîyên xwe ji bo çareserkirina pirsa Kurdî bi rêz dikirin.

Ji ber “dil mayîna” Tirkan Leyla Zana, Hatip Dicle, Orhan Dogan û Selim Sadak bi daxuyaniyek bi lez û bez ragihandin ku wan îlan nexwendine û îmze kirine. Berdevka grûbê Leyla Zana eşkere kir ku “ew” ne ji “wan” in û girêdayiya xwe ya bi dewleta “unîter” re carek din îlan kir.

Rûpel 3

Bayram Ayaz	Lokman Polat	Fadil Özçelik	Orhan Zuexpayi
Daxuyaniya Kurdan, rûyê gelekan aşkere kir...	Rêwîtîya nivîskar Lord Kinross...	Ev ne tu hal e!	Xalê Mehmed (2)
Rûpel 2	Rûpel 6	Rûpel 5	Rûpel 17

www.aisr.org

Ji peyama Kurd

Rojnamevaniya Kurdî karekî ne hêsa ye, lê cihê serbilindîyê, serfirazîyê û bextewarîyê ye...

Xwendevanên hêja !

Rojnameya we gîha hejmara panzdehan.

Û em carek din bi dilşadî li gel civata we ne. Li nav koçka xwendevanan...

Her hejmara nû ya rojnameyê ku derdikeve, belav dibe, rihekî geş li gel xebatkarên rojnameyê peyda dike. Em dibêjin qey me zêrek din avêt xilikê, kûpên çanda kurdî... Û bi vê yekê, xezîneya neteweya Kurd piçekî dewlemendtir kir. Digel hemî dijwariyan, ev tişt mirov bextewar dike.

Mirov li ber çavên xwe dibîne, çawa dorberên me dijminahiya me dikin. Çawa û bi çi planên dilreş û lewitî kar dikin ku ziman û çanda Kurdî bihelînin. Dijminên gelê Kurd û Kurdistanê zêde zêde giraniya xwe didin ser ziman.

Eger zimanekî neyê xwendin û nivîsandinê, nebe zimanekî fermî li dibistanan û bi rêk û pêk hînî nifşên nû nebe, ew ziman di nav salan de dimire û diçe. Dema ziman mir, çanda bi wî zimanî jî winda dibe. Ziman û çand, digel jiyana ser axa bav û bapîran, çivakekê dike, xelkekî xweser. Ziman û çand û welat sutûnên xelkekî xweser in.

Li bakurê Kurdistanê temenê rojnamevaniya Kurdî kin e. Hele, rojnamevaniya Kurdî ya xurû bi zimanê Kurdî gelek kin e.

Li welat rojnameya Rojname, Azadiya Welat û Pîne tenê bi Kurdî derketin. Rojname mixabin tenê hejmarek derket. Azadî, Ronahî, Hêvî û Roj jî derketin, lê ev rojname bi Kurdî û Tirkî bûn, Dema Nu hêj bi du zimanan derdikeve. Li derveyî welêt Armanc demekê tenê bi Kurdî derdiket. Kurdistan Press, rojnameyek profesyonel bû, lê ew jî bi du zimanan û piranî bi Tirkî bû.

Rojnameya we, Peyama Kurd di dîroka rojnamevaniya kurdî de ya yekemîn e ku bi sê zaraveyan û du elfabeyan tê çapkirin. Di Buroya Peyama Kurd de yekîtîya Kurdistanê pêk hatiye! Emê vê şopê bernedin û her biçe xurttir bikin.

Di warê rêxistinên demokratîk de jî hin mînakên wisa xweş hene. Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê wisa ye: yekîtîya Kurdan û Kurdistanê di Federasyonê û komeleyên endamê wê de pêk hatiye. Ev jî serbilindî ye.

Divê em alav û nîşanên miletekî xweser biafirînin û pêşkêşî dinyayê bikin. Di rojnamevaniya Kurdî de jî divê em êdî dev ji du zimaniyê berdin. Kîjan xelk rojnameyên xwe yên neteweyî bi du zimanan li gel hev çap dikin? Eger pêdiviya me bi rojnameyekî Tirkî, Erebî an Farisî heye, bila em wê rojnameyê jî derxin. Lê ev rojname dikare bibe rojnameyeke ragihandinê bi zimanekî biyanî. Rojnameyeke wisa em nikarin wek rojnameyeke Kurdînetewî bi nav bikin. Rojnameyên netewî, rojnameyên bi zimanên wî netewî ne!

(Berdewam rûpel 10)

Daxuyaniya Kurdan, rûyê gelekan aşkere kir...

Bayram Ayaz

Vê hefteyê min dixwest li ser polîtîkaya „tirkîyeyîtîyê“ rawestim. Bîr û hizrên xwe di derbarê bandora vê polîtîkayê li ser tevgera bakurê Kurdistanê binivîsim. *Tirkî(yeyî)tî* bila bimîne hejmara pêş.

Nuha, daxûyaniya rewşenbîr û siyasetvanên Kurdan ya ku Enstîtuya Kurd li Parîsê organîze kir û di rojnameyên Ewrûpî de derket, rojevê bi temamî dagirtiye. Ev karekî gelek pîroz e û pêwist e ev yekdengî bihêztir bibe. Û em nehêlin ku dewleta Tirk vî karî pûç bike. Dewleta Tirk ji bo ku tesîra daxûyaniyê bişkêne dê hemî îmkanên xwe bi kar bîne. Genelkurmay û Imralî jî sedî sed aciz bûne û ew jî dê bêdeng nemînin. Xerakirina leyistikên dewletê hinekî di destê rêvebir û berpirsiyarên Dehapê û kesayetên li vê hêlê de ye. Ew di rewşeke taybetî re derbas dibin.

Eger karekî ramanî û polîtîkî dijminan nerehet bike, bizanin ku ew karekî rast e...

Siyasetvan û ronakbîrên ku di rêxistin û dezgehên ser bi xeta Imrali de kar dikin, gelekên wan ketine rewşeke wek *„di nav mizgevtê û dêrê de mayî“*. Çendekî ji wan, em nas dikin, mirovên Kurdperwer in, dilê wan ji bo doza milet lêdide. Ji alîyekî, ev ciwanmêr jî bi qasî me Kurd in û welathiz in. Lê ji alîyekî din ve, jahra apoyîtîyê ketiyê laşê wan û mejiyê wan çeliqandiye. Ev kesên wisa, di nav Kurdayetiyê û pesindana hizrên Kemalîst de wekî kesên di hêlekanan de diçin û tên.

Carna aliyê wan Kurdperwer geş dibe, mirov bi wan helwestan dilşad dibe. Lê piştre, emirnameyek ji Imraliyê belav dibe, ku tê de pesnê Kemalîzmê dide, doz û daxwazên gelê Kurd hîç û pûç kiriye, Kurdan xistiye perçeyek ji *„neteweya Tirkîyê“* û gelek tiştên din... Vêca roja dîtir tu dinêrî, ew însanên ku berî çend rojan behsa Kurdayetiyê û Kurdistanê dikir, dest pê kirine li goreyî talîmatnameyên Imraliyê tiştên ecêb dibêjin.

Ev rewş, ev wêneya ku li pêş çavên me ye dide xuyakirin, bê prosesa tevgera bakurê Kurdistanê di halekî çawa de ye! Kes bila ji me re nebêje, ew apoyî ne, çi ji me re ? Apoyî be, korîcî be, tolaz û derbederên bajarê Amedê, Wanê, Eluhê bin, ev hemî jî pirsên me ne, mijarên tevgera Kurd in. Siyasetvan û rewşenbîrên li ber miletê xwe û dîrokê berpirsiyar, nekarin xwe ji ber van pirsan bidin alî.

Me li jor got, rewş wekî hêlekanê ye. Tiştekî din jî dixwazim lê zêde bikim. Bizava welatparêza bakurê Kurdistanê, halê keriyê pez ku guran daye navê lê hatiye. Dewleta Tirk, bi taybetî van pênc salên dawî, dezgeh û pisporên xwe wekî guran bera ser tevgera Kurd daye. Bi siyaseteke hîz, fêlbaz lê kar dike ku tevgera neteweyî ya Kurd ji bîr û baweriyên Kurdayetî û Kurdistanîtîyê dûr bixe.

Caran ji bo ku mirov rastiyan binase, musîbetek ji hezar nesîhetan çêtir e!

Stratejiya dewleta Tirk serî heta binî ev e. Bi maddî û manewî lê kar dikin, bê çawa Kurdan bixapînin ku ew doza miletbûnê nekin, nebêjin welatekî me (Kurdistan) heye, em xwedî zîman û çandeke cuda ne û em dixwazin li ser axa xwe xwe îdare bikin, bibin xwedî dewlet û desthilatdariyeke demokrat. Çîrok hemî ev e.

Dewletê di vî warî de A. Ocalan bi temamî xistiye nav lepên xwe. Van nêrînan pê dide gotin û nivîsîn. Vî kesî jî, vî karî ji çi sedemî dibe bila bibe, qebûl kiriye û dike. Karê dane ber wî, van nêrînan bi kadro û alîgirên vê tevgerê bide qebûlkirin e. Nêrînên dewleta Tirk û yên A. Ocalan bidin ber hevdu, yek in. A. Ocalan dibêje: Em doza axê (welatê cuda) nakin; em dewlet mewlet naxwazin, otonomî, federasyon yanî sîstemên ku tekabûlê dewletê dikin daxwaza van tiştan kevneperestî ye; dibêje Kurd perçeyek ji neteweya Tirkîyeyê ne, yanî neteweyeke xweser nînin; baş e ku xwedêgiravî zimanê me bi temamî li me qedexe nake, ji xêra xwe (!) dibêje bila Kurd zimanê xwe prîvat hîn bibin, ji dewletê zêde tiştekî nexwazin. Ji bo mafê Kurdan li Tirkîyeyê van tiştan dibêje, lê berê Kurdan dide cîhê din, dibêje bila Kurd Rojhilata navîn demokratîze bikin, bila Kemalîzmê û nêrînên Muray Bookchin (têzên ser ekolojîyê û ji holê rakirina hiyerarşiyan) baş hîn bibin û gelek sosretiyên din. De were neteqe!

Baştir e, di demekî zutir de zelal bibe, gelo “Kemalîst Kürtler” kî ne û dixwazin çi bi sere tevgera Kurd bînin? Ew û Kurdperwerên rasteqîn bila ji yek du bên cudakirin.

Eger mirov bixwaze miletekî bindest li gor hesabên dewleta dagîrker û mêtînger bixapîne, wî kerr û gêj bike, divê mirov bi temamî wekî A. Ocalan bike. Elhaq, vî karî “ziłam” baş dike. Vêca ku hin xuşk û birayên me vê rastiyê hêj naxwazin bibînin, mirov şaş dimîne!

Eger hinekî nexwazin rastîyan bibînin jî, lê rastî bi xwe roj bi roj xwe dixin kanîya çavê herkesî.

Rewşa A. Ocalan ev e! Lê hin siyasetvanên dora Dehapê û *“Kongreya Gel”* hêj bi îsrar bazara A. Ocalan dikin. Bavo, mêrik xwe gîhandiye hinekan û tiştên ji we re dibêje gotinên wan hêzan in. Ew hêz jî dixwazin ev meriv her tim ser serê Kurdan bimîne. Ji ber ku ew baş dizanin çi fêdê jê dibînin.

Ev daxûyaniya dawî vê rastî carek din raxist pêşiya me.

Kurd di daxûyaniyê de çi dixwazin ? Dibêjin em bîst milyon in, Tirkîye ji bo Tirkên Qibrîsê kîjan heqan dixwaze, em jî wan mafan ji bo xwe dixwazin. Wey li mino! Tirkan tofan rakirin. Tew Denktaşê ku xwe kiriye *“reîscumhurê”* sed û bîst hezar Tirkan ku ji sisiyan duyê Tirkên Qibrisê jî li dijê wî ne, qîreqîr pê ketiye, xeberan ji Leylayê re dide çima ku Kurdan ev daxwaz kiriye?

Kurdên hêj bi aqil nebûne bila dersa xwe ji Denktasê Tirkê Qibrîsî bigrin!

Bi rastî, ev A. Ocalan çima aqil nade, Denktaş?

Çima ji wî re nabêje, “Sayin Rauf Denktaş! Kişisel hak ve özgürlükleri genişletin ve Rumlarla **ortak vatan** oluşturun. Maraş bölgesini boşaltin, sinirlari kaldirin ve Türk ordusunu geri çekin. Nedir bu Federasyon Konfederasyon gibi gerici, çağdişi çözümler, vazgeçin bunlardan. Bu isteklerin ileri sürüldüğü anlaşma ve bildirilerden, aynen Leylalar gibi hemen imzalarinizi geri çekin!”

(Wergera Tirkî dawiya nivîsê ye)

(Berdewam rûpel 4)

Impressum

Xwediyê Rojnameyê
Peyama Kurd Verlag
Peyama Kurd
Thomas-Mann-Str. 22, 53111 Bonn / Germany
Fon: +49 (0228) 18 00 654
+49 (0228) 18 00 655
Faks: +49 (0228) 18 00 656
www.peyama-kurd.com
info@peyama-kurd.com

Redaksiyon
Kurmancîya jorîn:
Fadil Özçelik (Editorê Berpirs), Siwan Heci Berko (Editorê Rojava û Diasporayê), Silêman Alîxanî (Sa), Z. Perîxanî (Nivîsarên û bêhnvedanê)

Kirdkî (Zazakî):
Seydxan Kerbî (Editor, so)

Kurmancîya jêrîn:
Dana Ali, Venus Faiq, Simkan Azîz, Nizar Cal, Cotyar Dardiros, Mansur Sidqî, Mustafa Chuaktay

Peyama Kurd ji mafê xwe dibîne, ku nivîsên jê re tînê şandin, kurt bike. Ew ji alîyê rêzman û rastnivîsînê ve di serastkirina berheman de azad e. Peyama Kurd berhema ku jê re tê şandin û berê li cihekî din hatibe belavkirin, nawesîne.

Ewrûpa go erê erê, lê belê !

Heta ji 29ê meha 10an û vir de ku roja dameziranding Komara Tirkiyê ye, Serokkomar, Serokwezîr û Fermandarê artêşa Tirk jî di nav de gelek rêvebir, siyasetmedar û komandarên Tirk wek li hevdu kiribin, carek din dest bi çîroka "Tirkbûn"ê kirin û bibiryarî anîn ser zimên ku herkesên li Tirkiyê dijîn Tirk in, ango; pirsên wan ya netewî-kêmnetewî nîne.

Rêvebirên dewleta Tirk ev helwesta xwe bi weşandina îlana Kurdan jî carek din dubare kirin û serokwezîr Erdogan got ku Tirkiye ji 72 milyon însan pêk tê. Tirkiyê guh nade pêşniyaziyên YE.



Sedemên piştgirtin û li dij derketinê

Raportorê Hollandî yê YE Camiel Eurlings di civîna 13ê mehê ya PE de got, ew bawer nake ku Tirkiyê bi tevahî krîterên siyasî yên Kopenhagenê bi cîh aniye. Eurlings ragihand ku li Tirkiyê hîn xalên tarî henê û got, „Êşkence hîn heye, mafên kêmnetewan bi sînorkirî ne, pirsgirêkên azadiya ramanê, dewleta hiqûqê û destûra bingehîn hene." Serokê grûba sosyalistan Martin Schultz eşkere kir ku wê raya wan „belê" be. Û rexne li Demokratên Xirîstiyan kir û got: „Him dixwazin ku Tirkiye kêmasiyên xwe yên di derbarê mafên mirovî temam bikin, û him jî naxwazin ku muzakere dest pê bikin. Ger muzakere dest pê nekin wê ev çawa bên çareserkirin." Serokê grûba Keskan Daniel Cohn-Bendit got ku destpêkirina mûzakereyan wê alikariya pêvajoya pêşketin û xurtbûna demokrasiyê bike.

Ji aliyê din serokê Parlamentoya Ewrûpa Josep Borrell ragihand ku berî endametiya YE gelek gavên ku divê Tirkiye bavêje heye, û eşkere kir ku ji bo endametiyê bi kêmasî 10 sal divên. Serokkomarê kevn yê Fransayê Valery Giscard d'Estaing nêt û fikira gelek dewlet û partiyan bi awayekî wekirî dibêje ku YE ne mecbûre ku hemû cîranên xwe bistîne nav yekitiyê. D'Estaing weha diaxife: "Mijar ne ku Tirkiyê krîter bi cîh aniye an na. Mijar ew e ku ger welatekî derveyî Ewrûpa bibe endam û bibe mezintirîn welatê YE pê re dikare bê xebatkirin an na ye." Yên ji endametiya Tirkiyê ji herkesî bêtir aciz in jî du partiyên Almanî yên muxalefetê ne. Hevkariya CDU/CSU di wê baweriyê de ne ku endametiya Tirkiyê ya YE barekî girane û ji bo rê li ber girtina endametiya Tirkiyê li seranserê Ewrûpa di nav hewldanek mezin de ne.

Dewleta Tirk çi hêvî dike?

Serokwezîr Erdogan ragihand ku tu tiştekî YE ji me bixwaze nemaye.

Erdogan got, ku me hemû krîterên Kopenhagenê bi gîh aniye û em naxwazin bi tu krîterên dervî Kopenhagenê deynin pêşiya me û weha dom kir: "Madem ku li ser masê tiştek nemaye êdî ji vir û wêde ji 25 welatên endam re maye." Erdogan ragihand ku Tirkiye ji dervî endametiyê jî bi tu formulek din ne qayil e.

Di dîroka YE de endametiya tu welatekî ewqasî nebûye mijara minaqeşê.

Ji sala 1963an û vir de ev 41 sal e ku Tirkiye li ber derî rawestiyaye. Tirkiye ji bo derbasbûna hundir ne gavên hewce davê û ne jî ji bèr derî bi dûr dikeve.

PE rê li ber Tirkiyê vekir

Berî civîna serokkomar û serokwezîrên dewletên endamên YE, di 15ê mehê de Parlamentoya Ewrûpa (PE) biryara tewsiyeya destpêkirina muzakereyan bi Tirkiyê re pejirand. Di PE de 407 parlamenteran dengê xwe ji bo qebûlkirina Tirkiyê û 262 parlamenteran li dij bi kar anî.

Biryara tewsiyê bal kişand ku tam endametiya Tirkiyê wê bi hewldana terefan girêdayî be û muzakere berî sala 2014an bi dawî neyê.

Bi îlanekê du maske hatin xwarê

Di îlanê de tê eşkerekirin ku rapora Komisyona Ewrûpa, li Tirkiyê Kurdan 15-20 milyon xuya dike û ev jî kêm zêde ji çara yek nifûsa hemû Tirkiyê ye. Wek her civatekê heqê Kurdan e jî li ser erdê bav û kalên xwe bi rûmetî bijîn, nasname, kultur û zimanê xwe biparêzin û bigihînin zarokên xwe.



Kurd dibêjin ku vî gelê ku di domayiya sedsala 20an de rastî neheqiyên mezin bûye, hêviya xwe ya pêşerojê bi beşdariya Tirkiyê ji bo Ewrûpaya aşîtîxwaz, demokratîk, pluralîst û pirkulturî ve girêdayî ye. Û weha dom dikin, "Tirkiye divê mafên ku welatên demokratîk yên Ewrûpî dane hemwelatiyên xwe yên Bask, Katalan, İskoç, Lapon, Tirolên başûrî, Valon û hwd. an mafên ku Tirkiye ji Tirkên Kibrisê bixwe dixwazin, ji Kurdan re jî garantî bike." Di îlanê de Kurd baweriya xwe ya ku pêvajoya endametiya Tirkiyê şansa di nav sînorên dewletê de çareserkirina pirsa Kurdî dide, diyar dikin. Ji bo vê yekê tedbîrên go bên stendin weha bi rêz dibin:

Makzagonek demokratîk û hevdem ku derxistina efûyek giştî, ji nû ve avakirina 3.400 gundan û vegera nêzîkî 3 milyon gundiyên kurd, naskirina hebûna gelê Kurd, bi zimanê Kurdî perwerdeyî û çalakiyên çapamenî, bi zimanê xwe damezirandina komel, sazî û partiyan garantî dike divê bên hazir kirin û bikeve meriyetê. Kurd ji rêvebirên Ewrûpa daxwaz dikin ku ev xwestekên wan ji bo beşdariya Tirkiyê ya YE wek pêşemerc qebûl bikin.

Leyla Zana: Dixwazin Tirkiyê bikşînin rewşek kaotîk

Piştî ku îlan wek bombekê ket rojeva Tirkiyê Leyla Zana, Hatip Dicle, Orhan Dogan û Selim Sadak bi daxuyaniyek nivîskî li pişt îmzeya xwe ranewestîn û îddîa kirin ku rojevek neyînî tê afirandin. Ew bi daxuyaniya xwe radigihînin ku misyona wan a siyasî bi çareseriyên otonomî û federal li hevdû nakin û bi jêwegiraneke ji îlanê Kurd, bi hewldana xirakirina pêwendiyên Tirkiyê û YE tawanbar kir û diyar kirin ku "ew" ne ji "wan" in. Di daxuyaniyê de weha tê gotin: "Li Tirkiyê û di qada navnetewî de hêzên ku naxwazin Tirkiye di YE de bê qebûl kirin, dixwazin ku, bi hevkarî ji bo ku di demek nêzîktirîn de bi perspektîfek tam endametî stendina biryara muzakereyan asteng bikin, pêvajoyê provoke bikin, Tirkiyê bikşînin rewşek kaotîk û di şexsiyeta me de berdêlê ji gel re derxin."

Reaksiyonên rêvebiriya dewleta Tirk

Ev şîmaqa, ku bi bêwextî xwarin û difikirîn ku Kurd êdî "kedî" kirine, bi Tirkên ku her fêrî lêdana Kurdan bûne zor hat. Ji lîberalîstan heta faşîstan hemûyan bi zimanekî derveyî siyasetê û dîplomasiyê Kurd bi peyvên giran îtham kirin.

Serokwezîr Erdogan ev hewldana Kurdan bi lîstikek gemarî bi nav kir û got ku ev kiryar ji aliyê hinekan ve û bi riya çapameniya biyanî li dijî Tirkiyê hatiye kirin. Erdoganê îslamîst jî çîrok û derewa kemalîst û faşîstan dubare kir û got: "Vî milletê eziz ku mîna neynok û goşt bi hevre kewiyane bi kijan pîvanên tarîxî, sosyolojîk, coxrafî, îktîsadî û siyasî hewl didin ku ji hevdû biqetînin, famkirina vê ne mimkin e." û carek din îspat kir ku ji guhê gê dernakeve, wê her siyaseta red û înkarkirina gelê Kurd û welatê wî Kurdistan bişopîne.

Wezîrê karê derve Gul jî got ku ev îlan ji derve hatiye nivîsandin, bi temamî karekî cahilane, bi metodek ajantî û pîyontî hatiye kirin.

Ev çend roje ku li Tirkiyê ji siyasetmedaran bigirin heta bi rojnamevanan tu kesek nemaye ku bi vî ziman û mejî Kurd tawanbar nekirine.

Rastiyek heye ku Kurdan Kurdistan jî di nav de, Tirkiye bêtir li ber çavên Tirkan şêrîn kirin û hezkirin dan.

Xwezî ew dijminatî û çavnebariya Tirkan Kurdistana me jî bi me bi kêmasî qandî wan şêrîn û hezkirin bida.

Sedar Yurttaş: Min îlan xwend û îmze kir

Di derbarê îlana Parisê de me bi telefonê ji birêz Sedat Yurttaş pirsî:

Peyama Kurd: ***Gelo hûn vê îlana Parisê çawa dinirxînin?***

Sedat Yurttaş: Di amadekirina wê de para min tunebû. Lê dema hevalan pêşniyarî ji min re anîn, min xwend, naveroka wê ket serê min û li gor wê min îmze kir. Li gor min ev 80 salin Kurd li Tirkiyê dihatin înkarkirin. Lê di van çend salên dawî de tê qebûlkirin, lê dixwazin di pêvajoya Ewrûpa de jî bê statu bihêlin. Helwestek nediyar datînin. Ji ber vê yekê jî naveroka wê di cîh de ye. Li ser vê îlanê gellek nîqaş hatin kirin û ez dibêm bi vê yekê gihişt armanca xwe.

(Berdewam rûpel 6)

Ev ne tu hal e!

Fadil Özçelik

Di hejmara me ya 14an de nûçeyek bi ser nivîsa „Ciwanên DEHAPê ‚sê nasnameya' dixwazin" hatibû weşandin. Li gora nûçeyê Ciwanên DEHAPî di xwepêşandinekê de pankertek li ser „Ez ewropî me, ez Tirkiyeyî me, ez kurdim, çerkezim" nivîsî vekiribûn.

Herweha di 11ê meha 12an de grûbek jinên DEHAPî li bajarê Stenbûlê ji bo Parlamentoya Ewropî nameyek şandin. Di vê çalakiya xwe de jinan jî pankartek li ser „Ez Kurd im, ez Tirk im, ez Çerkez im" nivîsî vekirine.

Ji herkesî diyare ku xwediyê van dirûşmên ku niha bûye mode û DEHAP bi Kurdan re wek benîşt cûdandin dide, Öcalan e.

Ev dirûşme serokê faşistên Tirk Alpaslan Türkeş anî bîra min.

Alpaslan Türkeş "nasnameya Tirk" weha îfade dikir: "Ez çiqasî Tirk im ewqasî Kurd im û çiqasî Kurd im ewqasî Tirk im!"

Ez li ser cudatiya van herdu ifadeyan gelekî fikirim. Min tu ferq nedît.

Belkî ew kesên ku bi pîspîska Öcalan gelê Kurd û faşîstên Tirkan digihîne hevdu karibe me jî têbigihînin; ger ku bi wan re hîn piçekî ûjdan, his û berpirsariyek netewî mabe!

A.Öcalan di dîroka Kurd û dinyê de ne kesê yekemîn e ku bi vê ecêbê her tiştî serûbin dike. Lê divê bê gotin ku tu kesî jî qandî wî ne zirar daye gelê xwe û ne bi bîr û bawerî û bi hêvî û heyalên gelê xwe lîstiye û şkandiye.

Xwediyên vê projeya tarûmarkirina mejîyê Kurd niha bi "kihekih" û çepikan li çalakiyên "Kurdan" dinêrin. Gêjbûn û tewşbûna wan jî dostên gelê Kurd şaş û mat dike.

Wek her milletî, gelê Kurd jî êdî newêre bifikire ku li dû yekî wiha dikare her tiştî bi derbekê de bifroşe û teslim bibe, ewqas berdêlên giran daye.

Windakirina "serokan" ne hêsan e, milletan hustuxwar dike, qewet û şewqê pê re nahêle. Bi girtina Öcalan re agir bi xwe xistina nêzîkî 100 Kurdên ciwan ne belasebeb bû. Belkî hilbijartina "serokatiya" Öcalan jî ji bo van rojên „giran" bû.

Jinên DEHAPî li bajarê Stenbûlê ji bo Parlamentoya Ewropî nameyek şandin. Di vê çalakiya xwe de jinan jî pankartek li ser „Ez Kurd im, ez Tirk im, ez Çerkez im" nivîsî vekirine

Mijareke gelekî dûrî hevdu be jî divê em Galile Galileo bi bîr bînin.

Galile jî li himber mahkemeya engîzis-yonê ala teslîmiyetê kişand; bi înkar û redkirina fikirên xwe yên zanyarî jiyana xwe xilas kir. Piştî mahkemê, şagirt û alîgirekî wî jî, bi stuxwarî nêzîkî wî bû û bi dengekî têkçûyî jê re wiha got: "Eywax ji wî milletî re ku serokê xwe winda kir!"

Bersîva Galîle ez bawer dikim ku ji herkesî bêtir me Kurdan eleqeder dike: "Eywax ji wî milletî re ku hewcedariya wî bi serokekî re heye!"

Galîle li xwe mikur hat. Bêsihûdiya me Kurdan ew e ku Öcalan hîn jî wek ku pisîkek çawa bi mişkekê re dileyize destê xwe ji qirika vî milletê belangaz ku ev neheqî heq nekiriye, bernade.

Generalekî Amerîkî li Enqerê hat birîndar kirin



Generalekî Amerîkî li balafirxaneya Esenboga ya Enqereyê bi guleyên eskerekî Tirk birîndar bû

Rojnameyên Tirk dibêjin çaxa Generalê Amerîkî li tirimbêlê siwar dibû tifinga mihafizekî Tirk teqiya û guleyek li teşka Generalê Amerîkî ket.

Ji aliyê din cardî medyaya Tirkan dibêje, tifinga eskerekî ketiye erdê û fişekek teqiyaye û li teşka Generalê Amerîkî ketiye.

Li gor nûçeyên Haberturkê ko ji Ihlas Haber girtiye, çaxa Generalê Amerîkî derbaz dibe tifinga eskerekî Tirk diteqe û li ser hev gelek gule tên berdan. Guleyek li teşka Generalê Amerîkî dikeve.

Dewleta Tirkan ji hemî dewletan zêdetir dijminahiya Amerîkayê dike. Ne tenê dewlet lê kesên dibêjin ew Tirkin jî Amerîkayê dijminê xwe dizanin. Li gor îstatistîkên Egitim-Sen-ê, pirs ji deh hezar mamostevan hatine kirin, 53,9% ji mamosteyan Amerîkayê dewleta ji bo Tirkan herî tehlûke û 27,9% jî Israîlê dewleta herî tehlûke dibînin.

Anqara - Generalê Amerîkî yê bi navê Peter U. Sutton li ber deriyê xeta derve ya balafirxaneya Esenbogayê hat birîndar kirin. Medyaya Tirkan dibêje bûyer qezayek bû lê bûyerê ji hev cuda dinivîsînin. Generalê Amerîkî ji bo civînekê hatibû Enqereyê. Ambasadorê Amerîkayê yê Enqerê berî çend rojan gotibû, dikanên Tirkan tiştan nafiroşin Amerîkiyan.

Generalên Tirk, gelek Kurd kuştine

Generalên Tirk, bidestê caşan(îtîrafkarên PKKê), Kurd kuştine û bixwe jî, di nav vê kuştinê de cî girtine.



Wêne: Aksiyon.com

Tîmê Înfazê yê JÎTEMÊ (Îtîrafkarên PKKê)

Mihemed Erên/Amed

Li gor îddîanameya ku niha di dadgeha Amedê de tê darezandin, Generalên Tirk, bidestê caşan(îtîrafkarên PKKê), Kurd kuştine û bixwe jî, di nav vê kuştinê de cî girtine.

Li gor vê îddîanameyê, li Tirkîyê, di navbera van 15-20 salên dawîn de li hember gelê Kurd şerekî kifêt hatiye kirin. Di vî şerî de gelek Kurd hatine kuştin, wendakirin û koçkirin yan neflkirin.

Di vê îddîanameyê de gelek navên GeneralênTirk dibûhire, ji ber ku tekoşîna gelê Kurd biteflnin û têkbibin, di nav Artêşa Tirk û di nav caş û îtîrafkarên PKKê de bi navê "JÎTEM"ê rêxistinek terorkirinê çêkirine û bi hezaran welatperwer, ronakbîr û tekoşerên Kurd kuştine. Heta gelek gundiyên reben û bêguneh jî...

Dîsa li gor vê îdeanameya dadgehê, ev rêxistina JÎTEMÊ di nav gelê Kurd û Tirk de gelek hêzên çeteyan çêkirine û bi destê van çeteyan, gelek mirov kuştine û revandine, ji aliyê siyasî û aborî de gelek xirabî li gelê Kurd û Tirk kirine.

Li gor vê şddîanameya ku van rojan li Dadgeha Amedê de lêkolîn li ser tê kirin, hin dozdar û dadger dixwazin ku general û kesên ku navê wan di vê îdeanameyê de heye û beşdarî vê rêxistina terorê bûne, bên darezandin û ceza li wan bê birîn.

Ev bûyer, li gelek rojnameyên Tirk yên mezin hatiye belavkirin. Li ser vê yekê, di nav gelê Kurd de jî nerazîbûnek mezin bilind bû. Ew jî dixwazin ku ev kes bên cezakirin.

(Berdewama rûpela 2)

Abdullah Öcalan xwe şaş bike tiştên wisa bêje, dê *"dostên wî"* generalên Tirk qiyametê li serê wî rakin. Jê re bêjin ev ne karê te ye, me ji te re gotiye van tiştan ji Leylayê û Qandilê û Kongreya Gela Ewrûpayê re bêje. Qibrisa Tirkan ne Kurdistan e û Rauf Denktaş jî ne wek zilamên te ye!

Gotineke pêşiyan heye dibêjin: musibetek ji hezar nesihetan çetir e! Ev *"musibeta"* daxûyaniyê, carek din aşkere kir, bê dewleta Tirk çawa herdu tiliyên xwe di çavên hin siyasetvanên Kurd de kiriye, wan kerr û kor û gêj kiriye û ji doza wan dûr xistiye!

Li dawiyê carek din hangî hemî rewşenbir, înternemend û siyasetvanên Kurd dikirin, pêwist e wek daxwazên minîmal çarçoveya vê beyanê, pirrengiya wê û yekdengî û hevahengiya wê were parastin. Di prosesa muzakereyên Yekîtiya Ewrûpayê û Tirkîyê de divê Kurd bibin hêzek û daxwazên xwe ên *netewî-siyasî* bi temamî bidin pêjirandin. Bi kêmasî naha divê xuşk û birayên Dehapî ji xwe ji pişta van daxwazan nedin paş, israr bikin. Belê eger Tirkîye û Denktaş ji bo sed û bîst hezar Tirkan Dewleteke Konfederal dixwazin, miletê Kurd jî vî heqî dixwaze.

Dewlet ji Tirkan re heq û helal e, çima ji me Kurdan re qedexe û heram be?

(A. Öcalan, tenê bi Tirkî diaxive. Me jî gotinên ku qaşo ew bike weki ustûbê wî li jor bi Tirkî nivîsî! Em van gotinan ji bo xwendevanan dikin Kurdî ji:

*"Birêz Rauf Denktaş! Maf û azadiyên kesayetî xurt bikin û bi Rûman re bi hevre "welatê hevbeş" daynin. Devera Maraşê yê dagirkirî vala bikin, sînorên we di nav Qibrisê de kişandiye rabikin û bila artêşa Tirk vegere Tirkîyê. Ev çîne hûn behsa federasyonê, konfederasyonê dikin, van tiştên ne hemdemî. Dev ji van tiştan berdin. Înîsiyatîfê xwe ji bin beyanên wisa bikşînin, aynî weki Leylayê bi lezî.")

Li Îranê, li hemberî Kurdan zixt û zor zêde dibin

Dewleta Îranê ji bo li ser Kurdan cerdevaniyê ferz bikin, rûniştvanên gundê Koto yê girêdayî bajarê Xoyê, tehdît dikin



Parlementa Îranê

Îran - Dewleta Îranê ji bo li ser Kurdan cerdevaniyê ferz bikin, rûniştvanên gundê Koto yê girêdayî bajarê Xoyê, tehdît dikin.

Hêzên Îranê ji bo cerdevaniyê li ser gundiyan ferz bikin, ji Seyad Delalî xwestine, bibe qasid û gotiye, heger nebe qasid ewê ji wezîfeya wî ya alîkariya muduriyeta gumrukê bê dûrxistin. Herweha gef û tehdît li mamoste Mehmet Derwêşî jî hatine kirin. Hat diyarkirin ku keya Talip şsmaili jî ji ber zixt û zora dewletê, qasidiya ji bo ferzkirina cerdevaniyê li ser gundiyan, qebûl kiriye.

Artêşa Îranê, bi taybetî li derdora gundên Kurd yên Urmiyê gelek caran operasyonan pêk tîne.

Di Azadiya çapameniyê de Tirkiye hêvî nade

Tirkiye ku dixwaze bibe welatekî Ewrûpî di warê azadiya çapameniyê de her li cihê xwe radiweste



PK - Tirkiye ku dixwaze bibe welatekî Ewrûpî di warê azadiya çapameniyê de her li cihê xwe radiweste. Di pîvan û raberkirinên navnetewî de Tirkiye gelekî paşde xuya dikin. Li gora rapora Rêxistina rojnamevanên sînornenas (RSF) li Asya, Koreya Bakur, Burma û Çîn; li Rojhilata navîn Suudi Erebistan, Îran û Sûriye di nav rêza welatên xirabtirîn de cîh digirin. Li gora encama sêyemîn a lêkolina RSFê Koreya Bakur di nav 167 welatan de di dora dawiyê de ye.

Tirkiye di lîsteyê de ji 157 welatan dora 115. dadigire û piştre Gine Bissau û Filîpîn tên. Suudî Erebistan di dora 159, Îran 158 û Sûriye 155an de ne. Balkêşe ku di warê azadiyê de Kuba jî tenê Koreya Bakur li dû xwe hiştiye û di rêza 166an de rûniştiye.

Danîmarka di listeyê de li ser hemû welatan cîh stendiye û di dereca yekemîn de ye. Wî welatî bi dorê Fînlandiya, Îrlanda, Îzlanda û Norveç dişopînin. Dewletên yekbûyî yên Amerîka di rêza 31. de ye.

Li Almanya Bilûrek 35 hezar salî hat dîtin

Stuttgart - Arkeologên Zaningeha Tubingen di şikeftek li başûrêrojava li Çiyayên Suab de "Bilûrek hestî" dîtin. Li gora daxuyaniya Zaningeha Tubingenê tê texmin kirin ku 35 hezar sal berê însanên ku li vê herêmê dijiyan buhar û zivîstana xwe li van şikeftan derbas dikirin.

Ji aliyê Zaningeha Tubingenê hat ragihandin ku Bilûra 35 hezar salî wê li muzeya Stuttgartê bê pêşandin.

Serok wezîrê berê yê Almanya Helmut Kohl got:

„Ez bawer nakim ku Tirkiye pîvanên Kopenhagenê bi cî bîne"

Ev pevajo bi kemanî 10-15 sal didome. Heta wê gavê kes nizane kesên, ku niha ji bo endametiya Tirkiyê ya YE hewl didin, li ser hikum bin. Ew neheqî û neduristî ye ku hinek niha ji bo endametiya YE soz didin Tirkiyê.



Serokwezîrê Almanya yê Kevn Helmut Kohl, di 15ê mehê de li ser endametiya Tirkîyê û polîtîkaya derve ya hikumeta Almanya bi rojnama „ Frankfurter Allgemeine Zeitung" hevpeyvînek çekir.

Helmut Kohl di vê hevpeyvînê de dibêje: " Ez bawer nakim ku Tirkiye ji bo tam endambûna YE pîvanên Kopenhagenê bi cîh bîne" û dîtinên xwe wisa tîne zimên " Di pêvajoya endametiya Tirkiyê ya YE de wê îmtîhankirina Tirkiye, ciddî, di binê kontrolê de û di encamek ne dîyar de, bidome. Divê Tirkiyê bi temamî pîvanên Kopenhagenê bi cîh bîne, divê ev pîvan neyên serobino kirin. Ne weha be emê baweriyê nedin hev. Wê ev pêvajo bi kêmanî 10-15 sal bidome. Heta vê gavê kesên ku niha ji bo endametiya Tirkiyê ya YE hewl didin, ewana êdî wê ne li ser hukmê bin. Ew neheqî û neduristî ye ku hinek niha ji bo endametiya YE soz didin Tirkiyê. Çimkî ew dizanin ku ew ne mecbûrin li ser soza xwe bisekinin û ew dizanin ku ewê ji endambûna Tirkiyê ya YE nikaribin rayên hemwelatîyên xwe bigrin. Ew gotinên min ji bo serokdewleta Fransa Chirac û poltîkwanên din ji derbas dibe."

Helmut Kohl li ser firehbûna YE jî wisa dibejê:" YE yê bi endambûna dewletên Bulgaristan,

Romanya û hinêk dewletên Balkanê, digihê maxsîmûm firehîya xwe, ez bawer nakim yekîtiya polîtîk êdî bikaribe ji wê zêdetir bar bikşîne"

Helmut Kohl di derheqa polîtîka Almanya de jî got: " Birêz Schröder dixwaze dîsa di hilbijartinan de biserkeve û ji bo wê jî dixwaze sempatiya hilbijarên Tirk yên Almanya qezenç bike".

Civata ji bo Gelên Bindest (GbfV):

Pênc argumentên li hemberî endametiya Tirkiyê ya YE yê

Civata ji bo Gelên Bindest(GbfV) li ser endametiya Tirkiyê ya YE yê daxuyaniyek bela kir. Civata ji bo Gelên Bindest(GbfV) ji hikumetên welatên YE dixwaze ku ji bo mizakerekirinê derî li Tirkiyê venekin, heta Tirkiyê wan 5 xalên jerîn bicîh neyne.

Ew pênc xal ev in:

1- Divê 3.400 gundên wêrankirî bên avakirin û 2.4 milyon Kurdên koçber bikaribin vegerin gundên xwe.

2- Divê 3.500 girtîyên polîtîk serbest bên berdan.

3- Tirkiye ji 1974 vir de Qibris dagirkiriye. Divê Tirkiye 30 hezar leşkerên xwe bi 300 panzerên xwe ve ji Qibrisê paşve bikşîne.

4- Heta niha File û bawermendên olên din li Tirkiyê ji mafên wekheviye bêpar mane. Divê Tirkiyê hemû mafên civatên nemisilman nas bike, hemû hemwelatîyên xwe wekhev bigre.

5- Tirkiye, bi taybetî ji leşkeriya Tirkiyê Dewleta Federala Kurdistan tehdît dike. Tirkiye bi politikaya xwe ya dijbertîya Kurdan hemû rojhilata nêzik destabilize dike. Divê Tirkiye dev ji vê polîtîka xwe berde.

NAVEND : Tirkiye naxwaze Kurd dengê xwe derxînin

NAVEND-Navend ji bo Lêkolînên Kurd, li ser reaksiyonên îlana enstituya Kurd a Parîsê ku di çend rojnameyên Ewrûpî de hatibû weşandin, daxuyaniyek çapemenî belav kir.

NAVEND di daxuyaniya xwe de dibêje : » Raya gîştî ya Tirkîyê li ser weşandina vê îlanê reaksiyonên zaf tund nîşan dan. Medya Tirkiyê kesên ku ev îlan îmza kirine wek xain û çete bi nav dike. Tirkiye qet naxwaze ewana wek temsîlkarên Kurd bibîne û bi wan re qise bike. Ew reaksiyon nişan didin ku li gel hin gavên bi erînî, mirov nikare behsa reformên mezin li Tirkiyê bike. Ji bo endambûna YE ya Tirkiyê hîn rêyek pir direj heye. Piraniya reforman hîn li ser qaxezê ne. Tirkiye hîn ji naskirina rastiya Kurdan û kulturek pirdengî pir dûr e. Desthilatdarên Tirkiyê hîn jî dixwazin ku Kurd bê deng bimînin, daxwazên xwe neynin ber raya gîştî ya Tirkiyê û Dinyayê. »

NAVEND radigihîne ku divê di zirweya 17.12.2004an de mafên gelê Kurd bên berçav kirîn.

www.kurdi.org

Rêwîtîya nivîskar Lord Kinross ya li Bakûrê Kurdistanê

Lokman Polat

Ji dîroka qedîm heta dema Împaratoriya Osmaniyan gelek misyonerên xaçperest yên Ewropî li rojhilata navîn û bi taybetî jî li Kurdistanê rêwîtî kirine, geriyane, di bajar, navçe û gundên kurdan de mane, bi civaka kurd re jîyane.

Gelek mîsyonerên Ewropî li ser civaka kurd pirtûkên sosyolojîk, civakî, dîrokî nivîsîne, di gernameyên xwe de behsa civaka kurd kirine. Çend pirtûkên mîsogeran ji alî hinek weşanxaneyên kurdan ve hatine wergerandin û bi tirkî li Stenbolê hatine weşandin. Li Ewropayê ji berhemên mîsyoneran şaxeke edebiyatê ya gernameyê hatibû pêkanîn.

Ji dema sala 1923-an heta sala 1950'yî tu mîsogerekî Ewropî li bakurê Kurdistanê negeriyaye. Sedemên vê jî ev e ku; dewleta Kemalîst rêwîtiya li Kurdistanê, ger û çûyina wir qedexe kiriye. Mistefa Kemalê nîjadperest ji roja ku komara Tirkiyê damezrandiye, di serê xwe de, di heş û mejîyê xwe de plana qetlîama kurdan amade kiriye û lewre jî rêwîtiya çûyina bakurê Kurdistanê ji temamê biyaniyan re, ewropîyan re qedexe kiriye. Ji sala 1923-an heta sala 1950-an ji Sêwasê wirdetir, anku çûyina Kurdistanê bi fermana dewleta nîjadperest a tirk hatiye qedexekirin.

Dema mirov li salên 1923 heta 1950-yî dinêre dibîne Kemalîstên xwînxwar li bakurê Kurdistanê li dijê netewa kurd qetlîam pêk anîne. Ji serîhildana şêx Seîdê nemir bigir hetanî serîhildana Dêrsim û Agrîyê, ji Koçgîrê hetanî gêlîyê Zîlana Serhedê xwîna gelê kurd hatiye rijandin, qetlîamên jenosîdî hatine pêkanîn. Dewleta Kemalîs hetanî sala 1950-yî tim û tim kurdan qetil kiriye, sirgûn kiriye. Di sala 1950-yî de di helbijartinê de partîya Kemalîs CHP têk diçe û partîya Adnan Menderes DP (Demokrat Partî) tê ser hikûm û êdî hinek nermahî çêdibe.

Di sala 1950-an de qedexebûna gera li bakurê kurdistanê tê rakirin û dîsa gelek misoger, rojnameger û nivîskarên Ewropî berê xwe didin Tirkiyê û Kurdistanê û bi taybetî jî li Kurdistanê rêwîtîyên dûr û dirêj pêk tînin, li gelek bajarên kurdistanê digerin û di encama gera xwe de pirtûk dinivîsin, berhem diafirînin. Yek ji wan nivîskarên ku di sala 1950-an de li Bakurê Kurdistanê geriyaye nivîskar Lord Kinross e. Ez ê di vê nivîsa xwe de behsa pirtûka wî û gera wî ya li bakurê Kurdistanê bikim ku di sala 1950-an de li Kurdistanê rêwîtî kiriye.

Pirtûka nivîskar û dîroknasê Îngilîz Lord Kinross bi navê "Axên Pîroz Yên Anadoluyê" li tirkî hatiye wergerandin. Pirtûk di nav weşanên "Nokta Kîtap" ê de di sala 2004-an de li Stenbolê hatiye weşandin. Pirtûk 230 rûpel e û ji yanzdeh beşan pêk tê. Di pênc beşên pêşîn de nivîskar behsa herêma behra reş, gel û neteweyên kul i wir dijîn –Laz, gurcî, rum- dike. Ji beşa şeşan pêve êdî behsa kurdan û bajarên Kurdistana bakur dike.

Nivîskar Lord Kinross pêşî diçe Lazîstanê û ji wir derbasê Kurdistanê dibe. Ew diçe navçe û bajarên kurdan Agrî –Ararat- Erzurum, Wan, Axlat, Tatwan, Diyarbekir û Urfayê. Sernavê beşa şeşan ya pirtûkê "Ararat û Kurd" in.

Sernavê beşa heftan "Kela Erzerumê" , beşa heştan "Gola Wanê" , beşa nehan "Li başurê Anadoliyê Kurd û Arab" e. Di beşa yanzdan de nivîskar behsa neteweyeke wendayî "Hîtît"an dike. Ew dibêje ev netewe Aryan anku Îndo-Ewropî bûne û zimanê wan jî Îndo-ewropî bûye. Di beşa yanzan de jî behsa "Kapadokya û Yunanî –Grekî-" yan dike.

Ji bo ez nivîsê dirêj nekim, min behsa naveroka beşên pirtûkê nekir.

Xwendevanên ku ji pirtûkên gerê, rêwîtîyê hez bikin yan jî kurdên ku bixwazin di sala 1950-yî de bajarên kurdan Agrî, erzurum, Wan û Amed çawa bûne û rewşa kurdan wê demê di çi halî de bûye, bila vê pirtûkê bixwînin. Ez jî vê pirtûkê fêr bûm ku tirkan di dîroka xwe de tenê yek bajare kava kirine. Ew her tim talanker bûne û bajarên xelkê talan kirine, dagir kirine.

Li tevahiya Tirkiyê û Kurdistanê Tirkan –anku Tirkmenan- di sedsala 18-an de tenê yek bajareke ava kirine. Ew jî bajarê "Yozgat"ê ye. Eşîreke tirkmenan ku navê wan "Çapanoglu" bûye vê bajarê ava kirine û vî navê ecêb lê danîne. Ji derveyê bajarê "Yozgat"ê tu bajareke din ji alî tirkan ve nehatiye ava kirin.

Li Hollanda êrîşa faşîstên Tirk

Tirkên fasist destdirêjîya malpera Yeketîya Qutabî û Lawên Kurd li Holenda kirin û "hack" kirin

Amsterdam - Malpera Yeketîya Qutabî û Lawên Kurd li welatê Holenda (www.kurd4all.nl) hate "hack" kirin.

Malpera Yeketîya Qutabî û Lawên Kurd li Holenda malperek kultûrî ye û dezgehekê ragehandina Kurdî ye li welatê Holenda û weşana wê bi zimanî Kurdî û Holendî ye.

Tirkên terorîst li ser tora internetê destdirêjîya malperên Kurdperweran dikin û dixwazin malperên wan bigrin, lê ew nizanin ew doza Kurdan û yeketîya wan xûrttir dikin. Fasistên Tirk li berperê pêşîyê de nivîsî bûn: Em leskerên dewleta Tirkîyê ne, û alaya dewleta Tirkî ji bilind kiribûn.

Ji bo dirêjîya yek demjimêrê malpera www.kurd4all.nl "hack" kirî ma û pas re hate serrast kirin û li pêşîya malperê alaya Kurdistanê û wêneyê Barzanî yê nemir li ser hate hildan û li ser ala Kurdistan nivîsî ye: **KURDISH PRIDE WILL NEVER DIE**, bi Kurdî dibit: Xwestivîya Kurdan tu caran namirit.

Berpirsên malpera www.kurd4all.nl gotin: Em jî dikarin malperên Tirkan "hack" bikin! Lê belê em wan karan nakin, em dê zanista xwe ji bo karên pîroz bikar bînin û ji bo Kurd û Kurdistanê. Xirabkirina malperan na karê me ye, rêza me ji bo hemû bîr û bawerên cûda hene

Koerdische Jongeren en Studente Unie Nederland

Yeketîya Qutabî û Lawên Kurd li Holenda

Bîranîna şehîdên Qamişlo



PK- Di 12.12.1980î de, dewleta xwînmija Tirk, Sûrî û nokerên wan, bi êrîşek bêbextî li Qamişlo komkujiya şoreşger û welatparêzên Kurd kirin. Di 1980î de, bi hatina cûnta leşgeriya Tirk, bi sedan şoreşger û welatparêzên Kurdên bakur derbasî Rojavayî Kurdistanê bûbûn.

Hinek ji wan welatparêzan jî, endam û hevalbendên rêxistina KAWA bûn. Di 12ê Çileya Pêşîn 1980î de, leşkerên Tirk û nokerên xwe, bi alîkariya dewleta Sûrî digrin ser mala ku ew lê dimînin û 15 kadir û xebatkarên welatparêzên Kurd şehîd dikin. Di nav wan şehîdan de kadirên mîna Huseyîn Aslan, Mehmet Emîn Mutlu, Necla baksî û gellekên din hebûn.

Dara serxwebûn û azadiya gelê Kurd bi xwîna şehîdên Kurdistanê tê avdan. şehîdên Kurdistanê şehîdên me ne. Bila serê malbat û hevalên wan û serê gelê Kurd sax be.

(Berdewama rûpela 3)

Ev îlan ji alî dewleta Tirk ve bi awayekî negatîf hat nirxandin. Gelo di nav Kurdan de dengekî çawa da?

Dixwazim berê li ser helwesta dewleta Tirk rawestim. Ew mîna xwendevanê ku haziriya derza xwe dike, ev demeke li ser dişuxilîn. Lê bi vê îlanê plana teva xirabû. A serokwezîr xirabû, a leşkeran û wezareta derve xirabû, a teva xirabû. Yanî karê wan tevlihev bû, ev helwest nedipan. Ji ber vê jî gelek êrîşî xwediyên îmzeyan kirin. Li Tirkiyê hinek tişt hatine guhertin, lê bi vê helwesta xwe dewleta Tirk nîşan da ku ew guhertin tenê li ser kaxezê mane. Ji ber vê jî helwestek neheqî li dijî îlanê nîşan dan. Vê îlanê da rastkirin, ku heta pirsa Kurd di makzagonên Tirkiyê de nebin xwediyê statuyekê, wê ev neheqî her berdewam bikin.

Hinek kesan îmza xwe paşde kişandin, vê daxuyaniyê di nav Kurdan de tesîrek çawa kir?

Di nava gel de nîqaşek mezin derxist. Gellek kes piştgiriya xwe nîşan dan. Hinek hevalan îmza xwe paşde kişandin. Ew hevalên min bi xwe ne jî. Ez helwesta wan fam dikim. Lê hewcebû vê hessasiyeta xwe berî îmza xwe bavêjin, nîşan bidana. Yanî em her yek bawerdikin ku em xwenda ne, hem jî tiştên ku em dixwînin ters dizanin. Ji ber vê yekê jî di nava gel de tevliheviyek çêkir. Serê gellek kesan tevlihev bû. Ev jî tiştekî dide xuyakirin ku beriya em helwestekê nîşan bidin, divê em hezar carî bifikirin û dûvre em tiştekî bêjin û gavekê bavêjin. Di vir de tiştê ku derdikeve holê, heger em bi rewşenbîrî bêjin, gellek kêmasiyên me hene. Hinek heval jî rexnên neheq li hinekan kirin. Hewceye em hay ji zimanê xwe û helwesta xwe hebin. Li gor dîtina min, wê ev îlan gellek nîqaşên din jî bi xwe re bîne. Divê em bi tolerans li hevdû mêze bikin, ji bo ku tiştên xweş derkevin holê. Ji aliyê din, mirovên cuda hatine ba hev û ev jî giringiya daxuyaniyê nîşan dide.

Vê daxuyaniyê serrastkir ku gava Kurd bixwazin karin bi hevre kar bikin?

Rast e, ev bû mînakek.

Ekinci: Min îlan xwend û wiha îmze kir

Parlamenterê kevn û damezranêrê hewldana çareseriya pirsa Kurdî û lihevhatina demokratîk (DEMOS) Dr. Ziya Tarik Ekinci bersîva ew kesên ku îlana „Kurd çi dixwazin" ne bi wext bû tawanbar dikin, da û got: „Îlanên me ji bo xilaskirina du standartiyên li Tirkiyê bikaranîna mafekî demokratîk e. Ekinci li himber erîşkariya xwedêgiravî hin derûdorên rewşenbîr daxuyaniyek belav kir. Ekinci weha axifî: „Ev derûdor siyaseta Tirkiyê ya asîmîjasyonîst û red û înkar ji ber çav dûr dihêlin û dixwazin ku em çavên xwe ji xapandinên bi YE re tê kirin bigirin."

Ekinci radigihîne ku ew ji îddîayên ku tekst hat guherandin an bê ku xeber jê hebe îmzeya wan di bin îlanê de cîh girtiye bawer nake û got: „ev îddia bi armanca parastina xwe ji aliyê kesên serokatiya wan ji wan menqûl, tirsonek, cahil lê muhterîs (azwer) bi endişeya ku siyaseta wan ya lihevhatinê dê zirar bibîne tê kirin."

www.kurdi.org

Jina Kurd

Nêrgiza Omerî

Gava meriv li dîroka Kurdistanê, li adet, çand û toreyên Kurdan dinere û lê hûr dibe, dibîne bê Kurdan çiqasî qedir û qîmet dane Jinan û ew payedar kirine. Bawer nakim ku, tu kesî, tu gel'î mina Kurdan Jin pesinandibin û rêzdarî ji wan re kiribin. Heger hebin jî ne mina Kurdan in.

Jin, ango; Jîn, jiyan, kanî. Kebanî, ango; Keybanû, qralîçe, payebilind. Bermalî, ango; Xwediya malê, mezina malê, sermiyana malê. Hurmet, ango; Xwedî rêz, qedirgiran, payebilind. Afred, ango; Afirmend, çêker, sazdar. Û gelek gotinên payedariyê ê mîna van gotinan rûpelên çand, tore û adetên Kurdan xemilandine. Kurdan bilasebeb Jin bi van navan payedar nekirine. Gava meriv baş dên û bala xwe didê û lê hûr dibe, dibîne ku, ev nav xwedî mane û naverokek têr, kûr û dewlemend in. Di mane û naveroka xwe de jîn û jiyan heye, payebilindî, meziyanî, azadî, afirmendî, qedir û qîmet'ek mezin heye. Ev mane û naverok jî bêguman, mizgîn û daxwaza jiyanek hevbeş û bingehên mirovatiya rasteqîn in. Di van bingehan de jiyanek wekhevî, hevbeş û azad heye. Bindestî, koletî û stuxwariya Jinê tuneye. Xwedîlêderketin, paraztin û payedariya Jinê heye.

Piştî kevnedîroka civaka serdestiya Jinê û bi civaka serdestiya mêran re, Kurdan heta bi îro jî, dev ji payedarî û rêzgirtina Jinê bernedane.

Ev rêz û payedarî ji dema Zerduştiyê hetanî bi îro berdewam bûye. Her çiqasî îdeolojiya Ereban a Îslamî nîr'ên koletiyê xistibin stuyê Jinê jî, lê Kurdan dîsa jî, di warê paraztina jinê de dev ji kevneşopiyên xwe yên Zerduştiyê bernedane û ew hêjayî hetanî bi îro paraztine. Gotina Jin dara şikestî'ye piştî îdeolojiya Îslamê ketiye nav çand û serpêhatiyên Kurdan. Ji ber ku, vê îdeolojiya genî û dirinde nîrên koledariyê xistibûn / xistiye stuyê Jinê û ew bê per û bask hiştibûn, Kurdan gotin: Jin dara şikestî ye da ku, ew tadê li Jinê nekin, bi destê wê bigrin, lê xwedî derkevin û wê biparêzin. Sedema din jî ev bû ku, di warê aborî de jin bi mêr ve girêdayî bû, stuxwar bû û wek dara şikestî bû. Ji ber vê ye ku, Kurdan Jin her pesinandine, payedar kirine û her tiştê xwe bi namûsa Jinê ve girêdane da ku, Jin di nav destan de nemîne û rabe ser xwe.

Li himberî vê merdî û fedakariya mêrê Kurd, Jina Kurd jî bê bersiv nemaye û her qedir û qîmet daye vê pesinandin û payebilindiyê. Bêdeng nemaye û mêrê Kurd bi tenê nehiştiye. Çi di rojên teng û çi di yên fireh de, di xweşî û nexweşiyê de, di şer û aştiyê de, di hebûn û tunebûnê de, pişta xwe daye pişta mêr û bi hevre li ber xwe dane. Piştî li piştî, mil bi mil şerê jiyanê, şerê dijmin û nerindan kirine. Mala xwe, ezbet û eşîra xwe, erd û xaka xwe bi hevre paraztine. Jina Kurd tucarî bêbextî li mêrê Kurd nekiriye û ji paş de xincer lê nexistiye. Serokatiya mal, êl û eşîra xwe kiriye û serê mêrê kurd ne tewandiye. Mêranî, fedakarî, merdî, xîretî û cengaweriya Jina Kurd gelek rûpelên dîroka Kurdistanê xemilandine. Ji ber vê ye ku, Kurdan gotiye: şêr şêr'e çi jin'e çi mêr e.

Jin, ango; Jîn, jiyan, kanî. Kebanî, ango; Keybanû, qralîçe, payebilind. Bermalî, ango; Xwediya malê, mezina malê, sermiyana malê. Hurmet, ango; Xwedî rêz, qedirgiran, payebilind. Afred, ango; Afirmend, çêker, sazdar.

Wek me got, rûpelên dîroka Kurdan bi mêranî, fedakarî, merdî û cengaweriya Jina kurd ve xemiliye. Ji ber vê jî Kurdan tu cudatî nexistiye navbera şêra mê û ê nêr. Gotina şêr şêr'e çi Jin'e çi mêr'e, vekirîtir nîşana wekhevî û hevbeşiya navbera Jin û mêrên kurd e. Her çiqasî îdeolojiya Erebên kevnemêjî xwestiye vê civaka azad û serbest a Kurdan aloz û asteng bike jî, lê jin û mêrên Kurd bi piranî neketine bin bandora vê îdeolojiya gemar û hêjayiyên xwe yên kevneşopiya Zerduştiyê berdewam kirine. Di dema îroyîn de jî, ku piraniya Kurdan ji ber zilm û zora Xalid Ibin Welîd û Emer Ibin Xetabê xwînxwar, bi zora şûr Misilman bûne, ew civaka sosyal û azad a di navbera jin û mêrên Kurd de, zêde aloz nebûye û ji holê ranebûye. Di vî warî de civaka Kurd îro jî, ji gelek civakên gelên din pêşketîtir û hevbeştir e. Kurdan doh çilo payebilindî didan jinê û ew dipesinandin, îro jî wê riyê dişopînin. Her çiqasî hinek alozî û nexweşiyên kevnemêjiyê Îslam'a Erebî ketibin nav adet, çand û toreyên gelê Kurd jî, lê piraniya Kurdan dev ji adet û toreyên xwe yên bapîran bernedane û wek Îslam'a Erebi'ya mêjîzingar, jin nekirine kole û ew di bin çarşef, çît û perdeyên reş de mehkûmî jiyanek nemirovî nekirine û ewê nekin jî.

Ji aliyê din, jina Kurd, di nav adet û toreyên Kurdan de wek sermiyana malê hatiye pejirandin û tevger û çûn û hatina malê radestî wê bûye. Li gor adet,çand û wêjeya Kurdan, mala bê jin wek kaniya çikandî, dar'a pelweşandî, bê oxir û bê bereket e. Xortên azib û nezewicî, di nav adetên Kurdan de bê qedir û bêrêz in. Kes hêviyên mezin ji wan nakin, zêde qîmet nadin gotinên wan û wan heta bi ciyekî wek sûtal û beredayî dibînin. Lê yên zewicî û xwedî jin, di civaka Kurdan de bêhtir xwedî rêz û peyv û gotin in. Ji ber ku, di vir de berpirsiyarî û neberpirsiyarî heye, sivkayî û giranî heye. Ev jî bi jin'ê ve girêdayî te. Kesên bi jin, malava û afirmendên jiyan û nifş'ên nuh in. Tovên berdewamiya jiyanê diçînin. Ji ber vê jî xwedî rêz û giraniyekê ne. Di vê malavabûnê de, bar û berpirsiyarî, tevger, sermiyanî û lihevragirtina malê, li ser milê jin'ê ye. Ji ber vêna ye ku, Kurd dibêjin: Jin stûna malê ye. Ango; mala bê jin, mîna mala bêbingeh e, hildiweşe û xirab dibe. Xanî û mal bê bingehek tekûz û qewîn nayê avakirin. Gava stûnên xênî tekûz û qewîn bin, ew xanî zû bi zû hilnaweşe û erdhejîn jî kêm bandorê lê dike. Ev stûna tekûz û qewîn jî jin bi xwe ye.

"Textor wê ji birçînan nemirin"
Pijîşkên kurd û rewşa wan piştî guhertinên li Elmanayayê



Dr. Feqî Resul

Sîrwan Hecî Berko - Berlîn

Berî salekê, li Elmanyayê guhertinên mezin di sîstema tendurustiyê de pêk hatin. Ev yek bû sedema ku rewşa pijîşk û dermanfiroşan ber bi xerabiyê ve biçe. Pijîşkê kurd Dr. Resul Feqî ji Berlînê diyar dike, ku ji sala 1996ê ve rewşa pijîşkan xerabtir bûye. Li gorî wî, ji wê demê de "dora 50 ji sedî ji pereyên ku ji pijîşkan re dihatin, kêmtir bûye".

Ji serê vê salê û pê ve, her kesê ku temenê wî 18 e û mezintir be, divê her sê mehan carekê 10 Euroyan bide, ger ew biçe cem textorên giştî û yan yên diranan. Herweha divê ew di ser dermanan 10% ji bûhayê wan ji bêrîka xwe bide. Ev guhertin bûn sedem ku gelek kes êdî kêm biçin cem pijîşkan. Ji xwe armanca guhertinan jî ev bû. Di salên dawî de, rewşa Elmanyayê pir xerab bûye. Hejmara bêkaran gihaye dora 4,5 milyonan û rewşa aborî jî ne zêde baş e. Sîstema sosyal nema wek berê xurt e û divyabû hikumet guhertinan pêk bîne, da ku sîstem bi giştî têk neçe.

"Piraniya nexweşên min bêkar in an jî alikariyê ji sosyalê distînin. Piştî guhertinan, ew êdî kêm tên", Dr. Guhderz Haco eşkere dike bê çima ew ji rewşa nû ne razî ye. Haco pijîşkê diranan e. Ew jî li Berlînê dijî. Berî guhertinan, ji mirovekî re derdiket, ku salê çar caran biçe cem textorê diranan û diranên xwe paqij bike. Lê niha jê re tenê carek derdikeve. Ger ew bêtir bixwaze, divê ew ji bêrîka xwe bide.

Dr. Guhderz diyar dike, ku divê mirov bi kêmanî salê du caran biçe cem pijîşkê diranan. "Çar caran di salê de hîn çêtir e", weha Haco.

Dr. Guhderz eşkere dike, ku ji ber piraniya nexweşên wî Kurd in, ew alîkariya wan dike û pereyan yekser ji wan nastîne. "Nexweş dikare ser raheta xwe her meh tiştekî bide, ku jê re ne giran be."

Feqî çend salan serokê Komeleya Pijîşkên Kurd li Elmanyayê bû. Ew li ser rewşa pijîşkên Kurd baş agahdar e û eşkere dike, ku mesrefa textoran zêde dibe, lê pereyên ku ji wan re tên, kêmtir bûne. Ew berdewam dike û dibêje: "Pijîşkên kurd li Berlînê gelek deynên wan hene. Guhertinên ku pêk hatin, ziyaneke baş gihandin wan."

Ji bilî pijîşkan, guhertinên ku çêbûn, bandora wan ser rewşa dermanfiroşan jî heye. Nexweş mecbur bûne, ku serê her dermankî 10% ji bûhayê wî ji bêrîka xwe bidin. Ev yek dihêle ku karê dermanfiroşan jî kêmtir bibe û rewşa wan, ku berî guhertinan pir baş bû, ber bi xerabiyê ve biçe. Li gorî agahiyên dermanfiroşan, dora 20-30% ji zibunên wan kêmtir bûne. Herweha ji ber textor hatine mecburkirin, ku tenê dermanên erzan ji nexweşên xwe re binivîsînin, fêdeya dermanfiroşan jî kêmtir bûye.

Ji ber ne xuya ye ku rewşa Elmanyayê dê di salê bê de baştir bibe, rewşa pijîşk û dermanfiroşan jî dê baştir nebe. Ji xwe demên ku textor bibin milyonêr, ew dem derbas bûne, wek ku Dr. Resul Feqî dibêje. Lê ew piştrast dike, ku "ewê ji birçîna jî nemirin."

Dr. Guhderz Haco



Demokrasiya Tirkan û aqilê me

Laleş Qaso

Tişt bi tiştan dijî û dibe tiştek; tişt tune bin, tişt ne tiştek e. Û her çi "demokras î" ye jî tiştek e. Ew tiştekî wilo ye ku koka wê di qelş û herxên zemên re derbasî avtêzana tarîxê bûye. Insên kultur afirand û kulturê jî insan kir insan. Û demokrasî jî kultura pevçûn û liberxwedana insaniyetê ye. Aha tam di vir de, îcar gelo alema islamê bi kultura ku afirand çiqasî bû insan? Insaniyet kultureke gelêrî ye û ereb, tirk û farisên misilman çiqasî bûn warisê vê kulturê?

Demokrasî peyveke hevdudanî ye; ji peyva "demos" û "kratî" pêk hatiye. Li Yûnana kevin "demos" xelk û "kratî" jî desthilatdarî bû. Li wê herêma çend hezar sal berê, xelk car carê beşdarî nav kar û barên desthilatdariyê dibû. Lêbelê li Rohilatanavîn, ne di tarîxa emewiyan, ebasî û osmaniyan de û ne jî di temamê tarîxa islamê de, xelk beşdarî nav kar û barên desthilatdaran bûye. Tew bi ser de, osmaniyên ku bûbûn warisên islamê, her tim bi çavekî piçûk li xelkê nerîne û xelk dûrî xwe sekinandine. Lê digel wêqasê dîsa jî siltanên osmanî, ji Atatirk bêhtir gelparêz û insan bûn. Di sîstema siltanan de mîna xelkê kurd her xelk, bi navê xwe dihatin qanê. Her xelkî bêşa xwe dida, eskerî ji imperetoriyê re dikir û bi nasnameya xwe girêdayî sîstemê bû. Lê piştî ku Atatirk dewleta xwe li ser asasê imperetoriyê bi navê tirk û Tirkiyê ava kir, hertişt berevajî hev bû. Ziman û kultura her xelkî, bi devê tivingê qedexe bû û hertişt ji bo tirkan hat bikaranîn. Atatirk du alternatîv dabûn ber xelkê, "yan hûn ê dev ji ziman û kultura xwe berdin û bibin tirk û bijîn, û yan jî hûn ê bên kuştin. Yan tirkitî yan jî jenosîdî!" Û tarîxa Atatirkê ku aman ne dabû xelkê, bi wê zilm û zora kesnedîtî hatanî roja îro hat. Îcar di dawiyê de em dibînin ku bi wê siyaseta barbarane, ji bilî kurdan,(lê bi milyonan kurd jî asîmle bûn), her xelk diqede û yek milet, yek ziman û yek welat derdikeve holê. Di eslê xwe de heger li başûrê Kurdistanê kurd bi serneketibana, kemalîzmê kurdên bakurê welêt jî yekser qedandibûn. Qedandibûn dibêjim ji ber ku kurd bi axa xwe, ziman û siyaseta xwe kurd bûn û kemalîzmê jî pêşî bi rêya PKKê bi milyonan him kurd ji ser wê axê avêtibûn û him jî asîmle kiribûn; û dû re jî bi rêya HADEPê siyaseteke bazirganî û tolaziyê pêşkêşî xelkê kurd kiribû.

Demokrasî xwedî bingeh e, bingehê wê jî şoreşên civakî ne û li Tirkiyê jî em li tu şoreşên bi vî rengê rast nayên. Parlamentarîzm û dezgehên sivîlîzasyonê çaviyên demokrasiyê ne; û li Tirkiyê jî ev herdu çavî bi nav hene. Ne parlamento di pevxistin û guherandina qanûnûnên dewletî de û ne jî dezgehên sivîl li gora normên demokrasiyê dikarin tevbigerin. Dewlet milîtarîst e. Hîn ji destpêka cumhûriyetê de hikûmet û parlamento wek prensîp hene, lê artêş li ser serê dewletê rûniştiye. Biryar û kiryarên konseya ku ji generalan pêk tê pêşker in. Ji bilî xwefiroşên hadepiyan kî nizane ku dewleta tirkan bi biryarên eskerî îdare dibe. Him ev esker ger ji îro de jî destê xwe ji dewletê bikêşînin, demokrasiya ewrupî wê li derdora pênc-şêst û heta belkî jî sed salekî wext bigire ku li Tirkiyê rûne. Li Ewrupayê 250-300 salekî wext girt. Ew jî heger ne ji Napolyon Bonapart baya, belkî şoreşa Frensî têkçûbaya û ev demokrasiya îro, li Ewrupayê bi vî rengê çênî tune baya.

Demokrasî bi hêl û mêl e û li ber her hêleke wê hêzeke tebût û aksiyoner sekiniye. Ev hêzcarina dibin yek û bi qasî ku dewletê têxin xizmeta herkesî, bi demokrasiyê radibin û li ber xwe didin. Li Emerîkayê Abraham Lînkoln bi qeweta van hêzan şorêş pêk anîbû. Îcar li Tirkiyê ne serokekî wek Abraham demokrat, ne partî û ne jî rêxistin û dezgehên bi rêk û pêk demokratîk hene. Li Tirkiyê sosyal demokratê herî mezin Denîz Baykal û Murat Karayalçin e û herdu jî ji faşîstên ewrupiyan li paştir in. Întellektuelê tirkan ê herî zana Simaîl Beşikçî bû û ew întellektuel di demekê de bûbû berdevkê PKKa generalan. Yanî dibêjim ku întellektuelên tirkan jî xerabe ne, hêvî di wan de tuneye.

Demokrasî têgihiştineke mirovperwerî û edebeke insanî ye. Îcar ne miletê tirk, ne ronakbîr û ne jî birêvebirên milet, xwediyê wê edebê ne. Hemû jî bi edeba dewletê hatine stran. Û edeba dewletê jî pantirkîst û panislamîst e. Ji Yavuz Siltan Selîm û vir ve imperetorî, dû re jî dewlet di mejiyê tirkan de hêzeke xwedayî û artêş jî, wek eshabeyên pêxember bi cih bûye. Li ba wan dewlet miqedes e. Islama osmaniyan bi rengekî îdeolojîk bûye kultura wan. Û di wê islamê de jî xwedayan, hêsîriya xelkê kurd û temamê xelkan pişka ezel li qelemê dabû! Em divê hişê xwe bînin serê xwe û dev ji çirt virtkên demokrasiya tirkan berdin, di bin tesîra PKKa xayin û HADEPA devrût û devşût de nelivin û qeweta xwe ji bo demokrasiya tirkan serf nekin. Rehmetiyê Barzanî ji bo Iraqek e demokratî çil-pêncî salî qêriya, lê nebû tiştek. Û heger ew sed salê din jî biqêriya, kurd karîbûn bûbana tiştek, lê wê ereb neba tiştek. Du rêyên ku demokrasî li Iraqê û Rohilatanavîn pêk hatibaya hebûn. Yek, divabû ji xelkên herêmê Martîn Luterek derketibûya û di islamê de pêşî reforim kiribana. Islam dijminê riknê demokrasiyê bû û xelkê herêmê jî tam misilman bûn. Dudu, wek ku emerîkiyan li Iraqê kirin bi devê tivingê sîstem bihatana guherandin. Û ezbenî, ev herdu jî ji me nayên. Ne Tirkiyê bûye wek Iraqa îro ku em ji bo demokretîzekirina Tirkiyê serê xwe bişkînin, ne em karin islamê reformîze bikin û ne jî bi devê tivingê sîstema kemalîzmê têk bibin. Li gora min, bi tenê rêyek ji mer e maye, ew jî ku em zend û bendên xwe ji pevçûneke ÎRAyî û ETAyî re vemalin. Kurdên ku dikarin xwe di ber zirçoneyekî wek A. Ocalan de bişewitînin, wê bi hêsanî bikaribin xwe di ber welatekî de jî bişewitînin. Aha wî çaxî, wê dewleta Atatirkê jenosîd biheje û ewrupî jî bi çavên camêran li me binerin. Pevçûn. Ez wilo difikirim, ewqas.

lales56@hotmail.com

Kurd di Iraqa nû de:

Profesorek kurd dê li Zanîngeha Ruhr a Bochum komek ji semînaran bide



Wêne: Profesor Ferhad Ibrahîm (amude.com)

Zanîngeha Ruhr a Bochum dê ji 10-13.01.2005 li ser Kurdistana Iraqê çend semînaran bide. Ji bo vê yekê, Fakulteya Zanyariyên Civakî dê profesorê kurd Ferhad Ibrahîm wekî profesorekî mêvan bîne cem xwe û bihêle ku ew di van semînaran de li ser Iraqa nû û bi taybetî li ser Kurdan dersan bide

BOCHUM (PK) - Zanîngeha Ruhr a Bochum dê ji 10-13.01.2005 li ser Kurdistana Iraqê çend semînaran bide. Ji bo vê yekê, Fakulteya Zanyariyên Civakî dê profesorê kurd Ferhad Ibrahîm wekî profesorekî mêvan bîne cem xwe û bihêle ku ew di van semînaran de li ser Iraqa nû û bi taybetî li ser Kurdan dersan bide. Ibrahîm yek ji navdartirîn pisporên Rojhilata Navîn û Mafên Mirovan e.

Piştî ku Fakulteya Zanyariyên Civakî ya Zanîngeha Ruhr a Bochumê sala borî serokwezîrê Tirkiyê yê berê Mesud Yilmaz wekî profesorekî mêvan anî zanîngehê, çalakiyên protestoyê yên xurt ji aliyê xwendekarên kurd (Kurdistan AG) bi hevkariya birêvebiriya xwendekarên zanîngehê (Asta) û sazî û rêxistinên cuda ên li Bochumê û derûdora wê ve hatin kirin. Vê yekê hişt ku fakulteya jorîn di vê semesterê de profesoriyeke mêvan ji bo mafên mirovan çêke. Profesor Fethad Ibrahîm dê derbarê vê profesoriyê di meha yekê ya sala 2005ê de li jêr sernavê "Avakirina neteweyê û Kurd di Iraqa nû de" çend semînaran li ser hev bide. Komeleya NAVEND-Navend ji bo Lêkolînên Kurdî li Bonnê ji zanîngehê re cend zanyar pêşniyaz kiribûn û di vî warî da soza pistgirî da. Konseya Zanîngehê dawî Profesor Ferhad brahîm ji bo pêkanîna van semînaran hilbijart.

Dr. phil. habil Ferhad Ibrahîm di sala 1950î de li bajarê Amûdê li Kurdistana Suriyê ji dayik bû. Di sala 1971ê de, ew ji bo xwendinê hate Elmanyayê û niha li vir dijî. Ew niha li Urdunê dixebite û di heman demê de li Zanîngeha Azad a Berlînê profesorê beşê siyaset û zanyariyên civakî ye. Dr. Ibrahîm li Elmanyayê wek pisporê Iraqê û Rojhilata Navîn hatiye naskirin. Nivîsên wî yên derbarî Iraqê û Rojhilata Navîn di gelek kovaran de hatine weşandin. Herweha ew gelek caran dibe mêvanê televizyonên elmanî û pirsgirêkên li Rojhilata Navîn şirove dike.

Ji bo agahiyên berfirehtir derbarê semînarên li Bochumê:
Prof. Dr. Werner Voß, Dekan der Fakultät für Sozialwissenschaft der RUB,
Tel. 0234/32-22386,
E-Mail: gerlinde.roskam@rub.de
(SHB)





Hunermend Bedil:

Bingeha muzîka min li ser muzîka me ya klasîkê avakiriye. Ango ez bawerim bingeha min gelek saxlem e

Ger ku imkan hebin, ez dikarim li ser vî bingehê çi muzîka dewlemend hebe, bi kar bînim. Gava min dest bi karê muzîkê kir, ji serî de armanca min ew bu ku muzîka me ya klasîk hêdî hêdî bi ya modern ve girêbidim. Ez dikarim bêjim ku şêweya muzîka min vê gavê Ethno Pop e. Yanî eynî weke min rengîn û fireh e

Peyama Kurd: ***Tu dikarî ji bo xwendewanên me xwe bidî nasandin?***

Bedil: Ez li Kurdistanê li gundê Kelhok´ê girêdayî bajarokê Qubin´ê , ku ew jî vegavê girêdayî Elih´ê ye (Batman) ji dayîka xwe bûme. Ez pênc salan li gundê xwe li Kelhokê (Kuşçukuru köyü) û sê salan jî li bajarokê (Keza) Qubîn (Beşiri) çûme dibistanê.

Piştî ku min Dibistan heşt salan xwend, rewşa herêmê gelekî hatibû guhartin, min êdî nikarîbu dibistanê berdewam bikim. Wê demê tevgera şoreşa Azadîxaz gihîştibu merhelakê gelek bilind û di serê her Kurdekî de hêvîya Azadîyê çêbûbû. Di destpêka salên 1984-1985de jî ber rewşa sîyasî û civakî gelê me tev ji ber zilm û zorê koçber dibû. Yên ku diçûn Metrepolan, yên ku direvîyan Awrûpa û herweha dewletên din. Êdî wext hatibû ku ez herim eskerîyê jî. Ez ji xwere di fikirîm! Gelo ez herim eskerîyê belkî bêyî îrada xwe têkevim nav şer. Ji ber ku gelek Rêxistinên Azadîxaz hebûn û şerê çekdarî jî dikirin.Wek mînak Wê demê PKK, DDKD, KAWA, RIZGARÎ, KUK û herweha gelek partîyên din. Malbata min jî ji nîvî bêtir çûbûn Almanya, min jî qerara xwe da û hatim ba wan.

Te kengî û çawa dest bi muzîka Kurdî kir?

Ez wextê diçûm dibistana zimanê Tirki, keyfa Mamostê min gelek ji dengê min re dihat. Wê çaxê her ku şahiyek li dibistanê çêbûba, min her dem di nav de cîh digirt. Ger min nexwesta jî, Mamostê min wê min bizor bikira wê şahîyê. Bi kurtasî , çi şahiya çêbiba ez di navde bûm. Mamoste ez karîbûm berpirsyarê şaxê muzik û stranbêji yê.

Piştî ku ez hatim Almanya, firsetek gelek baş kete destê min, ku êdî min karîbu bes bi Kurdî bistirêm.Li welat min bi Tirkî distira. Lê bi dizî min bi Kurdî jî distira.Min li gor imkan û derfetên xwe, xwest bi şiklekî profesyonel muzika xwe, bes bi zimanê dayika xwe bistirêm û bi pêşve bibim. Min di sala 1992 de albûma xweya yekemîn, bi navê SER SALE / HEVALÊ MIN derxist. Piştî wê bi salekê min albûma xweya duyemîn bi navê TE JI BÎRA NAKIM / RIZGAR derxist. Piştî ku ev albumên min li welat gelek hatin hezkirin, min bihîst eskerîyê dest danîne ser wan berheman û qedexe kir.

Min di 1995 de albûma xweya sêyemin derxist û bi rîya Firmake din dîsa min xwe gihand guhdarvanên xwe. Eskerîyê dest danî ser wê jî. Di sala 2000an de min albûma xweyî çaremîn bi navê BÊ UJDAN derxist. Îsal jî (2004) min albûma xweya pêncemîn ya bi navê DAR MELULIN / JÎ TE TÊR NABIM, di meha adarê de derxist, lê hêja Li Tirkîyê yanî li welat ne hatîye belakirin.

Tu di şertên çawa de, di bin tesîra kulturek çawa de mezin bûyî? Kîjan hunermendan li ser te tesîr kiriye?

Ez li Gundê xwe, hetanî şazde salîya xwe, di bin tesîra kultura dê û bavê xwe da mezin bûme. Di nav malbata min de gelek dengbêj hebûn û hêjî hene. Min ne dîtîye, lê li gor ku dibêjin, kalikê min di wextê xwede dengbêjê herêma Bişêrîyê yî gelekî bi deng bûye. Apê min, bavê min, birayê min dengbêj bûn. Ez karim bêjim yê ku min herî zaf jê tesîr girt dîya min bû. Dengê wê gelek xweş bû. Gava yek dimir gazî dîya min dikirin, jibo ku li ser wan bistirê.

Ji albumekî Bedîl



Tesîra hunermendên Kurdan Mihemed Arif, Hesen cizîrî, şeroê Biro, Garebêtê Xaço,Kawis Axa, Meyrem Xan, Ayşe şan, Aramê Tegran, Sivan Perwer, Nizamettin Ariç û gelek hunermendên meyî hêja, ku ez nikarim navê teva bînim ziman li ser min çêbûne.



Tu şêweyê muzîka xwe çawa dinirxîne?

Bingeha Muzika min li ser muzîka meya Klasîkê avakirî ye. Yanî ez bawerim bingeha min gelek saxlem e. Ger ku îmkan hebin, ez dikarim li ser wê bingehê çi muzîka dewlemend hebe, bi kar bînim. Gava min dest bi karê muzikê kir, Ji serî de armanca min ew bû ku muzîka me ya klasik hêdî hêdî bi ya modern ve girêbidim. Ez dikarim bêjim şêweyê muzîka min vê gavê Ethno Pop e. Yanî eynî weke min rengîn û firehe

Gelo di nav muzîka dinyayê de cîhê muzîka Kurdî çiye?

Mixabin em nikarin muzîka xwe bi ya dinyayê ve iro miqayese bikin. Ji ber ku hûnermendên dinyayê bi zanistî karê xwe dikin. Diçin bi salan perwerda muzîkê dibînin. Lê ez bawerim heger ku imkanên di destê hunermendên dinyayê de hene di destê hunermendên Kurdan de jî hebûna, welatê wan ne bindest bûya û ewan jî perwerda xwe li ser muzikê bikira, wê weke wan, hetanî jî wan jî çêtir bi pêş ketibûna, Ji ber ku di rihê Gelê Kurd de hunermendî, dengbêjî heye. Ew jî dana Xwedê ye.

Di dîroka hunermendiya Kurdan de hunermendên Wek M.Arîf Cizrawî, Kawis Axa, şeroyê Biro, Garebêtê Xaço, Heseê Cizrawî, Tehsîn Taha, Hesen Zîrek, Elî Merdan, Meryem Xan, Ayşe şan û yên din gîhane. Di roja îroyin de hûnermendên ku di şopa wan da ne, an jî hunermendên ku mirov bikaribe bi wan re miqayese bike hene?

Bi şiklekî dengbêjî weke wan hene lê pir kêmin. Yanî meriv dizane ku taqlîta wan in. Ew yek jî zêdetir hezkirinê ji wan hunermendên berê re tîne. Ez nikarim hunermendên iro bi wan miqayese bikim, ewan ciyekî xweyî taybet di navgel de girtiye.Lê di vê dema em têda jî hunermendên Kurd ên gelek baş hene, ku meriv bi wan serbilind e.

Demek berê sosretek hat serê te , tu hatî gulebaran kirin. Sebeba vê yekê çi bû? Û çima?

Piştî vê bûyerê, gelek rêxistin û dezgehên Kurdan daxuyanî dan, ku ew buyera paşverû ne li ser min, lê li ser çand û hunera gelê Kurd nirxandin û şermezar kirin. Ji bo min gelek balkêş bu, ku ewê Organê (YEK) ne daxwîyanîyek fermî kir û nejî serdanek li min kir. Ez bi rîya rojnama Peyama Kurd dîsa sipasîyên xwe ji bo Serok, Partî, Kom, Komel û şexsîyetên Kurdan re pêşkêş dikim ku li min xwedî derketin. Ev jî tê wê maneyê ku xwedî derketina li min, xwedî derketina çand hunerê kultur û kelepurê Kurd e.

Ez gelek keyfxweş bûm ji bo vê Reportajê. Ger kêmasî çêbûbin, lêborîne dixwazim. Ez rojnama Peyama Kurd ji nêz ve dişopînim. Bi rastî dest davêje gelek nikteyên ku ji bo gelê me pêwîst û heta jê tê dixwaze wan nikteyan bi şiklekî neutral bigihîne xwendevanên xwe. Dîsa bi riya we, silavan li hemî xwendevanên rojnama Peyama Kurd û hemî hezkirîyên xwe dikim

Hevpeyvîn : Seyîdxan Kurij

www.kurd.org

Çima bi Kurdî nebû.. Mam ŞÊXO?

Ser'al Berwarî

Beriya çendekê, dawetnameyek a şahiyê ji pismamê min re hat û ji ber ku ew hê nexweş bû, ez li şûna wî çûm. Hêj em li mal bûn gazindên me hebûn ji ber ku xwediyê şahiyê Kurd e, lê dawetname bi Tirkîn e. Tû bêjî qey em li Ankara ne û zimanê Kurdî qedexe ye. Rast e ku bêtiriya bakûriyan Kurdî nizanin û gelek mêvanên wî yên Tirk jî hene, lê diheman dem de mêvanên wî yên başûrî û Almanî jî hebûn. Wî dikarî bi zimanê Almanî binivîse, çimkî em li Almanya dijîn û bêtirî.. yan em bêjin gişt xelk Almanî dizanin. Lê diyare ji ber ku ew tiştên ku bi Tirkî tên nivîsîn di zimanê Kurdî de tunene, loma Mam şêxo ev kir!

Ez naveşêrim ku min diviya ez biçim şehyanê, çimkî ev demek pire min şehyanên Kurdan ne dîtine, ne ku ez semakerekî başim. Lê ji ber ku ez gelekî xerîb bûm ji civatên Kurdan û dîtina alayê Kurdistanê yê ku bêtir li şehyanan tê bilindkirin.

Me go şahiya Kurdan e, lê dema em gihiştin ber deriyê hola şehyanê dengê stiranbêjî dihat me ku bi Tirkî distirî û hin kes li ber derî bûn bi Tirkî bi xêrhatin dikirin. Birastî piştî em çûne jor xwediyê şahiyê hat û bi germî bixêrhatina me kir û tiştê baş ew bû ku wî bi Kurdî diaxift, ev jî keyfa min gelek pê hat. Çimkî beriya niha jî min xwediyê şahiyê dîtiye lê nedikarî bi Kurdî baş baxive.

şahiyê berdewam kir û hin carna stranbêjî peyvên Kurdî dixistin nav stiranên xwe de, wek ku diviya me bixapîne û bêje; va ez yê bi Kurdî distirim.

Di demekê de ku ez mijûlim û çavên xwe li kesekî digêrim ku ala Kurdistanê bi destê wî be, yan kesekî "jin, mêr, zaro, pîr) cilê Kurdî li ber be, kes nebû ji biliya zelamekî ku ew jî ji başûr bû. Di van deman de kesek hat û ji me re got;

- Hûn Tirkî dizanin?
- *Me got; ne.*
- *Got; ji Îraqê ne?*
- *Hevalê min go; ji Kurdistanê.*
- *Got; ser çavvvvvv.. û çû.*

Me dît ev kes çû cem hin kesên din jî, me ne zanî mesele çiye û ji ber çi ev pirs ji me kirin!?. Ev tişt ma di dilê me de, loma me ji hin xortên ku li nêzîk me bûn pirsî, ev çiye?!. gotin; wî kesî dixwest ji we re bibêje: Hûnê çi bixwin?.. Çi vexwin? ji bo ku ji we re bîne. Piştî demeke kurt me dît ev kes hat û fêqî, vexwarin û tovik, ji hemûyan re anîn, tenê em jê bê par man. Wek hevalê min got; Baş bû ku xwarina şîvê da hemiyan bê ku jê bipirsin; Hûn Tirkî dizanin yan ne?, Çimkî eger ew jî bi zanîna zimanê Tirkî ve girêbidaya, em birçî diman.

Helbet xwediyê şahiyê Kurd bû û tu mirovên wî Tirk nebûn. Lê gişt tiştên şahiyê bi Tirkî bûn. Her ji wê terîşeya sor ya ku li kemera bûkê girêdayî heya şêweyê semakirinê û...htd. Ez gazindê dikim lê ne ji kesekî bi tenê. Mixabin ev tişt di nav gelek xelkê Bakurê Kurdistanê de berbelave. Wesa hizir dikin ku zimanê Tirkî, zimanê standardê cîhanêye "İngilîziye", loma wesa bi şanazî pê daxivin û di nivîsin. Her çende ku di dinyayê de hejartirîn zimane û eger em peyvên Kurdî, Erebî û Farisî jê bînin der, bawer bikin çi ji Tirkan re namîne,û divê ew wê demê bi îşaretan bi hevdû re baxivin.

Li dawiyê ez vegeriyan mal, lê ne wek wan kesên ku ji şahiyan tên bi keyf, belkî ez bi kul û xem vegeriyam. Bêyî ez wê civata Kurdî ku ji ber wê çûm bibînim, guhê min bi mûzîk û peyvên Kurdî şanebû, çavên min yên birçî bi dîtina ala Kurdistanê têr nebûn û ez vegeriyam male. Loma ez dibêjim: Çima bi Kurdî nebû.. Mam ŞÊXO?

Li Dortmundê du Komeleyên Kurdî bûn yek

Li Dortmundê du Komeleyên Kurdî, EV û Komela HÎVÎ – hatin ba hev û biryar girtin ku komeleyên xwe bikin yek û bi hevre bixebitin



Mahir Berwarî/Dortmund

Li Dortmûndê, đi 5.12.2004an de nûnerên du komeleyên kurdî – Komela civata Kurdan. EV û Komela HÎVÎ – hatin ba hev û biryar girtin ku komeleyên xwe bikin yek û bi hevre bixebitin. Hat diyarkirin ku ewê ji bo paraztin û pêşdebirina xebata çandî û têkiliyên karên siyasî bi hevre bixebitin. Bi vê yekbûnê wê tifaq û baweriyek xurt di navbera Kurdên li herêmê pêk bê û kar û xebata wan zêdetir bibe.

Herdu komele li ser van biryaran hatin cem hev:

1- Di bin çi navî de dibe bila bibe, wê herdû komele bi hevre kar bikin,

2- Wê destûr neyê dan ku bandora tu partiyekê li ser komelê bibe,

3- Kesên ku endamên partiyên Kurdî ne, kesên ku tirsa neteweyî li gel nebe û bi dijmin re kar nekiribe, karin bibin endamê Komelê,

4- Her Kurdê ku paqij be û dijminatiya Kurdistanê nekiribe kare bibe endamê Komelê,

5- Kurdistan yek parçe ye û xebatek gelemperî ji bo Kurdistanê,

6- Endamên rêvebir, ku çi bi hilbijartin û çi bi destnîşankirin bên hilbijartin, divê xudan şiyan û di kar û xebata xwe de xwîngerm û çalak bin.

Ciyê şanazî û kêfxweşiyê ye ku herdu Komeleyên me li ser bingeha xebata Kurdistanî hatine ba hev û em hêvîdarin ku evê ji bo gellek Komel û Partiyên Kurdan bibe nimûneyek berbiçav.

(Berdewama rûpela 12)

Em gelek xemgîn in ku em hê nikarin li bakurê welatê xwe rojnameyek Kurdî rojane derbixin.

Carekê xwendevanek altgirê pkkê ji Swêdê nivisîbû ku wî Peyama Kurd li dikanê ditiye û kiriye. Di nameya xwe de dinivîse: Azadiya Welat heta nuha zêdetirî du sed hejmaran derketiye. Hûn ji sed hejmar derxin, ezê deh hezar kron alikariya we bikim. Ev gotin nîşan didin wî kêfa xwe bi derketina rojnameyeke Kurdî aniye. Sîheta wî xweş. Ez jî dibêjim: Ev dorberê ku xwendevan behsa wan dike, li Tirkiyeyê û Ewrûpayê du rojnameyên rojane bi zimanê Tirkî çapdikin. De bila ev hêz yek ji van rojnamên xwe bike xurû Kurdî. Pîrozbahiya yekemîn emê ji wan re rêbikin. Bi hezaran kronên me nîtin, lê soz, emê bibin aboneyê wan!

Em dixwazin bi van gotinan çi bêjin? Mebest çi ye? Mebesta me, bila rojnamevaniya Kurdî xurt bibe, rengîn bibe, kî vî karî dike sîheta wan xweş. Mesihiyan kitaba pîroz İncil wergerandine Kurdî, Museviyan Tewrat wergerandine Kurdî, sîheta wan û destê wan xweş. Pirtûkxaneya Kurdî dewlemend kirine.

Ji aliyê politikî ve em û apoyî weki reş û spî dijberên hev in. Xeta me Kurdewarî û Kurdistanîti ye, yê Îmraliyê Kemalistî û Tirkiyeyîti ye. Weki şev û roj'e em ji hev cuda ne. Ew jî nivîsên xwe yên Kurdî de ji bi piranî propagandaya A. Ocalan dikin. Bila bidin. Lê bila bi Kurdî binivîsin û bi Kurdiyek paqij.

Eger ew her tim bi Kurdî binivîsin, dê rojek were, nivîsê û biziweriya wan ji bibe Kurdî! Ez sedî sed bi wê yekê bawer im. Ji ber ku bi vinî hatiye îspat kirin ku ziman û raman bi yek du ve girêdayî ye. Raman xwe bi ziman dide der, ziman jî dihêle ku ramanên nu bi wî zimanî biafire. Mirov zêde bi kîjan zimanî biaxive, bixwîne û binivîse, wê demê bi wî zimanî jî difikire û ramanan diafirîne.

Ev têgihiştin, ev hizre rêça me ye. Û ji bo me niqteyekî din jî giring e: Pirrengî, fireh ramanî, lêkolandina dirok û klasikên me, lê her wisa bi cihkirina modernizmê û navdemiyê.

Cihê ku raman lê azad nebe, hêjayîyên mirovayetiyê li wê derê dirizin, ji dest diçin. Ramanê azad bike ku ew te bigihîne azadiyê...

Peyama Kurd bergeha azadiyê ye, pirrengîyê ye, modernizmê ye û hêlîna Kurdayetiyê û Kurdistanîtiyê ye!

Kî dibêje, haa, ev cihê min e! Bila kerem bike were, cihê wî/wê li ser serê me û ser çavê me ye. Çi kar û xizmetê ji doza vî miletî re dikare bike, bila were ew ji zêrekî bavêje xilika dewlemendiya zimanê û çanda Kurdî. Em hewceyên peyamnêran, nivîskaran in, lêkolînvanan in, em hewceyên elikariya teknikî û diravî ne, em hewceyê dilgermî û dilsoziya her Kurd û Kurdistaniyek in.

Me behsa şaşî û kêmasiyên xwe nekir. Helbet gelek in. Ewan jî kerem bikin hûn binivîsin, emê biweşînin.

Heta hejmara pêştir xatirên di nav saxî û silametiyê de.

Bayram Ayaz

Nameyên we • Nameyên we • Nameyên we

Pîrozbahiyek direngmayî

Birayên Hêja, ev bûn 12 hejmarên Rojnama Peyama Kurd derdikevin, her çar hejmarên pêsin, ji ber ko ez li Welat bûm min ne xwendi. Piştî ez ji Welat vegerîyam jî min hinekî teralî kir. Lewma Pîrozbahîya min direngî ket. Bi rastî em Kurdên welatevîn , welathez û welatparêz,, zûva li benda rojnamek weha pirrengîn û gelekdeng in, bi xurû zimanê bavûbapîran, ku herkes piskek xwe tê de dibîne bûn. Her wesan wextê mirov di ber dikanên rojnamefiros û Kîoskan re derbas dibe, di nav rêzên rojnameyên cihanî de navê Peyama Kurd dibîne, bê hemdî ji kêyfan dilê mirov bi çarkopal lêdide. Mirov xwe bi xwe dibêje : Ev ezim haa ! ev jî rojnama min e . Bila çavê dijmin bipeqin...Mala we ava , we piskek (parek) ji birîna me kewand... Ez we hemî dameziranvan, xebatkar, kesên dikirin, difiroşin , yê dost û nasên xwe re pêsniyar dikin bi dilûcan pîroz dikim. Hêvîdarim dê di heyamên bê de, bibe rojnameyek rojane. Her weha ez ,Wî an jî Wê ko di kuncika Fatê were civatê de dinivîse dubare pîrozdikim, ew bi cirietek mezin pêkenînên bin malduxînî (bin zikî) dinivîsîne û kesên xemgîn dikenî ne . Heke hûn rê bidin? Ez dê li ser pêkenîkan ji bo xwendevanên Peyama Kurd nivîsarekê bişînim. Van her sê hejmarên dawî de ji derveyî kuncika Fatê, we rê daye pêkenîkên din jî. "Lê mixabin pêkenîk li ser Lazan in ,gelo ma di rojhilata navîn de milletek hindî (qasî) me Kurdan di warê pêkenîkan de zengîn heye? Min nêzîkî sed pêkenîkên cur be cur berhev kirine. Hinek jî min bixwe çêkirine. Heke hûn bixwazin ez dê her hefteyê yekê jibo peyamê rêbikim. Dîsan we hemûyan bi dil û can pîroz dikim, pêşketina we jibo milletê me serbilindî û rûspîtîy e...

Bavê Ronahî

Ahmet înanç û Osman Kilinç bi pîroznameyên xwe Peyama Kurd kêfşa kirin. Em wek Peyama Kurd spasiya xwe pêşkêşî wan dikin û serketina wan dixwazin

Jinekolog, mêrekolog, dînekolog Prof. Doc. Dr .
Fatê Were Civatê



Şêxbat

• ***Xaltiya Fatê, ez xortekî kamil bûme, 18 salîme û av li min geryaye. Laşê min duxre, kurmik di laşê min de diçin û tên. Ez ji bavê xwe re dibêjim: Min bizewicîne! Ew dibê: Zû ye! Ez ji diya xwe re dibêjim, diya min dibêje: Te go çi? Min ker di gund de nehiştin, bazdame ser teva. Kolan bi kolan digerim, yan ezê bazdim ser hinekan û yan wê hinek bazdin ser min!. Ma ez xwe bikujim ez çi bikim?***

Remezanê Har / Midyadê

Lao Remezano, tu jî pir harî haa! Me go lêxe me nego bikuje! Me jî xortanî dît qurban, me jî ker di gund de nedihiştin! Bi serê te, gava kerên gund çav li me diketin, digotin xirxip û direviyan, em naskiribûn û zanîbûn go nêta me ne şerîf e. Îcar em diçûn gundên cîran û li dor kerên wan diçûn û dihatin. Îcar lao, ev serpêhatî û zagonên jiyanê ne, kamilbûnî, xwîngermî û lêrabûn hem xweş e û hem jî zehmet e. Dê û bavê te belengazin, feqîrin, nikarin te bizewicînin. A baş tu bi a min bike. Heger te ker li gund nehiştibin, îcar bide dû hespan. Dûvre mehîn, qantir û çêlek. Heger te xwe li wan jî ceriband û kurmê xwe şikenand, îcar bide du kûçik û pisîkan heta dor bê ser mar û dûpişkan.Bi mar û dûpişkan re şer bike, heger te zora wan bir, tê xwe li wan jî biceribînî, na heger wan zora te birin û bi te vedan, ji xwe tê biçî wê dinyayê nav 70 Horiyên buhuştê!. Ma ne başe!?...

❁❁❁ ❁❁❁

• ***Fatê xanim, ez wê rojê bi teqsiyê ji Bonn'ê çûm Koln'ê. Li ser otobanê min dî hema segbavekî Alman bi demançê bi dû min ket. Teq û hey teq!. Min xaz da teqsiya xwe û reviyam. Ê Alman jî xaz da teqsiya xwe û bi dû min ket. Wele ez li ciyekî rawestiyam, min dît ê Alman jî hat cem min rawestiya. Min dêna xwe dayê va demança wî a bi henekaye, ne a rastî bû. Segbav ziravê min qetand û ez ji mêranî de xistim allahwekîl! Piştî go min dît demança wî sexteye, îcar mêraniya min û Kurdîtiya min hat min haa!. Ez daketim û min pêl serê wî kir, lêxe û hey lêxe! Ma min nebaş kir!?***

Bargiran Miho / Bonn

Way bavooo! Kuro tu ji mirinê xilasbûyî haa! Ê lao çi karê te li ser otobanê heye bavê mino? Ma tu nizanî otoban riya çûn û nehatinê ye? Rojekê yan tê hinekan bikujî, yan wê hinek te bikujin! Polîs li ser otobanêne, leşger li ser otobanêne, rêbir, diz, teşqelcî, reklamcî, kebabçî, qemyoncî, eroîncî hemû li ser otobanê karê xwe dimeşînin ma tu nizanî!? Careke din destvala dernekeve ser otobanê, keleşkof û bombeyan têxe teqsiya xwe û dûvre derkeve otobanê!. A baş, bi balafirê bifire Koln'ê, yan jî li Kerê siwarbe û here! De oxir be!..

fate@peyama-kurd.com

Ceribandin

Yekî 75 salî diçe cem Doktor û dixwaze sperma (avik) xwe biceribîne bê ka mêranî pê re maye yan na. Doktor şûşakî piçûk dide wî û dibê: „ Vî şûşî dagir û sibê ji min re bîne".

Adinî rojê ê kal şûşe anî û da dest Doktor. Doktor nerî go şûşe vala ye. Sedemê ji kalo dipirse, kalo jê re dibê:

- Doktor Beg; ez bi serê bavê tekim, şevê din min bi destê rastê ceriband çênebû, bi ê çepê ceriband çênebû. Min gazî jina xwe kir. Wê jî bi herdû destan ceriband çênebû, bi devê xwe ceriband çênebû, diranên xwe derxist û ceriband dîsa çênebû. Talî me gazî jina cîranê xwe kir û wê jî bi herdû destan ceriband çênebû, bi devan ceriband dîsa çênebû. Doktor ecêbmayî, devjihev ji kalo pirsî:

- Te go çi te go çi ? Jina cîranê te jî ceriband ?

- Erê wele, me kir û nekir go em karibin devê vî şûşî vekin me nikarîbû!.....

Pisîk

Zilamek ji mal derdikeve go here karê xwe. Dibîne cîranê wî ê Laz li ber çem Pisîka xwe dişo.

- Cîran zêde pisîkê neşo ewê bimre haa!...

- Na na tu tişt pê nayê, meraqa neke!...

Zilam piştî du seetan ji kar derket û berê xwe da malê. Nerî wa cîranê wî tiştekî di bin axê de vedişêre.

- Ma min ji te re negot zêde neşo tê wê bikujî lo!...

- Kuro ne ji şûştinê mir loo, ji guvaştinê mir ji guvaştinê.!.....

Remildank

Beran (21.03-20.04)
Rojek xweş û bi xêr e. Hevalên we moralê we bilind dikin. Dev ji sistbûnê berdin, germ bin.

Gamêş (21.04-20.05)
Riya evîn û hezkirinê vekiriye,dibe ne li gor dilê te be, lê rojek xweş û ronak e.

Cêwî (21.05-21.06)
Nîqaşa babetên giran nekin. Nekevin nav gengeşî û pirsgirêkan. Bêhnfireh û bi aram bin.

Kevjal (22.06-22.07)
Hûn aktîf û afirmend in. Gelek tiştên bi heyecan diqewimin, xwîngerm û bi taswas nebin.

Şêr (23.07-22.08)
Rojek tevlihev e. Giraniya rojê kar û xebat e. Hûn bi aram in, armancên pêşeroja xwe kifş bikin.

Simbil (23.08-22.09)
Spor û bez ji bo we baş e. Her çiqasî hûn tirale û sistbin jî, lê hûn dixwazin aktîf û çalak bin.

Mêzên (23.09-22.10)
Rojek hevalbendiyê ye. Navbera we û hevalên we xweş e. Ev dibe sedema hesûdî û zikreşiyê.

Dûpişk (23.10-21.11)
Ji bo evînî û hezkirinê rojek baş e. Bi hezkiriyê/ya xwe re li malê bin û xwe rihet bikin.

Kevan (22.11-21.12)
Hûn giraniya xwe didin ser aboriya xwe. Germiya bêrikê baş e, lê her tişt ne pare ye.

Kovî (22.12-19.01)
Roja his û evînê ye. Hinekî wext bidin kezkirinê. Hezkirin û evîn jiyan e, jê bi dûr nekevin.

Satil (20.01-18.02)
Zêde tişt naqewimin, ev ji bo we baş e. Hûn dixwazin bi tenê bin û serê xwe rihet bikin.

Masî (19.02-20.03)
Roja evîn û romantîzmê ye. Bi hezkiriyê/ya xwe re derkevin seyranê, ji pirsgirêkan bi dûr kevin.

Xaçerêz



Çeperast

1. Heywanek / navê eşirekê. 2. Aligirên Hz. Alî / erd, xak, zemîn. 3. Bajarekî Tirkiyê / tezeyî, xweşikî, zaroka hespê. 4. Carisî, bêbextî. 5. Payîextê Estonya / ciyê şil, ne bejî (paşûpê). 6. Navê rojekê / nîşana elementa Amerikyûmê / notayek. 7. Notayek / navekî mêran. 8. Yallah, rabe, yehdê / rêxistina parastina atlantika bakur. 9. Bivirê piçûk, destbivir / bajarekî rojavayê Kurdistanê. 10. Porê gij û tevlihev, pirebok / kesên ji Îranê ne (paşûpê) 11. Bi xweşi, bi dilê xwe / du tîp. 12. Dengê pez (paşûpê) / ne min lê .../ tûrik, telisê piçûk. 13. Zilam, Mêr,plûs / ne tûj, nabire / ûrîn, destava piçûk.

Serejêr

1. Xebat, iş / çekêk, ...û kevan / emir, sal. 2. Navekî mêran / lebatek mirov, riya xwarin û vexwarinê / ne nêr, minus. 3. Kepaze, pîs, netiştik / zarava, dialect, ziman. 4. Gotina ecêbmaytnê, kekobrao, nalo / mal, hebûn, serwet (paşûpê). 5. Jina bê mêr, navê darekê / navekî jinên biyanî (paşûpê) / tûj, şewat / hejmarek. 6. Navê kanalek Televîzyonê / bide min, bîne / du tîp. 7. Çareserî, dermankirin, rêdîtin / beşê zanyariya gul, kulîlk û çîçekan. 8. Xwediyê gund, begitî, mezinî / ji ber vê, jib o vê / nîşan, alamet. 9. Nîvê rojê, navbera seet 12 – 15 / kesên Rûsî. 10. Navê rojekê / kurtenîşana xwedayek Sumeran / rêxistina welatên paşdemayî a Swêdê (paşûpê).

Bersivên hejmara 13an

Çeperast

1-) Rûşen aslan 2-) Aram / arî 3-) Panama 4-) enosis / mat 5-) ru / esok / ri 6-) Îsa / erîseth 7-) gur / ana 8-) si / Elman 9-) serbestî

Serejêr

1-) Rapewrin 2-) ûrartû / se 3-) şano / agir 4-) emase 5-) mîser 6-) axasor / es 7-) kî / lt 8-) laem / Samî 9-) ar / arena 10-) Nîştiman

www.arsiv.org

Brîna reş (Pençeşêr – Kanser)



Brîna reş, ji malzaran (hucre) destpêdike. Malzar wek karxaneyek (febrîqe) piçûk e. Malzar ji xwarinê enerjiyê çêdikin. Ji bo vê bi cîh bînin, divê di nava malzaran de perçeyên pirr piçûk ku, bi mîkroskopên Elektronê tên dîtin, hebin. Ji van perçeyên piçûk re Mîto kondrî tê gotin. Gava Mîtokondrî xera dibin yan brîndar dibin, malzar nikarin oksîjenê bistînin û bi vê re dan û stendin çênabe. Ji bo vê jî malzar bêgav dimînin ku bê oksijen bijîn û li ber xwe bidin. Ev malzarên ku bê oksjen dimînin û li ber xwe didin, di nava demê de dibin sedema brîna reş (kanser) . Malzarên ku ji van malzarên kanserê dizên jî dibin malzarên kanserê. Heta îro tu çareseriyek ji bo brîna reş nehatiye dîtin. Derman'in henin ku pêşketina brîna reş li paş dixin lê wê bi temamî ji holê ranakin.

Pisporên vê nexweşiyê li dijî vê nexweşiyê van pêşniyazan dikin:

1-) Gava yekem: *Xwarina hêşînayiyan. Divê rojê 600 - 800 gram xwarinên bi nişadir û hêşînayiyên bi proteîn bên xwarin. Di nav wan de nan, birinc, meqerna, baqil, fasûlî, petat, fisteq û bindeq hene. Li gor pisporan, di nava hêşînayiyan de wîtamîn, mîneral û maddeyên din yên girîng yên li dijî kanserojenên kanserê hene û ev rê nadin ku, zû bi zû kanser çêbibe. Hêşînayîyên ku, kêm rûn û kalorîne, hem nahêlin ku kanser çêbibe û hem jî pêşiya kîlogirtin û qelewbûnê jî digrin.*

2-) Gava duyem : *Xwarina sebze û fêkiyan. Divê her roj zêdeyî 400 - 800 gram cûrbecûr fêkî û sebze bên xwarin. Têrxwarina sebze, fêkî û hêşînayîyan %20 rîzîko'ya kanserê kêm dike. Bi taybet jî şelim, Kundir, Gêzer, Firingî (bacanê sor) û cûreyên narinciyan (pirteqal, lîmon, mandalîn, greyfurt û.w.d) li dijî kanserê bandorekê baş dilîzin.*

3-) Gava sêyem: *Parastina kîloyan û jiyanek aktîf a fîzîkî. Kîloyên zêde û kêm rîsk'a kanserê zêde dikin. Ji bo vê jî li kîloyên xwe miqatebin û xwe bilivînin, tevgerê bikin. Heger hûn karibin, rojê seetekê bimeşin yan jî bibezin.*

4-) Gava çarem: *Tûtin û Alkol. Hem tûtin û hem jê alkol rîsk'a kanserê zêdetir dikin. Divê alkol zêde neyê vexwarin. Tûtin qet neyê kişandin.*

5-) Gava pêncem: *Rûn û Xwê. Xwe ji rûn û xwêya zêde biparêzin. Ji xwe, di xwarinên pakêtkirî û hazir de xwê û rûn pirr e. Vêna jibîr nekin. Rûn û tewaşê zêde hem rîsk'a qelewbûnê zêdetir dike û hem jî ev qelewbûn dibe sedemek ji yên kanserê.*

6-) Gava şeşem: *Xwarina kevnikgirtî û şewitî.Xwarina kevnikgirtî - kufikbûyî - û a şewitî nexwin. Divê xwarin di sarinc'ê (buzdolab) de baş bê parastin. Xwarinên ku wextê wan derbasbûne nexwin. Goşt û Masî zêde neqelînin, neşewitînin. Ji şewat û qelandina zêde maddeyên kanserojenê çêdibin. Heta ji we bê xwarina şewitî û zêde qelandî nexwin.*



Li gor pisporan, goştê braştî û qelandî di laşê meriv de malzarên kanserojenê çêdikin. Xazên jehrîn yên di nava komir û tupxazê de bi goşt ve dizeliqin û dikevin bedena meriv. Jib o vê jî pispor bale dikşînin ku, goştê ku li ser komir û tupxazê tê braştin û qelandin, neyê xwarin. Maddeyên xazê yên wek: karbonmonoksît, kukurtmonoksît û dîoksît'ê bi riya qelandin û braştinê, bi goşt ve dizeliqin û dibin bedema meriv de kanserojenan çêdikin û dibin sedema kanserê. Li gor tê gotin, divê germiya agirê goşt 250 dereceyî derbas neke. Gava 250 derece derbas bû, îcar maddeyên kanserojenê derdikevin holê û dibin sedema gelek cûreyên kanserê. Jib o vê, gava goşt bê qelandin yan braştin, divê ew 15-20 cantîmetre ji êgir dûr be da ku ev maddeyên kanserojenê sererast nekevin nav goşt û zêde bi zirar nebin.

Hêşînayî, fêkî ,sebze û şaraba sor dijminên kanserê ne û rê li ber çebûna kanserê digrin. Heta ji we bê, xwe ji van xwarin û vexwarinan kêm nehêlin û li xwe miqatebin.

Allerjî



Allerjî zîzbûna lebatan a li dijî maddeyên biyanî ye. Ji van maddeyan re Allergen tê gotin. Hinek maddeyên di nava xwarinan de, derman û maddeyên ku bi hewê re dikevin nava Sorsorkê (kezeba sor) hinek ji wan in. Ev madde ji lebatan re biyan tên. Laş li hember van maddeyan -dijmadde-yan diafirîne. Ji van dijmaddeyan re -Antîkor- tê gotin. Ev madde di lêş de bersivên bi hinner (bi hêz) didin û ji pevçûna herdû aliyan allerjî çêdibe. Ne şerte go laş allergenan ji derve bistîne. Carna mîkrobên ku, di laş de bi cîh bûne û parazîtên di nava roviyan de jî, karin van allergenan bînin holê. Li dijî van maddeyan reaksiyona her lebatê ne wek hev e. Xirabûna hormonan û a aşik, rovî û kezebê jî gelek caran dibin sedema allerjî yê. Mîkrob (bakterî), acizî û qehr, guherîna demsal û hewayê jî hinek sedem in. Zekem, astim û.w.d (û wekî din) di vê beşê dene. Allerjî kare îrsî jî (ji malbatê derbas bibe) bibe. Hêk, masî, çîlek, şîr û toza hundurê malê hinek ji van allergenan in.

Allerjiya toz'a çîçek û kulîlkan

Bi hatina demsala buharê re bi gelek kesan re zekem, hêsrên çavan, sorbûna dest û ruwan peyde dibe. Ji vê re allerjiya Polen tê gotin. Bi taybetî zarok di bin bandora vê allerjiyê de dimînin. Hinek alametê vê allerjiyê Pişkîn, Kuxîn, Herka Poz, Sorbûn û şilbûna çavan in. Heger di dema xwe de ev allerjî neyê çareserkirin, kare bibe sedema înfeksiyona (îltîhap-elemgirtin) çavan, zekem û astima allerjîk. Di hemû allerjiyan de tehlûka herî mezin şok'a anaflaktîk e. Ango, zehmetiyên bêhnstendinê ne. Ev zehmetî carna kare bibe sedema mirinê.

Xweparastina ji allerjiya toza çîçekan (polen) zehmet e. Bi destpêka buharê re toza çîçek û kulîlkên daran û simbilên geya û çîmenan, bi hewê re dest bi firê dikin. Ev toz di hewa ziwa û bi bê re li her derê belav dibin. Bi piranî serê sibehê û berêvarî belav dibin. Ji bo vê, kesên allerjîk divê hay ji xwe hebin û heya ji wan tê di van wextan de zêde derneke-vin derve. Heger kesên allerjîk zêde li derve mabin, êvarî gava hatin malê go karibin serê xwe bişon wê ji wan re baş be. Ev şûştin allerjiyê ji holê ranake lê kare bandora wê kêmtir bike. Çareserkirina allerjiyê zehmet e. Ji ber vê jî divê meriv têkiliya xwe ji Doktor nebire û li gor şîretên wî tevbilive.

Pêlav (sol–şekal) û pêwistiya tenduristiya lingan



Ling yek ji lebatên herî girîng in. Pêlav bandorekê mezin li ser tenduristiya lingan dikin. Gava we ji xwe re pêlav kirî, qenc dên û bala xwe bidinê. Pêlava we divê ne teng be. Pêlava teng dibe sedema perçiqandina pêçiyan, têrabûna nenûkan, bîrova lingan û gelek tiştên din. Ji aliyê din, bi pêlava teng meriv zû diweste û zêde nikare bimeşe. Pê re êşa ling, çîm (paq-hêt) û êşa piştê jî destpêdike. Gava we pêlavek hilbijart dêna xwe nedin model û rengê wê. Berî her tiştî rehetî û başbûna wê girîng e. Berê pêlavê biceribînin û piştre bikirin. Heger pirsgirêkên we ê lingan hebin, pêlavên Ortopedîk bikarbînin. Herin cem pisporekî ortopedîk û jê şîretan wergirin. Pêlavên ortopedîk alîkariya lingan û a piştê dikin, meriv nawestînin.

Ji bo tenduristiya lingan li van xalên jêrîn haydar bin.

- *pêlavên teng, yên serê wan tûjik, yên kabikbilind ji lingan re nebaş in.*
- *Êşa lingan navêjin piştguhên xwe û serî li pisporekî xin.*
- *Heger di lingên we de rengên guhertî çêbibin û nenûkên we qalind û bê serûber dirêj bibin, bizanibin go pirsgirêkek heye.*
- *Berî razanê ling û pêçiyên xwe bişon û qenc ziwa bikin.*
- *Nenûkên xwe misêwa (rast) bibirin û zêde kin nekin.*
- *Pêlavên li gor lingên xwe bikirin, ne zêde teng û ne jî fireh.*
- *Pêlavên kevn û qetyayî bavêjin, karin allerjiyê çêkin.*
- *Heger mecala we hebe her roj yek pêlavê nexin lingên xwe, wan biguherin.*
- *Di rojên germ û hewa xweş de lingên xwe bişon û krêm bikin.*
- *Li ciyên nepaqij pêxwas negerin.*
- *Heger nexweşiya şekir bi we re hebe, salê carekê lingên xwe li cem Doktarekî saxtî (kontrol) bikin.*

میردمندالێکی ١٢ ساڵەی ئەمریکی، خاوەن بەهرەیەکی بێ وێنەیە لە مۆسیقادا!



میردمندالێکی ١٢ ساڵەی ئەمریکی کە بە ناونیشانی گەورەترین نموونەی دانایی و بلیمەتی لە بواری مۆسیقا بە دریژایی دوو سەد ساڵی دواییدا، دیاریکراوە، دەڵێت کە ئاوازی مۆسیقی تازە بە هزر و میشکی ئەو ئیلهام دەکرێت. بەبڕوای هەندێ سەرچاوە ئەم میردمندالە کە ناوی"جی گرینبێرگ"ە بە جێنشینی مۆتزارت دادەنرێت.لەماوەیەکی کورتدا دەتوانێت ئاوازی نوێ و ئالۆز دابنێت. ئەم بلیمەتە نازناوی **"Blue Jay"** واتە " قەلە ڕەشی شین"ی بۆ خۆی هەڵبژاردووە و هۆی هەڵبژاردنی ئەم ناوەش بۆ ئەو دەنگە فراوانەیە کە ئەو بااڵندەیە دێنێتە ئاراوە. "سام زیمان"ی ئاوازدانەر لەبارەی ئەو میردمندالەوە دەڵێت: ئێمە قسە لەبارەی کەسێکەوە دەکەین کە بە موتزارتی دەشوبهێنین، ئەم میردمندالە لە ڕیزی گەورەترین بلیمەتەکانی میژووی مۆسیقایە.

گرینبێرگی بلیمەت دەڵێت:.کاتێک ئاوازێک لە میشکی خۆمدا دەبیستم، سەرەتا حەزدەکەم بە باشی ببیستم و پاشان دەیلێمەوە و زۆربەی جار کاتی هاتنی ئیلهامێک بە میشکم، بە باشتری دەزانم کە پیاسە بکەم، چونکە هاوکات لەگەڵ ترپەی مۆسیقا هەنگاو دەنێم.

ساڵی نوێتان پیرۆزبێت!

بە مەبەستی هاندانی ڕەوەندی کورد لە هەرێمی "نۆرد راین ڤێست ڤالن" بۆ بەشداریکردنی لە هەڵبژاردنەکانی کوردستان و عێراق و هاتنی ساڵی "نوێ" لێژنەی ڕێکخراوی شاری دویسبۆرگ(پ.د.ک)لە ئەڵمانیا، ڕۆژی ٢٠٠٤/١٢/٢٩ کاتژمێر ١٧،٠٠ و بەئامادەبوونی پرۆگرامی "مێرگ و چیمەن"ی تەلەفزیۆنی کوردستان، ئاهەنگێک سازدەکات. نرخی بلێت ٧ یۆرۆیە و تا تەمەنی ١٥ ساڵی بە خۆڕاییە. ناونیشان:

Efendi- Kulturzentrum Adelen str.23
Duisburg Hochfeld

بۆ زانیاری زیاتر پەیوەندی بەم ژمارە تەلەفۆنانەوە بکەن:

017624466936 - 01736152343



چی دەزانیت دەربارەی کوردەکانی ئوردن؟

کەمایەتییەکی دانەبڕاون و چەندین سەرۆک حکومەتیان تێدا هەڵکەوتووە..
زۆربەیان کوردی نازانن و لە زمانی عەرەبیدا پسپۆڕن

پێدەچێت زۆربەی ئوردنییەکان نەزانن کە "سەعد جومعە" سەرەکوەزیری پێشوو، شاعیر و ئەدیب و کارامەی زمانی عەرەبی،" کورد" بوو. هەروەها سەلاح سەعدەدین کە چەندین پلە و پایەی بڵندی وەزارەتی گۆڕیوە، هەتا ئەو کەسانەی کە ناوەکانیان بە نازناوی (کوردی) کۆتایی دێت. وەک : دکتۆر ئەشرەف کوردی وەزیری تەندروستی پێشوو، دکتۆری تایبەتی عەرەفات. کوردەکان لە کۆمەڵگای ئوردنیدا خۆیان گونجاندووە و خۆیان دانەبڕیوە. محەمەد عەلی سویرکی کوردی؛ بەم دووایانە کتێبێکی بە چاپ گەیاندووە لە ژێر ناونیشانی " کوردە ئوردنییەکان و رۆڵیان لە بنیاتنانی ئوردنی نوێدا'. ئەم کتێبە بەرهەمی ڕەنج و ماندووبوونی ١٧ ساڵ بووە، دوای ئەوەی هەستیکرد کە ئەو کتێب و وتارانە زۆر کەمن کە باسی کوردەکانی ئوردن دەکەن. ئەم کتێبە باس لە پێکهاتەی کۆمەڵایەتی کەمایەتی کورد لە ئوردندا دەکات، خۆگونجاندنیان لەگەڵ دانیشتوانی ئوردن لە دێر زەمانەوە بەو خاڵە هاوبەشانەی کە هەردوو لایانی کۆکردۆتەوە. لە سەرەتای کتێبەکەیدا ئاوا وەسفی کوردەکان دەکات: کورد گەلێکی هیند و ئەوروپین و زمانی تایبەتی خۆیان هەیە و لە سەرەتای مێژووەوە لەسەر خاکی کوردستان ژیاون. ئەوان گەورەترین نەتەوەن لە جیهاندا کە تائێستا مافی نەتەوەیی و سیاسییان نێیە، ژمارەیان دەگاتە ٣٥ تا ٤٠ ملیۆن. نووسەر دەڵێت: بەهۆی ئەو ژیانە سەختەی کە تێیدابوون و کاریگەرێتی ژینگە و هەرێمی سەختی چیایی و بەرەنگاریی هەمیشەییان دژی داگیرکەران؛ سیفەتێکی هاوبەشی پێبەخشیون (شانازی بە خۆیانەوە دەکەن و شەیدای ئازادین). مرۆڤی کورد تورەیە و زوو هەڵدەچێ، زوو ڕازی دەبێ و بە ڕاستی هاورێیەتی دەکا، دوژمنایەتیکردنیشی توندڕەوانە و سەختە، لە سەر ڕای خۆی سوورە، قسەی ڕاست دەکات و بە ئازایەتی و سوارچاکی ناسراوە، شاعیری ئەرمەنی ئاپۆقیان بە " سوارچاکانی خۆرهەڵات" وەسفی کردوون. بوونی کورد لە ئوردندا دەگەڕێتەوە بۆ سەردەمی شەڕی خاچپەرستەکان کە زۆرینەی سوپاکەی سەلاحەدینی ئەیوبی بوون و ژمارەیەکیشیان لەگەڵ لەشکری عوسمانیدا چوونەتە ئوردن. لە دوای ڕزگارکردنی وڵاتی شام، کوردەکان لە گەڕەک و شارەکانی شامدا وەک : دیمەشق، حەڵەب، تەرابلس، سەلەت، قاهیرە، سەفەد، غەززە، نابلس و خەلیل نیشتەجێ بوون. بە گوێرەی کتێبەکە ژمارەی کوردەکان لە ئوردن لە نێوانی ١٥٠٠٠ تا ٢٠٠٠٠ کەس دەبن کە لە ناوچە جیاوازەکانی ئوردندا بڵاوبوونەتەوە و تا ئێستاش شانازی بە کوردبوونی خۆیانەوە دەکەن. بەناوبانگترین کورد لە چالاکی سیاسی و ئابوری ئوردندا ئەمانە بوون: دکتۆر خەیرەدین زەرگەلی کە سەرۆکی دیوانی حکومەت بوو، ڕەشید مەدفەعی بەڕێوەبەری ئاسایشی گشتی، سەعد جومعە کە سەرەکوەزیر بوو لە ساڵی ١٩٦٧(بۆ دوو جار ئەم پۆستەی وەرگرت). هەروەها دکتۆر ئەشرەف کوردی وەزیری تەندروستی و سەعدەدین جومعە وەزیری کاروباری سەرۆکایەتی وەزیران کە ماوەی زیاتر لە ٢٠ ساڵ لەم پۆستەدا بوو. ئەمە جگە لە ژمارەیەکی زۆر لە سەفیر و بازرگان و سەرۆک شارەوانی و پارێزگار و ڕۆشنبیر و مێژوونووسن کە کورد بوون. عەبدولڕەحمان کوردی دامەزرێنەری یەکەم دەزگای بڵاوکردنەوە بووە لە ئوردندا، لەگەڵ سەعد جومعە ساڵی ١٩٤٧ ڕۆژنامەی (الحق) و دواتریش گۆڤاری (الاردن الحدیث) یان دەرکرد. لەگەڵ ئەمانەشدا تا ئێستا کوردەکانی ئوردن نوێنەریان لە پەرلەماندا نییە، هەرچەندە لە ناو کۆمەڵگای ئوردنیشدا خۆیان گونجاندووە و لە ڕێی ژن و ژنخوازییەوە گەیشتوونەتە بنەماڵەی فەرمانڕەوا. زۆربەی زۆریشیان کوردی نازانن و لە بواری زمانی عەرەبیشدا پسپۆڕ و کارامەن، بەشداریان لە دانانی چەندین تۆێژینەوە و سەرچاوەی زمانەوانی کردووە لە وانە مێژوونووس و زمانەوان سیدۆ کوردی و عەبدولڕەحمان کوردی، محەمەد عەلی سویرکی، نەجمییە حیکمەت، دکتۆر بزران حەیدەر و زۆری دیکە.

سیستەمێکی سەرکەوتووی خواردن بۆ کەمکردنەوەی کێش لە مانگێکدا

ئەم سیستەمە پێویستە ئەو کەسانە بەکاربێنن کە کێشیان لە ١٠٠ کگم کەمتر نیە، وە درێژییان لە ١٧٠سم زیاتر نییە. هەروەها ڕۆژی کاتژمێرێک بە پێ بڕۆن وەرزش بکەن، لە خواردەمەنی چەوری زۆر و پڕ کالۆری بەرز خۆیان بپارێزن. هەروەها دەبێت دوای ١٥ ڕۆژ لە جێبەجێکردنی ئەم سیستەمە خۆت بکێشی هەروەها دوای مانگێک دەبینی کێشت ٢٧ بۆ ٣٠ کیلۆ دابەزیوە و، بە وردی پابەندی

نانی بەیانیان:
پرتەقاڵێک یان شەربەتی پرتەقاڵ، دوو هێلکەی کوڵاو.چای و قاوە هەرکاتێک دەتوانن بیخۆنەوە.

هەفتەی یەکەم

ڕۆژی یەکەم
نیوەڕۆ: چەند جۆرێک میوە، وەک (کاڵەک پرتەقال،سێو،هەڵوژە،چیلک ،قۆخ

شێو: گۆشتی برژاو (قیمە بێت یا ستیک، زەڵاتە (خەیار،کاهو،تەماتە،بیبەری سەوز)
تێبینی: چەند بخۆیت قەیناکا تا تێر دەخۆیت.

ڕۆژی دووەم
نیوەڕۆ: مریشکی کوڵاو یا برژاو بە بێ پێست، تەماتە
شێو: گۆشتی برژاو (قیمە بێت یا ستیک، زەڵاتە (خەیار،کاهو، تەماتە،بیبەری سەوز

ڕۆژی سێیەم
نیوەڕۆ: پەنیری بێ چەوری ، تۆست ، تەماتە
شێو: گۆشتی برژاوی بێ ڕۆن

ڕۆژی چوارەم
نیوەڕۆ: چەند جۆرێ میوە
شێو: گۆشتی برژاو، زەڵاتە

ڕۆژی پێنجەم
نیوەڕۆ: دوو هێلکەی کوڵاو، سەوزەی کوڵاو .کولەکە، گوێزەر، فاسۆلیا
شێو: ماسی برژاو یا کوڵاو هەر جەند بخۆیت، زەڵاتە
تێبینی: پێویستە تەواو ڕۆنەکەی داچۆڕێ

ڕۆژی شەشەم
نیوەڕۆ: چەنین جۆر میوە
شێو: گۆشتی برژاو- زەڵاتە

ڕۆژی حەوتەم
نیوەڕۆ: مریشکی کوڵاو یا برژاو بێ پێست، سەوزەی کوڵاو ، تەماتە
شێو: سەوزەی کوڵاو

تێبینی :
١-ئەم بەرنامەیە چوار هەفتە واتە مانگێک بەردەوامبە.
٢- هیچ شتێکی لێمەگۆڕە.
٣ئەگەر هەستت بەبرسێتی کرد لە دوای هەر نانخواردنێک بە دوو کاتژمێر خەیار و کاهو بخۆ.
٤- پابەندی ئەم خاڵانە نەبیت سوودی لێ نابینیت.



ڕاگەیاندن

ئاگاداری خوێنەرانی خۆشەویست دەکەین، کە دەمانەوێت لە ساڵی نوێدا لۆگۆ**Logo** ی پەیامی کورد بگۆڕین(بەشی کرمانجی خوارو) بە شێوەیەک کە لەگەڵ لۆگۆ لاتینییەکەدا گونجاو بێت، پێخۆشحاڵ دەبین بە گەیشتنی پێشنیار و بەشداریتان لە پێشکەشکردنی جوانترین لۆگۆدا. هەر لۆگۆیەک پەسندکرا خاوەنەکەی لە لایەن پەیامی کوردەوە خەڵات دەکرێت.

بەکوردی بدوێ، بەکوردی بخوێنە،
بەکوردی بنووسە، بەکوردی بیربکەرەوە!

ئاژانسی توریستی
NEW PLAN
ئێمە ئامادەی خزمەت کردنی هاوڵاتیانی کوردی عێراقین
کوردستان لە ڕێگای ئاراندوە
قیزای ئێران لە ماوەی دوو هەفتەدا
خەڵات لەگەڵ هەر بلیتێکی دووسەرەی ئاران، مەوداى خواردن لە شیکترین ڕێستوران لە ئاران بە مۆزیکی زیندوو
بلیت بۆ سەرتاسەری جیهان
گەشتی توریستی بۆ سەرتاسەری جیهان
حەجی عومرە
ئاران لە ٢٣٠ یۆرۆ
Thomas-Mann Str, 24
53111 Bonn
Germany
Tel.: 0049 (228) 180 24 34
Fax: 0049 (228) 180 24 38
E.Mail: info@newplan-travel.de
www.newplan-travel.de

Avirek li ser romana Hecîyê Cindî HEWARÎ yê (3)

Perwîz Cîhanî



Gava ku mirov vê serbihorîyê dixûne, mirov tê ser wê bawerîyê, ku ew gotina ku dibêje: „mêjû dupat nabe“, li bara gelê Kurd da derew e. Lew ra ku ev mêjûya xûnbar li bara me da eva sedan sale her weha çendcarkî dibe. Em li mêjûyê da gelek caran rastî vê serbihorîya tal û xogorîkirina keç û jin û bûkên Kurd hatine. Ji wan serhatîyên tal serhatîya Kela Dimdime. Gava ku Ecemên Qizilbaş, bi destûra şahê Sefevî, û bi xinizî û dexesî û xofiroşî, yan bi gotina îroyîn, bi caşatîya Xan Mehmûdkê Alekanî, serekanîya ava Kelayê peyda dikin û li dû birrîna avê li ser xelkê Kelayê da, kelayê dagîr dikin. Jin û qîz û bûkên Kurd xwe ji dîwarê kelayê da davêjin û naxwazin bikevin nav dest û lepên çilkine dujminê pîs û xûnmij û mejîhişk da. Feqîyê Teyran li Beyta Dimdimi da evê hindê weha vedigêre:

Bû refrefa qaz û werdekan
Xwe avîtin ji der û kulekan
Heyfa min ji wan çavbelekan

Nivîskar di gelek cîyan da rewşa jina Kurd li himber dujminan da nîşan dide û biwêrî û xoragirî û liberxwedana wê şirove dike. Bo nimûne jêhatî û xoragirîya Reşê, ji xwe bihorîna Kubarê û Gevez û Gulîzer û Belgîzerê û dehan jinên dî, ku mil bi milên mêran li malbata xwe xweyî derkevine.

Di vê romanê da ne tenê mirov serhatîya şer û reva Kurdan dixûne, belkû di gel wê şer û revê, mirov bi dehan rê û rismên Kurdî bi giştî, û rê rismên Êzdîyan bi taybetî nasiyar dibe. Rê û rismên wekî: derneketina Êzdîyan ji cixizê. Berbendbûna xwendinê ji wan ra, vergirtina cilên sipî, vernegirtina cilkên şîn, belawkirina nanê germ ji bo deifandina tomik û qeda û qotikan, derxistina şîva mirîyan, hilkirina agiri li ber kêla mirîyan, derbasnebûna şervanan li ser laçika jinan ra, reşandina ava çile li nav terş û ajelan bi mebesta adanbûnê, Kosegelidî, Xidirnebî, li şeva ceşna Xidirnebî da daxistina dûldankê li kulek û panceyan ra û berevkirina çerez û fêkîyan, nevexwarina avê li şeva ceşna Xidirnebî da, guhestina bûkê û rê û rismên jinanînê û çûna serexoşî û hewarîyê, bêdildanemêran ya kiçikan, revandina kiçkan û akama wê ya şûm, bertîldana serokên Kurdan ji bo karbidestên hukûmetê, yêkatîya axa û karbidestên hukûmetê li dijî gundî û paleyan.û rûçikandina gelê jar û bêdesthilat û bi dehan rê û rismên baş û xerabên din.

Li dirêjaya romanê da nivîskar rê û rismên baş dinitilîne û bi zimanê qaremanên romanê dijî wan kewneşopên Kurdî, kewneşopên ku bergirîya pêşketina gelê Kurd dike, dinivîse. Bo nimûne ew bi zimanê qaremanê romanê yê hişmend weha dijî kewneşopên ne li rê diaxive:

Xwendin guneye, zewaca şiletê guneye, kelem xwarin guneye, kincê şîn li xwe kirin guneye, guneye, guneye, guneye...

Nivîskar di dirêjaya romanê da li ser nexşa axayên êlên Kurdan, li ser bir û hizrên pîr û koçek û feqîrên Êzdîyan û kartêkirina kiriyarên wan li ser jîyana gelîrî û gîrodarîyên ku ewana ji bo gelê Kurd afirandine, dinivîse. Ew ji destê bêtifaqî û neyekbûna gelê Kurd û paşdamana gel dinale û xûn vedireşe.

Bi dîtina min romana Hewarî di gel hemû kêm û kasên xwe destegula romanên Kurdî yên Ermenîstanê ye. Tişta ku seratîyê dide vê romanê ne tenê gêraneveya qewimînên tale gelê Kurd e, belkû ewe ku nivîskar bi hostatîyek zor balrakêş bi sedan biwêjên Kurdî, li deqa romanê da cî kirîye. Gelek biwêjên ku hindik mabû, bihorîna sal û zemanan ji bîra gel bibin, bi qelema xwe zindî kirîye. Meriv li nava romanê da rastî sedan biwêj, metelok, istiran û gotinên pêşîyan tê.

Roman bi devoka Kurdên Ermenistanê hatîye şirovekirinê. Qaremanên romanê bi zimanê gelêrî, bi zimanê pale û gundîyên nexwendî li gel hev xeberdidin. Û li ber vê hindê ye, ku çendîn gotinê Turkî û Erebî yên serobinî hev bûyî jî di nav xezîna peyvên vê romanê da cî girtine.

Em hemû dizanin di devokên Kurdên bakûra Kurdistanê û bi taybetî devoka Kurdên Ermenistanê da gelek caran riste hindî tu bêjî kurte û gelek cîyan da daçek nayên bi lêvkirinê, û li gelek cîyan da jî kêmasîyên rêzimanî li ber çavan dikevin. Her çend ku kêmasîyên weha di vê romanê da ne hindikin, lê ev cure kêmasîyana qet nikarin ji buhayê wê romanê kêm bikin. Bi rastî ev romana xezîna peyv û biwêjên Kurdî ye. Eger ev romana carek dî bi destê Kurdîzanekî dilsoj li ser xîm û binêşeya rêzimanê Kurdî bê dariştinê, mafê wê heye, ku weke şûnewarek toreyî li zanistgehên Kurdî da wek xwende wêc jê bê wergirtinê.

Heyvên Kurdî

Mamoste Silêman TORÎ

Em hêdî hêdî ber bi sala nû ve diçin. Sazî, kovar û rojnamên kurdî wê salnamên kurdî ên nû tomarbikin. Ji bo ku hineki barê wan sivik bibe, çend pêşniyarên min hene, da ku em ji navê heyvên hev û din bigihin.

Ji ber ku, ev temeneki ye, ku ez salname û kovarên kurdî dixwênim û herwîha kom ji dikim. Tiştê ku bala min di nav niviskarên Kurd de kişand, bikaranîna "Heyvên Kurdî" ye.

Mirov tucaran li qayî du kovarên kurdî an jî du salnameyên kurdî naye, ku ew heyvan weke hev bikarbînin. Helbet ev yek ji aliyeki ve dewlemendiya zimanê me ye, lê gava em zarokên xwe li vir an dera han bi jurdî perwerde bikin, wan hînî kurdî bikin, salnamene navnetewî biweşênin, dê emê kîjan navên heyvan bikarbînin?

Lê li gorî vê lêkolînê ezê karê we hebeki hêsanî bikim.

Min li jor ji gotibû, ku ez vê rewşa me di warê bikaranîna heyvan de netenê dilşewat dibînim, herwisa ez vêna weke dewlemendiyeke ziman, wêje û çanda kurdî jî dibînim.

Tabeleya heyvan

1	2	3	4
Çile	Rêbendan	Kanûna Paşîn	Çileyê Paşîn
Sibat	Reşemî	Sibat	Sibat
Adar	Adar	Adar	Adar
Nîsan	Avrêl	Nîsan	Nîsan
Gulan	Gulan	Gulan	Gulan
Hezîran	Puşber	Hezîran	Hezîran
Tîrmeh	Tîrmeh	Tîrmeh	Tîrmeh
Tebax	Gelawêj	Tebax	Tebax
Êlûn	Rezbar	Îlon	Îlon
Cotmeh	Kewçêr	Çiriya Pêşîn	Çiriya Pêşîn
Mijdar	Sermawez	Çiriya Paşîn	Çiriya Paşîn
Kanûn	Berfanbar	Kanûna Pêşîn	Çileyê Pêşîn

SÎNEMA

Li ser riya Oskarê

Behman Qobadî li Tokyo du xelatên din standin

Wêne: Avestakurd.net Behman Qobadî



PK/ AVESTA - Derhênerê Kurd Behman Qobadî li paytextê Japonya li Tokyo bi filmê xweyê bi navê "Kusî jî Difirin" beşdarî Festîvala Navnetewî ya Filman bû. Di vê festîvalê de Qobadî du xelat standin, tevî van herdu xelatan, di van heft mehên dawiyê de hejmara xelatên Qobadî digihên 16an. Li Tokyo, Qobadî "Xelata Jûriya mezin" û "Xelata Temaşevanan" qezenc kir. Wek tê zanîn Festîvala Tokyo, weke festîvala Asya ya herî mezin tê naskirin.



Dîmenek ji filmê Peter Pan yê bi navê "Finding Neverland"ji aliyê Yekitiya rexnegirên netewî ya Amerika, li Amerîka çêtirîn film hat hilbijartin

Li Amerîka çêtirîn film hat hilbijartin

Di demek ku dayina xelata Oskar nêzik dibe de filmê Peter Pan yê bi navê "Finding Neverland"ji aliyê Yekitiya rexnegirên netewî ya Amerika, li Amerîka çêtirîn film hat hilbijartin. Film behsa afirandinê dike û di film de rola sereke Jonny Depp dilîze.

Bi vê serkeftina xwe "Finding Neverland" çêtirîn 10 filmên vê salê li dû xwe hişt û dereceya yekemîn stend.

Di vî filmê drama de li gel Depp, Kate Winslet, Dustin Hoffman û Julie Christie dilîzin.

Yekitiya rexnegiran Jamie Foxx ku di filmê "Ray" de rola Ray Charles pêk tîne, çêtirîn artistê mêr û Annette Bening jî ku di filmê "Being Julia" de komedyenekê dilîze, çêtirîn artîsta jin hêjayi xelatên çêtirîn artîst dît.

Xelatên Yekitiyê ku wek îşareta Oscar tê hesab kirin wê di 11ê Çileya Paşîn de bigihêjin xwediyên xwe.

Klamên Çolemêrgê

Ji Koma muzîkê Kardeş Türküler (Klamên Bira) xebatêk hêja „Eyhok“ Muzîka Gelêrî ya Hekariye



Kardeş Türküler

PK - Demêk berê li Tirkîyê koma muzîk Klamên bira bi navê „Eyhok“ muzîka Gelerî ya Hekarîyê Çend CD derxistin. Li ser CD`yan di derheqa pêkanîna vê xebatê da nivîsarêk ji heye. Di vê Niviskarê da li ser berhevkirina klaman, di studyoyê da xwendina klaman û çekirina CD an agahadrî heye.

Ciwanên Hekareyî Bülent Çetin û Serdar Özdinç di sala 1998 an da dest bi berhevkirina klaman kirîye. Piştra ji koma muzik Kardeş Türküler Vedat Yildirim û niviskar Muhsîn Kizilkaya ji tev li xebatê bûye. Ewana berê li navenda bajar dest bi berhevkirina klaman kirîye piştra ji gundên Hekarîyê, li Navçeyên Hekarîye û Stenbolê dengbejên Gelerî guhdarî kirîye û dengê wan girtîye qasêtan. Xercî vê ji hin kesan arşîvên xwe yên şexsî pêşkeşê wan kiriye.

Piranîyê klaman ji dengbêjên ewîretên Pînyanîş,Ertuşî û Goyî hatine girtin. Ew xebat ji 82 klaman pêk tê. Bi vê xebatê dîroka muzîka Gelerî ya hekarîyê ji salên 1850 virva tê kolandin û ji bo guhdaran tê peşkeşkirin. Di CD da 3 klamên Suryanî ji hene. Ew 3 klam ahenga muzik ku di sala 1972-73 an da li Lubnanê pêkhatîye da hozanêk Keldanî yê hekarîyî xwendiyê. Dîsa di CD an da 2 klamên Dengbêjê Cizirî Fadil ji hene. Di nav klaman da 4 medîha (Kasîde),klamên govendê, îlahî û destanên gelerî hene. Destana dîrokî „Dimdim“ ji di wan CD û qasêtan da heye. Ew klam him wek CD, him jî wek Qasêt hatine qeyd kirin û di bazarê da tên firotin.

Bi derxistina albuma „Eyhok“ li ser muzîka gelerî ya Hekarîyê pirtukêk biçuk ji hatîye weşandin. Di vê pirtukê da li ser dîroka heremê, reşwa sosyolîj ya eşîretan, rewşa etnikî, dînî ya heremê û muzîka gelerî lêkolînên balkeş hene. Di pirtûkê da bi Kurdî,Tirkî û Ingilizî nivisar hene.

Ew klam bi gîştî ji şsa Karataş,Muhsin Kızılkaya, Serdar Özdinç, Bülent Çetin, Dilşah Özdinç, Seyda Goyan,Aytekin Ataş, Yakup Bilge, Vedat Yıldırım hatine berhevkirin û ji alîyê koma „Kardeş Turkuler“ tên xwendin.

Koma muzîk „Kardeş Türküler“ ji xwendewanên Zaningeha Bozaşiçi pêkhatîye, ewana di projeya BGST dest bi xebata muzîkê kiriye û cara yekemîn bi navê „Kardeş Türküler“ kasetêk derxist. Edî vê şunva bi nave koma „kardeş Türküler „ xebata xwe didomînîn. Koma Kardeş Türküler heta niha bi navê „Kardeş Türküler“, „Doşu“,“Hemawaz“ û „Eyhok“ Qasêt û CD derxistine. Di wan Albuma da bi Tirkî, Kurdî, Aramî (Ermeince) û Rumî,klam hene. Dîsa ewana ji bo qasêta hozanê Kurd şivan Perwer „Roj û Heyv“ û ji bi Filma Vizontele û Vizontele Tuuba ji muzîk çekirîye.

Li Hewlêrê festîwala strana Kurdî

Hewlêr - Roja sêşembê 14/12/2004, bi beşdariya tîpên hunerî yên her çar parçên Kurdistanê, mezintirîn fistewala hunerî ji bo mûzîk û strana Kurdî li bin navê "Festîwala Kurdistan ji bo mûzîk û strana Kurdî" li hola Mîdya li Hewlêra paytext bi rêve çû.

Roja yekem a festîwalê, Nêçîrvan Barzanî serokê Hikumeta Kurdistanê, peyvek pêşkêşkir û têde rola hunera Kurdî bi başî helsengand. Paşê peyva wezareta Çandî ya Hikumeta Kurdistanê hat xwendin û li dawiyê ji hunermend û nivîskarê Kurd "Kereme Seyad" berpirsê beşa Kurdî li radyoya Yerîvanê kurte peyvek pêşkêşkir. Tê de bi navê tevaya hunermendên beşdar, ji bo giringîdayina hunera Kurdî spasiya hikumeta Kurdistanê kir. Helbet ev festîwal ji aliyê wezareta Çandî ya hikumeta Kurdistanê ve hat birêvebirin û çar rojan ajot.

Hêjayî gotinêye ku ji bo yekemîn car jimareyek mezin a tîpên hunerî û ji her çar parçên Kurdistanê beşdarî festîwalek weha dibin. Ji wan tîpên beşdar hinek jê ev in. Tîpa hunerî ya Kamkaran, Endelîbî, şemis "ji rojhelata Kurdistanê", çend tîpên bakûr û rojavayê Kurdistanê, tîpek Kurdî ya Asiya naverast û di gel çend tîpekên hunerî yên başûrê Kurdistanê.

Festîwal di 17/12/2004an de bi dawî tê.

Hejmara 11an ya Tîroj derket

Di hejmara xwe ya 11an de kovara Tîroj mijara sinemaya Kurd kiriye rojeva xwe û rûpelên xwe bi nivîsarên derhêner û lîstikvanên ji her çar perçeyên Kurdistanê xemilandiye. Tîroj rewş û astengiyên sînemaya Kurd radixe ber çavên xwendevanên xwe.

Em.. Zarokêt me û kultorê me li derveyî welat

Dewlet Elî

Her milleteki li ser ruyê e'rdî rewişt û tîtalêt xwe yên taybet hene, ewin nîşana wî û bi wan ji miletêt dî tête cudakirin. Em jî wek millet, xwedî rewist û tîtal û kultûrek buhagranîn. Pêdvîye em dihişyar û rijd bîn li ser hindê ku nifş bo nifşî biparêzîn û nehêlîn dinav gêleşoka jiyanê da winda bibît. Niha pirs ewe ka dê em noka şawa û bi şi reng vî tiştî dî zarokêt xwe da şînîn, da ku bihête paraztin. Ev parastine heta radekî ya bisanahî bû, heta ku gerr gehiştî nifşê me, şi bi razîbûn ba, şi jî bi zorlêkirin ba. Her şawabâ divîya zarok li ser hatîba taşandin û gelek cara, xeletîyêt mezin rwîdidan ji ber zordariyê û pir givaştinê û verêja vê şendê dibû, kesatîyeka complex û pir aluzî û êş û jan û nesaxî. Ji ber ku bi hinek rêka di hatine taşandin, bo diyarkirna van rêka, me ev herdû nimonêt xarê wergirtin:

1. Kurê min/ kişa min gelek yê/ ya aqile, guhdare, zîreke, serê xwe ji ber mezina na hilînît, di ber mezna ra na axvît, mîha xudêye û,...htd. Heta ku hêdî hêdî û di nefsa xwe da di bû mîha xudê û bi wî qalibî derdikevt ewê dayk û baba divya, ev zarokê bi vî rengê dihate taşandin, dema mezin di bû jî her di ma ser wî destudarî, ne caba kesê dida, ne berevanyî ji xwe dikir, bila şend hatiba xapandin, an şend heqê wî hatiba xwarin û hosa di bû xudan kesatiyeka neliv, guhdar, bixweşerm, şkestî, bindest. dibît yê serkeftî bît di karê xwe da û gehiştbîte peyskêt bilind, lê her yê Mînakî (mîsalî) boye û her kesekî bi wî şavî berê xwe didayê.

2. Tu mirovekê pwîşî, bikêrnahêy, te şi rê bo xwe negirtîne û nabiye şo, tu kişeka bê me'zî, behîma xudê yî, şi vi guhêt teda naşît.û ..htd ji van sîfetêt ne ciwan yêt ku nefs pê tête koştin û herişandin. Gotina van peyva bisanahîye û dibît dilê hinek dayk û baba hwîn diket, lê pa heger em hizra xwe têda bikeyn, jinwîka dê zanîn ka karê wan li ser zarokî wek kesekş nazik şende, û şend ji dil û giyanê wî dişirmisînît, belê pa em evê nizanîn û me hizra xwe têda nekirye ku ev peyve roj bi roj cihê xwe di mejyê zarokî da diken, êdî bawerî bi xwe namînît, ne di karî da, ne jî di helbijartina hevala da, ne jî dikarît têkelyê digel zaroka da biket, ji ber ku hestek bi kêmatiyê li cem peydabûye û li vêrê, an dê kasatiyeka hejhejok û lawaz, tirsonek, veder ji civaka zaroka, hebît û eve dê problêma bo peydaket di jiyana wî ya paşerojê da. Li vêrê her tistê dayk û bab û civak dibêjîtê dê li cem kopi bît, belê pa her di wî demî da, ew jî dê bîte kopiyek ji bab û bapîra, bêy ku kasatyeka taybet hebît. An jî dê yê serkeftî bît di karê xweda, neguhdar, xudan kesatyeka mukum û zordar,her karekê pê radbît ne xeme bo wî, ji ber ku ev nave yê hatye ser û cihê gengeşê li cem kesê nedîtye ku bo bizanît ka li ser şi bingeh bi vî şavî lê dinêrin,şi harîkarî ji layê kesê ve nedîtye ku xeletyêt wî bihêne dirustkirin, belkî her dem yê qutay û vequtay bûye, sera her xeletyekê û êdî dema ketba tengavyekê, ji tirsê neşiyaye hewara xwe bigehînîte kesekî, di rewşeka hosa da dibît ew dê pê li hemî kultor û e'deta ket û li vêrê bila em gunehê ne êxîne stuhê zarokekî dema digehîte paşerojeka reş, li demê ku em dişyayn bikeyne kesekê dî, eger em pîşek ji peyîskêt xwe yêt bilind xarkeftbayn û hatbayne rêza wî.Û li vêrê divêt em bîra xwe ji gotina mezina bînîn ((şi dişînî wî dihelînî)).

Her şende gelek ji me xwe bi zana û rewşenbîr dizanin, lê pa heta noke em bi ziman û selîqa bab û kalên xwe diaxivîn û qewana wan vedgêrîn.Kî ji me rojekê ji roja rwînştîye dîwana zarokêt xwe û pîşek ji wextê xwe yê bihagiran dayê.? Kê ji me ji xwe girtîye wek heval dan û standinê di gel zarokêt xwe biket û êmnahyekê bo peydaket da ku dema tengavyê bê tirs qest biket me û dilê xwe bo me veket?. Ez nabêjim divêt em zarokêt xwe berdeyn û dest ji kultor û e'detêt xwe bişûyn, nexêr, em civakekîn xudan xizîneka bihagiran ji kultorekê ciwan. Heger me tirsek li set kultorê xwe hebît û me bivêt biparêzîn, berî her tiştekî divêt em bizanîn ku hêre civakeke, e'rd û e'smana ji civaka me cudaye, zarokê me evro yê di vê civakê da dijît, nabêjim baştire, ji ber ku gelek tişt têda hene di gel me û civaka me nagoncin, her wesa nabêjim xirabe, ji ber gelek tişêt baş têda hene. Bo me nabît em hukmî danîn. Berî her tiştî divêt em tirazyê dirust bikeyn ka şi beranberî şi têt, da ku heqê kesê nehête xarin. Li vêrê divêt em xwe û dewrê xwe (zemanê em têda jiyayn) danîne rexekê tirazyê û li rexê dî kolturê wî dewrî, paşî traziyê vala keyn û van zaroka û vî dewrî danîn beranber her wan tîtal û rewişt û ,edeta. Belê li dewrekê dî, ne cih, ne zeman, wek hev. Bê goman cudahî dê ya mezin bît û divêt em bi şehrezayî tirazyê dirust bikeyn, ku ne kultorê me yê bihagiran ji destê me bişît, ne jî zarukêt me û li vêrê xusaretî hizar carkîye. Ev dirustkirne dibît bi dev ya bisanahî bît, belê pa praktîka,wê ya bi zehmete, ji ber ku zarok li vêrê ne wek yê welatî ye. her şende li vêrê û li welatî jî sê cihêt cuda kartêkirna xwe li ser jiyan û kesatiya wî diken ew ji:

1. Mal 2. Xandingeh 3. Civak

Lê li welatî, hersê wek hevin, şi cudahya wesa di navbera wan da nîne, ji hemî yê bi êk reng û terz û ta rabûyn û hatîne taşandin, hosa zarok dibîte kopieyek ji dayk û baba û civakê.

Li Europa mal kurd her ewe ewa li welatî, lê xandingeh û civak 100% cudaye. Li vêre zarokî perwerde diken ser:

1. Serbixoya kasatiyê û hizr û bîra
2. Baweryê bi xwe
3. Guhdarya kure û bindestyê qebûl naken
4. Gengeşê û lidwîfşûnê, zanîna tişta li ser bingehê têgehiştinê.

Zarok şehrezane, divêt em di hişyarbîn di bersiv û rabûn û rwînstinêt xwe da, bersivêt nîv nîve wan razî naken, gelek cara û ji ber ku tiştê em bo wan dibêjin gelek yê dwîre ji wê ewê em dikeyn, bixwe bi aqilê me dikenin, em dişêyn bêjin li dwîf aqilê me dişin, lê pa neşên şi bêjin, hinek caran jî dibêjin û eve cihê tirsê ye, ji ber ku bi şavekê dî li me dinêrin. Deyk û bab senbolekê mezine, wek şiyaye bo wî, bingehê avakirna kesatîya wî ye. Di vêt em wan sembol û nimonên wî bo xwe avakirîn ne herêfîn.

Kirmanckî (Zazakî) Gramer

Seyîdxan Kurij

Amnan ke vîyert weşanxaneyî „*DENG*“ ra yewna kîtabî nuştoxî Kurd Munzur Çem vecîya.

Namê no kîtabî „*Türkçe Açıklamalı Kırmançca (Zazaca) Gramer*“ o. Kîtab 360 ripel o û A ra heta Z heme persî gramerî îta de ameyî îzah kerdiş.

Munzur Çem vate o verîn ey kîtab de mehna û muhîmê ziwan ser vindeno û behsê polîtîkaya asîmîle kerdişî Kurdan ê Dewleta Tirk keno. Munzur Çem no derheq de bi kilmkî vînayê xo îna ano ziwan: "Kurdî Vakurê Kurdîstan 80 serra ke bin polîtîkaya asîmîlasyon de ciwiyenî. Ma eşkenî vaci ke no zeman de ço cayî dinya de îna yew polîtîkaya wişk û sîstematîk verba ço gel de nîna karardiş. Ewro zaf persî û zehmetî ziwanî ma estî. Hema hema ziwanî ma ho bin talukê vînbîyayiş di o. La ganî ma bêhevî me bi. Kurdî yew şaro zaf kahan ê, ziwan ma zi zaf kahan û bingehîn o. Xo ra îna nêbînî, heta nika ziwanî ma nêciwiyayn."

Munzur Çem xebatê xo de fekî Dersîm. Erzingan û Gimgim esas giroto. La o têna giredayî nê fekî nêmendo. Ey hetî gramer û raştnuştiş de xebatê koma "*VATE*" esas girota. Koma "*VATE*" 1996 ra nat her ser bi peryodîk yena piyeser û raştnuştiş û gramerî Kirmanckî (Kirdkî) ser xebitîyena. Koma "*VATE*" de hema hema piyerî fekî Kirdkî yenî temsîl kerdiş. Munzur Çem zi ho miyanî koma "VATE" di o û o heta nika tor piyerê kombîyayişanî koma "*VATE*" bîyo. Koma "*VATE*" heta nika 12 kombîyayişî viraştî.



Munzur Çem 1975-76 ra nat Kirdkî nûseno, o ê nuştoxan ra yewo ke hêverî Kirdkî nuşto.

Munzur Çem heta nika zaf maqale, roman û hîkayê nuştî. Ey mîyanê şar ra sonik û dêrî dayî arîye û nuştî. Ey raştnuştiş û gramerî kirmanckî cîya cîya zaf kovaran de maqalê nuştî. La sey kîtap gramer ser no kitabî Munzur Çem o verin o.

M.Çem heta nika bi Kirdkî nê kîtabî nuştî:

1 – ***Hotay Serra Usivê Qurzkizî***
2 – ***Tayê kilamê Dêrsimî***
3 – ***Ferheng Kirmanckî/Zazakî – Tirkî***
4 – ***Kulê 38î, roportajî***
5 – ***Luye ve Biza Kole ra***
6 - ***Türkçe Açıklamalı Kırmancca (Zazaca) Gramer***

Fîlmê „ Verba Dêsî“ bî fîlma yewin ê Ewropa



Roja şemi ke vîyert ser bajarî Îpanya Barselona de Akademî Sînema ê Ewropa yew galayî fîlman viraşt. Îta de fîlmê Fatîh Akin bi nameyî „„ Verba Dêsî“ dereca yewin girot.

Na film de serkaykerdoxî Sibel Kekillî û Bîrol Ünelî yê. Fîlmê „„ Verba Dêsî“ de xortî xerîbî ke Almanya de ciwîyenî, persanî înan ser yeno vindertiş.

Na film cuwa ver zi çend xelat girotibî.

Emir kiştişî Ugur Walî da

Qoser- Semedî wertevetiş biyarê kiştişî Ugru û pî ey Ahmet Kaymaza hefteku vîyert komîsyon heqî merdiman ê TBMM ra mebusî AKP Nezîr Nasiroglu û mebusî CHP Hüseyîn Güler şî Qoser. Pa nê wird mebusana AKP ra mebusî Merdîn Selahattin Dag Qeymaqamî Qoser û şarî Qosera na bîyaye ser qisêkerd.

Goreyî raporî no komîsyon qeymaqamî qoser Engin Durmaz va;"yew alaqay mi no bîyayeya çino, walî emir da polesan, emir walî ser polesan operasyon viraşt." La hunc zi hukmat qeymaqam wazîfe ra girot, şawit Erzurum. Şarî Qoser wazeno ke walî Merdîn wazîfe ra bigîryo.

Ugur Kaymaz û pî ey Ahmet Kaymaz 21 aşmê kamune de Qoser de bileheq bi destî polesan ame bî kiştiş.

LORIN XUNIM



Yew ûmbazî mi est, ez rey-rey şina keye ey. Ma nişenî rue, xeber dûnî.

Keye ey de yew mirçikê ey esta, zaf rinda, Yew mirçika çeqer a.

Nameyî aye Lorîn hanim a.

Yew roj mi ûmbazî xo ra va:

Na Lorîn hanim tena nêbena, bîye ma aye bizewicn

Ûmbazî mi wîya, va:

Niye!

Ciniyê ûmbazî mi va;

Wilay ez her roj ha vûna; „ bê ma Lorîn Hanim bizewicn,la o qowil nikeno“.

Di aşmî çuwa pey yew roj ez şîya keyeyî ûmbazî xo. Mi dî ke Lorîn hanim zerê qefes xo de panc heb hak kerdî.

Mi ûmbazi xo ra va:

Na mirçik tenabû, mirçiko nêr aye wer de nêbî, ne hak şinî kerdî?

Ûmbazî mi cuwîya mi ra ,la mi re qal nêkerd.

Cinî ey cuwîya mi ra wîyayî û va:

Wilay mi Lorîn hanim û miyerde xo di, hîrye derîn yew vade de di.

Amed de derheqî YE de kombîyayiş

Roşnvîr ke îta de hedre bî o qide pîyekerd ke persê Kurd esas xo de mîlî ya û ganî goreyî no perspektîf biyero minaqaşa kerdiş.

Amed - Rexistinê bajarî Amed ey HAK-PAR 5î aşmê kanûne de bî nameyî „ Suxberî bi Yewbîyayê Ewropa ya mizakeryan de persê Kurd“ yew kombîyayiş viraşt. No kombîyayiş Hotelê Prestîj de virazîya û pa Ameda Merdîn, Batman, Sert, Wan, Xarpîyet, Riha û Mersîn re hendê 250 kes amê kombîyayiş.

No kombîyayiş bi qisêkerdiş serekî partî ê bajarî Amed Halis Nezan dest pê kerd. Cuwa pey A.Melîk Firat qisêkerd.

Kombîyayiş yew roj rumit û kesî ke amebî kombiyayiş YE û persa Kurd ser vînayê xo ardî ziwan.

No kombîyayiş de ganî no pêvajo de Kurd sinî yew polîtîka bikirî, ser amê mişevirye kerdiş.

Roşnvîr ke îta de hedre bî o qide pîyekerd ke persê Kurd esas xo de mîlî ya û ganî goreyî no perspektîf biyero minaqaşa kerdiş. Kurd ganî pevajoyî YE de xo sey yew per nîşan bidî.

No kombîyayiş yew roj rumit û serkote bi.

Hak-Par: No Beyanname de waştişî demokratîk estî

Wekil sereki HAK-PAR Fehmî Demîr ya ke îlan ke rojnameyanî Ewropa de vêciyawo, waştişanî demokratîk yê Kurdan ano ziwan.

Fehmî Demir 13î na aşm de navendî Partî de semedî çapameniya yew kombîyayiş viraşt. Demir îta de her perî cemaat verî 17 Kanûne waşteyanî xo ûno ziman va û no derheq de vînayê xo îna ard ziwan: „ No wext de Kurd zi wazenî waşteyanî xo biyarî ziwan û vengî xo biresnî rayaperoyî ya Tirkîye û dinya. No îlan de waştişî demokratîk û tam wext de amê ziwan. Serekwezîr fîgan keno ke qey Kurd no wext de waşteyanî xo îna ûnî ziwan. Heqî serekwezîr çino ke çiko înayin vaco. Çimkî serekwezîr nêfteno qalê Kurdan bikiro. Ganî serekwezîr bizano ke bi inkarkerdiş şarî Kurd na pers halnêbena."

Yew heyetî Kurdanî Surî Îsvîçre de UNO zîyaret kerd



Cenevre- Roja10î na aşm roja heqî merdiman de yew komîsyonî Kurdanî rojawan Îsvîçre de mesulî heqî merdiman ê UNO zîyaret kerd.

No komîsyon endamî komîtêyî azadî û heqî merdiman ê Surî, Partiya Yekîtî ya Demokrata Kurd li Sûriyayê-Yekîtî, Partiya Pêşverû ya demokrata Kurd li Sûriyayê û Partiya Çep a Kurdî li Sûriyayê amebi meydan.

No komîsyon hal Kurdanî Surî, bi hususî persanî Kurdanî bê nufus, zulm û ziwar ke dewleta surî kena Kurdan, peroyî bin paygirotiş heqî merdiman ser yew rapor da mesulî UNO.

Mesulî Cenevre ê UNO no namê înan ra girot û soz da ke no nameyî bido sekreterî UNO Kofî Anan.

Dewleta Îran ziwar û zulm xo Kurdan ser kerd zixm

Îran de Kurdan ser ziwar, zulm û tehdît her roja ke şina beno zaf. Hezî dewleta Îran wazenî ke dewijî çekanî dewlet bigirî û qoricîtîye bikirî. No rid ra zi dewijanî dewê Koto tehdît kenî. Koto yew dewê Xoy ya.

Leşkerîye Îran derûdormeyî dewanî Kurdan ê Urmiye de zaf ray operasyonan kena.

Xalê Mehmed (2)

Orhan Zuexpayij



1980 ra verî çayxaneyî Xalê Mehmedî sey yew mekteb bi. Xarpîyet de faşist tam hakîm bî. Xarpîyet kozmopolît yew bajar bi. Te de Tirkî, Kurdî, mihacîrî Tirkan û zaf kêm zi Arminî bî. La Arminî verî 1980 hema-hema qedyayib. Kurdan ra şarî Keban, Agin û Baskîl zaf asimîle bi bî, înan xo Tirk hesibnayn. Miyanî şarî Dersim û Pali de zi zaf kêm alaqa bî. Sey coxrafîk zi Dersimijî per serî qanal ca bibî, paloyij û Çewlîgij zi perî cîyer de ca bibî. Tesîrî meselay mezhebî ra zi Kurdî sunî bin tesirî sîyasetî raştgir, qizilbaşî zi bin tesirî sîyasetî çepgir de mendib. Partîyani raştgiran ferqî mezhebî karardîyan û xo mîyan sunîyan de organîze kerdîyen. Çepî Tirkan zi têna mîyan Kurdanî qizilbaşan de xebat kerdîyen. Xarpîyet bibi di parçe, binî qanal û serî qanal. No rid ra zi çi gune ke zaf xortanî Paloyijan mîyan MHP de ca girot û bî destê kard. No şartan de hetî cîyerî ser cawo ke welatheskerdox biye ters eşkayn ruenişî têna çayxaneyî Xalê Mehmed bi. Çi gune ke miyanî şarî Pali de zaf kêm şoreşger bî. Têna yew çend sempatîzanî TKDP-KUK bî ke ê zi çayxaneyî Xalê Mehmed de nîştinî rue. Heta no rid re Xarpîyet de yew mude ambazanî TKDP re "Pasajcilar" vacîyayn.

Faşîstan û terefdaranî partîyanî şovenîstanî Tirkan çayxaneyî Xalê Mehmedî sey yew cayî kominîstan – Kurt çîyan nîşandayn. Ziwarî faşistan şînî ke binî qanal de, mînyanî bajar de Kurtçî akerde waharî yew cayo înayin ê. Darbeyî 1980 pey zafî şoreşgerî mecbur mendî Xarpîyet terk kerd, la hûnc zi ê ke mendî çayxaneyî Xalê Mehmed de nîştinî rue. Xalê Mehmed yew roj ma re qal kerd va ; " verî 1980 ame mi gueş ke faşîstan plan kerda ke biyerî berzî çayxane ser û ma bidî gulan fek. Nay ser mi dawunçeyî xo girot, yew çend roj mi heta serî sibay nobet pawit, la ço nêame."

Roşnvirî Kurdan, malayî welatheskerdoxî, xortanî ke zaningehan de wendîyen, dewijî Palî û çend hemalî Dersimijî amenî çayxaneyî Xalê Mehmed de nîştinî rue û sohbet kerdîyen. O wext xortanî ma kurdan, sîyasetî Kurdan piyerin veri xo dabi Lenin, Marks û Mao. Înan wext ke qisay bikerdîyen vateyî nê însana ardîyen ziwan. Nameyî kitabanî înan heta humarî ripelan amebî ezber kerdiş. Sey mîsal înan vatîyen; " Lenîn filan kitabî xo de, filan ripel de îna vûno"

Xalê Mehmed zi hers bîn, ey înad înan re vatîyen; "Efendî derheqî na mesela de îna vatîyen, çiko şima vûnî raşt nîyo." Goreyî Xalê Mehmed roşnvîr têna şex Mehdî bi.

T-KDP ra bîgir çiqa siyasetî Kurdan ke est Xalê Mehmed dest esto piyerin. Xalê Mehmed qezenc xo zede ra na mesela ser herc kerdîyen. La belê 1990 pêy çayxane ey qefelna. Cey çayxanî de yew pasajo gird virazîya. Xal Mehmed bê çayxane û betal mend. Lacî Xalê Mehmed a ser Enqere de doktorê qezenc kerdib. O nişka lacî xo bido wendiş. Wext ke hal û wazîyet ey ca de bi, dostî ey zaf bî. Wexto teng de çew Xalê Mehmed het de nêeysa. Xalê Mehmed îtiya de qehr beno ûncîyeno kê xo. Lacî Xalê Mehmed zaf zehmet ûnt, la cuwa pey ûmbazî Ewropa pê hesîyayî. Çend dostanî xalê Mehmed ê Ewropa xo binate de qerar girot ke lacî Xalê Mehmed bidî wendiş. Înan ci re yew mude perê şawitî, la lacî Xalê Mehmedî nêweş kot, o mecbur mend mekteb caverda.

Kurdanî Meletî ra merdemo şit helal beno mudurî YSE ye Xarpîyet. O wazeno Xalê Mehmedî vîno. O şino pasajî Alî kent ke çayxaneyî Xalê Mehmedî cey xo di nîyo, Cayî çayxaneyî de yew pasajo gird virazîyawo. O Xalê Mehmedî perseno. Tayê merdem ci re hehsê halî Xalê Mehmed kenî. O zaf qehrîyeno, wazeno Xalê Mehmedî vîno û adresa xo dûno nê merdiman.

Roja bîn Xalê Mehmed dûno ra şino daîreyî YSE, uca de ey merdim het. O varare şino Xalê Mehmed ra, lew nûno destanî Xalê Mehmed a û hal - hatir ey pers keno. Xalê Mehmed her çî xo ti ra vûno. Nê ser no merdim Xalê Mehmedî daîreyi YSE de geno gure. Xalê Mehmed 5 serî no daîre de xebitîyeno û bade teqawit beno.

Lacî Xalê Mehmed zi beno weş, newe ra Xarpîyet de kueno îmtîhan û zaningehî Firat de Muhendîseyî elektrîk qezenc keno. Ey mektebî xo qedna nika yew daîre de Muhendîse keno.

Not: Qisimo verîn ê no nuşteyî humarê 14. ê rojnamê de vêcîya.

Leya Zana û ambazî aye Qalê xo ser nêvindertî

Nê ser Leyla Zana, Hatîp Dîcle,Orhan Doşan û Selîm sadak tepîya gam eşt. Nê çar kesan pîya eşkira kerd ke ê no beyanname qebul nêkenî. Înan va ke mumkuno ke taye Kurdî otonomî nûn zi federasyon biwazî, la ma otonomî û federasyon goreyî şartanî dinya raşt nêvînenî. Ma wazenî YE Tirkiye îna bigiro zerrê xo.



Verî ke Yewbîyayê Ewropa(YE) semedî mizakereyana wext bido Tirkîya, bi însîyatîfî Enstîtu Kurd yê Parîs bi nameyî „ Turkîye de Kurd çi wazenî" yew beyanname rojnameyanî Ewropa de vêcîya. No beyanname Tirkîye û Ewropa ra hendê 200 Kurd îmza kerd û rojnameyenî „International Herald Tribune"," Le Monde" û „Frakfurter Algemeine Zeitung"(FAZ) de vêcîya.

No waştişname de Kurd bal ûncenî raporî Komîsyonî YE ke te de yeno ziwan ke Tirkiye de 15-20 mîlyon kurd ciwiyenî. Kurd YE wazenî ke persê Kurd sey Bask,Katalonya,Schotland û Volan biero çarelkerdiş. Tirkiye qibris de semedî Tirkana çi wazena ganî înan Tirkiye de bido Kurdan.

Leyla Zana û ambazanî xo zi no beyanname îmza kerdib. Se ke no beyanname rojnameyanî Ewropa de vêcîya, masmedya Tirkiya verba no beyanname kampanya kerd a. Nê ser Leyla Zana, Hatîp Dîcle,Orhan Doşan û Selîm sadak tepîya gam eşt. Nê çar kesan pîya eşkira kerd ke ê no beyanname qebul nêkenî. Înan va ke mumkuno ke taye Kurdî otonomî nûn zi federasyon biwazî, la ma otonomî û federasyon goreyî şartanî dinya raşt nêvînenî. Ma wazenî YE Tirkiye îna bigiro zerrê xo.

Generalanî Tirk, Kurd kiştî



Amed- Goreyî yew îdîaname ke nika dadgehê Amed de vêcîyawo werte, Generalanî Tirk pê destî cehşan (Îtîrafçîyanî) PKK, xêlyek Kurd dayî kiştiş û înan bi xo zi Kurd kiştî.

Goreyî no îdînameyî nê 15-20 serranî peyinan de xêlyek Kurd ameyî kiştiş, remnayiş, vînkerdiş û koçkarkerdiş.

No îdîaname de nameyî xêlyek generalan verîyeno ke înan mîyanî leşkerîye Tirkîya de bi îtîrafkaranî PKK ya bi namê JITEM yew rexistinê Teror naya rue.

Tayê dozger û Ewukat wazenî ke nê general bîyerî mehkima kerdiş.



Wêne: Nur Celalî

Kurdistana Bakûr de vor heyat kerd ziwar

Bi dest ci kedrişî zimistana zaf cayanî Kurdîstan de vor varena û puk û xedeb dest ci kerd

Kurdistana Bakûr - Bi dest ci kedrişî zimistana zaf cayanî Kurdîstan de vor varena û puk û xedeb dest ci kerd.

Puk û varayiş ver zaf cayan de xetî elektrîk birrîyayî, zaf navçe û dewan de ceryan çîno.

Çolemerg de rayîrî 40 dewan, navçeyanî wan de rayîrî 17 dewan gerîya.

Kurdîstana rojhelat de ji vor û puk ver bajaranî Mahabad, Serdeşt, Bokan, Pîranşar, Miyand û Aw de şîyayiş û ameyiş çîno û karî rojî zi nêbenî.

www.arsiv.org

دیدارێک لە گەڵ یاریزان و وێنەگری وەرزشی

فەرهاد عەبدوڵعەزیز کەرکوکی



فەرهاد عەبدوڵعەزیز کەرکوکی لە دایک بووی سالی ١٩٦٥ شاری هەولێرە. یاریزانی پێشووی یانەی وەرزشی سلێمانی لە سالی ١٩٨٠ تا ١٩٨٢ کارمەند و وێنەگر لە کەناڵی وەرزشی ئەڵمانی DSF بە مەبەستی تێشک خستە سەر شێوازو کاری رۆژنامەنووسی وەرزشی لە ئەڵمانیا. ئێستاریکمان لەگەڵ سازکرد.

پەیامی کورد: چەند ساڵە لە ئەڵمانیا دەژی و چیت خوێندووە؟

وەڵام: بیست ساڵە لە ئەڵمانیام و سێ ساڵ لە ئەکادیمیەی وێنەگرتن لە ئەڵمانیا خوێندومە.

پەیامی کورد: چەند ساڵە لەم دەزگایە کار دەکەی؟

وەڵام: هەشت ساڵە.

پەیامی کورد: ئەو زانیاریانەی وەرزشیانە کە بڕتان دێن چۆن؟

وەڵام: لە زۆربەی وڵاتانی ئەورووپا نوسینگەمان هەیە، کە لە دوو یان سێ کەس پێکهاتووە، رۆژانە هەواڵەکانی وەرزشی کۆدەکەنەوە و دەیی کەن بە ئەڵمانی و بۆمان رەوانە دەکەن بە دەنگ و رەنگ.

پەیامی کورد: تۆ بە تەنها کوردی لەم دەزگایە؟

وەڵام: بەڵێ من بە تەنها کوردم.

پەیامی کورد: هەوڵت داوە کێشەی وەرزشی و سیاسی کوردستان لە بەرچاوی و هاوکارانی خۆت بگەینی و لە سەر کارەکەت تاوەکو لە ڕێگای ئەو دەزگایە کەناڵی پەیوەندی دروست بکەی؟

وەڵام: بە ڕاستی زۆر هەوڵمداوە کەسم نە دۆزیەوە لە تەلەفزیۆنە کوردیەکانی کوردستان کەوا پەیوەندی پێ بکەم، زانیاریم کەم بوو.

پەیامی کورد: کارەکەی تۆ لە ناو ستودیویە یان لە دەرەوەیە؟

وەڵام: کاری من نیوەی لە دەرەوەیە و نیوەی لە ناو ستودیۆیە وەکو مۆنتاژکردنی ئەو شتانەی کە لە ئەورووپا و ئەمریکا بۆمان دێت، دەبێ من ئامادەی بکەم بۆ بڵاوکردنەوەی.

پەیامی کورد: ڕێژەی ئەو زانیاریانە چەندن، ڕۆژانە بڕتان دێت؟

وەڵام: ڕۆژانە ٢٥-٥٠ هەواڵ لە وڵاتانی ئەورووپا بۆمان دێ، هەروەها لە شارەکانی ئەڵمانیاش بۆ نموونە، لە شاری میونشن ڕۆژانە ١٠-١٥هەواڵی وەرزشیمان بۆ دێ.

پەیامی کورد: دیارە شاری خیونخ پایتەختی دەوڵەمەندترین هەرێمی ئەڵمانیایە لە ئابووری و هونەر و وەرزش، تۆ هەوڵت نەداوە لە ڕێگەی ئەو پەیوەندییانەی کە هەتە هەندێ دایە بە هێزی کارەکەم.

پەیامی کورد: پڕۆگرامەکانی وەرزش لە کەناڵی کوردستان چۆن دەبینی؟

وەڵام: لە ڕووی پێشکەشکردنی کاک جەلال پەریشان جوان پێشکەشی دەکات، بەڵام لە ڕووی تەکنیک هێشتا زۆری ماوە، سەرەڕای ئەوەش لە چاو کوردستان پێشکەوتووەو زۆریان بە دەست هێناوە، تەکنیک پێویستیان بە یارمەتی هەیە.

پەیامی کورد: ئایا وەرزش بە هەموو لایەنەکان سوودی لێ وەرگیراوە لە کوردستان؟

وەڵام: بەداخەوە نا زانم بۆچی یاریەکانی بەفرەخلیسکە، ئەسپ سواری، لە یاریەکانی تر هیچ بایەخیان کەمتر نییە لە ڕووی ناساندنی گەلان بە یەکتر کەچی لە کوردستان بایەخی پێ نادرێ.

پەیامی کورد: ئایا تۆ دەتوانی فێرکەری یاریەکانی لەسەرەوە باسمان کرد، بۆ کوردستان دابین بکەی ئەگەر ویستیان؟

وەڵام: بەدڵنیاییەوە، هەموو جۆرە یاریزانەکان، شێوە یاریەکان دەتوانم هاوکاریان بکەم خۆشحاڵیش دەبم.

پەیامی کورد: لە باکووری ئەڵمانیا کە سنووری سویسرا و نەمسا و فەرەنسایە، زۆر بە ناوبانگن لە جیهان لە بەفرەخلیسکە لە وەرزی زستان..

وەڵام: بەڵێ سوودێکی یەکجار بەناوبانگی ئەو وڵاتانە گەیاندووە، ساڵانە بە هەزارەها کەس ڕوویان تێدەکا بۆ گەشت و گوزار و زستانی، ئەسپ سواری بێ گومان کەش و هەوای کوردستان لەگەڵ ئەم ناوچەیە لە یەک نزیکە دەکرێ ئەو ئەزموونە ئەو سێ چار وڵاتە لە کوردستان لە ڕووی وەرزش سوودی لێ وەربگیری.

پەیامی کورد: دوا وتەت؟

وەڵام: سوپاسی پەیامی کورد دەکەم کە یەکەم دەزگای ڕاگەیاندنی کوردییە منیان بە سەرکردەوە، سەرەڕای تەمەنێکی کەمی ڕۆژنامەوانی بەڵام هەست دەکەم خەریکە ئیمەش وەکو گەلانی تری جیهان دەبین و ڕۆژنامە و ڕاگەیاندن ڕۆڵی بەرچاوی خۆی دەبینێ بۆ بەرەو پێشبردنی هەموو لایەنەکانی ژیان. بێگومان وەرزشیش بەشێکی گەورەی ژیانی مرۆڤی داگیرکردووە لە سەر گۆی زەوی.

پاشماوەی کورد لە دۆسێی.....

لەگەڵ ئەوەشدا دەکرێت بڵێین کە هەل و مەرجێک لەوانەیە دابەزین بە لیستی هاوپەیمانییەتی دیموکراتی نیشتمانی و عیلمانی بسەپێنێت و ئەم هێزانەش نوێنەرایەتی لە تووێژەکانی عێراق بەگروپە ئایینی و تایفەگەرایی و ڕەگەزییەوە دەکەن بەبێ جیاوازی، بە واتای، پێویستە هەڵبژێرین لە نێوان لیستێک یان لیستی عیلمانی کوردی عێراقی بەو پێیەی کە هەر یەک لەو دوو لیستە بۆ بارودۆخمان و یەکێتی نیشتمانی و داهاتوویگەلمان و جەختکردن لە سەر مافی چارەی خۆنووسین بۆ هاوبەشی بنچینەیی لە بنیاتنانی عێراقی نو عێراقی یەکێتی فیدرالی لە نێوان پێکهاتەکانی گەلی عێراق. (ڕۆڵی هاوبەشی کوردلە حکومەتی نیشتمانی عێراقی نوێ) کۆششی بەرپرسان بە ئاراستەی عێراقێکی فرەیی فیدرالی دروشمێکی سیاسی یان بەهایەکی ئایدیۆلۆجی نییە بەڵکو وەڵامدانەوەیەکی چاوەڕوانکراوە بۆ بنیاتنانی عێراقێکی نوێ داوا کارییەکانی هەموو ئەوانەی بڕیار دەدەن لە ژێر ئاڵاکەیدا بن، دەستبەردەکات، ئەوەشی تاکرێت بەب بەشداریکردنی لە سەر سەر ئاشتێک کە ڕێز دەگرێت لە هاوبەشی عەرەب و کورد لە نیشتمانی عێراقیدا. ئەو بەشداریکردنە لە سەر بنچینەی دانانی دەسەلاتی سیاسییە لە خزمەت هەموو چین و تووێژەکانی گەلانی عێراق، بە واتای ڕەخساندنی هەڵی بەشداریکردنی ڕاستەقینە نەک ڕەمزی یاخود لە سەر بنچینەی پۆستی فرەیی، بەڵکو ئەوەی کە لەسەر بنچینەی هاوبەشکردنی جدی و بەرپرسیار لە وەرگرتنی بڕیاری نیشتمانیدا. گرنگە کە پۆستی وەزارەتی کاروباری نەتەوەکان جێگیر بکرێت و ئەم پۆستەش لە وەزارەتە گرنگەکانی عێراقی نوێ دابنرێت. هەروەها گرنگە کە پەرلەمانی عێراق پێک بهێنرێت و پێکهاتەکەی لە سەر بوونی سێ بەش بێت کە بریتین لە: ئەنجومەنی نەتەوەکان و ئەنجومەنی نیشتمانی یەکگرتووی ڕاستەوخۆ و لەو دوو ئەنجومەنە پێک دێت، دەبێت ئەنجومەنی نەتەوەکان لە بنچینەدا لە هاوبەشی عەرەبی کوردی و هاوبەشی بەرپرسانە و کاریگەری هەموو تووێژەکانی دیکەی گەلانی عێراق. چونکە بابەتەکە پەیوەست نییە بە حکومەت و پۆستی وەزاری بەڵکو دەبێت جەخت لە سەر خاڵی هەرە گرنگتر بکرێت کە ئەویش دەسەلاتی یاسادانانە. پشتیوانیکردن لە میانەی عێراقیکی دیموکراتییەوە دەبێت بۆ چەسپاندنی ڕێبازی نەتەوەی کورد کە دەروانێتە داواڕۆژێکی پڕشنگدار، واتە بەشداریکردنی سیاسی لە عێراقیکی فیدرالی دەبێتە بنکەیەکی بەتین بۆ داواڕۆژێکی سەر بەخۆی کورد. (ئەی ئەگەر کورد بەشداری نەکرد لە هەڵبژاردن؟)

لە ڕاستیدا ئەم پەلە پەلە دەست نادات بۆ وەڵامدانەوەی پرسیاری هەستیاری وەک ئەمانەی لێرەدا خراونەتە ڕوو، بەڵام لە ئاراستەی بنیاتنان بۆ تەوەرەکانی تاووتوێکردن و دایالۆگ لە دۆزی کورد خیاروچارەسەرەکانی بەر دەست، دەکرێت بگووترێت کە گونجاو نییە بە تەواوەتی بزاڤ و پارتەکانی کورد خۆیان بپارێزن لە قۆستنەوەی ئەم هەلەمێژووییە بۆ دانانی دۆزی کورد لە سەر مێزی چارەسەرکردنی جدی بە تایبەتی ڕێگرتن لە کارەسات و ئەوتاوانانەی کە سەر دەمانێکی دوور و درێژ لە سەر حیسابی کورد بەردەوامبوون. هەڵەیەکی سیاسی گەورە دەبێت کە سەرکردایەتی کورد دۆزە ڕەواکەی دووربخاتەوە لە بەشداریکردن لە دەسەلات و لە بەرپوە بردنی حوکم و ئەوە مافێکە دەبێت پیادەبکرێت و لە بەر دەستدایە لە بارودۆخێکی ناسەقامگیری هەل و مەرجی عێراق. هەر بڕیە ناکرێت یاسادانان بۆ عێراقی داواڕۆژ داهاتووی کورد و بارودۆخیان لە عێراقی فیدرالیدا بە هەر دەستێک بسپێردرێت جگە لە کورد. دەبێط لە بنچینەدا نەخشەی بارودۆخی کورد لە دەستی نوێنەرانی کورد هەڵبژێردراوەوە دیاری بکرێت لە لایەکەوە، و ئەوانەی کە دەربڕی ئامانجەکانی کوردن بەوردەکارییەوە لەسەر ئاستی نیشتمانی لە لایەکی دیکەشەوە و لە سەر ئاستی ناوچەیی و نێو دەوڵەتی لە لایەکی دیکەوە. چونکە دووڕە پەڕێز لە بەرژەوەندی کوردا نییە و بەشداری نەکردنیش لەوانەیە خزمەتی شیواندنی هاوسەنگیە سیاسییەکان بکات بۆ ئەو پلەیەی کە دەسەلاتێک دێنێت دۆزەکە دەگەڕێنێتەوە بۆ چوارگۆشەیەک کە لە بەرژەوەندی هیچ تاکێکی کوردا نییە نەک کورد وەکو نەتەوەیەک. هەر بڕیە دەبینم پێویستە بەشداریبوونێکی جدی و ئەکتیڤی کورد و نوینەرەکانیان هەبێت لە دەنگدان لە هەڵبژاردنەکان نەک تەنها بۆ هێزو بزاڤە کوردییەکان بەڵکو بۆ هەموو هێزە سیاسییەکانی عێراق کە لە گەڵ پرۆژەی نەتەوەیی داهوتووی کوردا ڕێک دەکەون. ئێمە چاومان بیوەتە بەشداریکردنێکی کاریگەر و دڵسۆزانەو ئەمەش چاوەڕێی دەکەین و پێشبینش دەکەین کە هەنگاومان پێ دەنێن بەرەو بە یەک گەیشتنێکی مێژوویی نوێ لە نێوان هەموو پێکهاتەکانی عێراقی دیموکراتی فیدرالی نوێدا.

کەلوپەلەکانی هەفتە



کاور ٣.٢١ تا ٤.٢٠

دەست بەسەرەتایەکی نوێ دەکەیت لە بواری کارکەتدا، لەڕووی ژیانی کۆمەڵایەتییەوە، سەرنجی دەوروبەرەکەت ڕادەکێشیت.



گا ٤.٢١ تا ٥.٢٠

ئەو کارەی کە دەستت پێکردبوو، جاکتر وایە دەستی لێ هەڵبگریت، چونکە ئاکامی باشی بەدواوە نییە.



دوانە(جمک) ٥.٢١ تا ٦.٢١

پەلە نەکە لە بڕیاراندا بەسەر خۆشەویستەکەتدا و هەڵەکانی خۆتت لەیاد بێت. بایەخی زیاتر بدە بە خێزانەکەت.



قرژاڵ ٦.٢٢ تا ٧.٢٢

ئەوەندە ڕۆمانسی و خەیاڵپڵاو نەبە لە بیر و بۆچوونەکانتدا، چونکە هەر بەو هزیەوە تووشی نائومێدی دەبیت.



شێر ٧.٢٣ تا ٨.٢٢

دووڵ دەبیت لە پەسەندکردنی هەندێ پێشنیاری کارکردن کە لەوانەیە ڕەوتی ژیانت بگۆڕێت، بەئاگایە.



فەریک ٨.٢٣ تا ٩.٢٢

پێویستیت بە گۆڕانی بار و دۆخی خۆتت هەیە. چاکتر وایە گەشتێک یان سەردانی لایەک بکەیت.



تەرازو ٩.٢٣ تا ١٠.٢٢

هەواڵێکی زۆر خۆش بە ڕێگاوەیە بۆتۆ و ورەت بەرز دەکاتەوە.



دوو پشک ١٠.٢٣ تا ١١.٢١

نهێنی نەخشە و پلانەکانت بپارێزە، نەوەک هەندێک کەس پێش تۆ جێبەجێی بکەن.



کەوان ١١.٢٢ تا ١٢.٢١

ڕووداوەکان دڵسۆزی هاوڕێیەکی دێرینتان بۆ دەسەلمێنێت، بایەخی پتر بدە بە کارەکەت.



گیسک ١٢.٢٢ تا ١.١٩

دەبێت هەوڵ و کۆشش بکەیت بۆ دەستەبەرکردنی خەونەکانی، نەک جاوەڕوانی گەردوون بیت مشوورت بخوات.



سەتل ١.٢٠ تا ٢.١٨

لەم ماوەیەدا یەکجار چالاکی و کارەکانت زۆر بە ڕێک و پێکی ئەنجام دەدەیت.



نەهەنگ ٢.١٩ تا ٣.٢٠

ئەوەندە بیر لە بابەتی لاوەکی و بێ سوود نەکەرەوە و بیرێک لە خۆت بکەرەوە.

کورد لە دۆسێی هەڵبژاردنەکانی عێراقدا

ئامادەکردنی : ڤیۆس ڤایەق



دکتۆر تەیسیر ئەلئالوسی
(دکتۆرا لە ئەدەبی عەرەبی نوێ- پسپۆڕ لە بواری شانۆ) ئەکادیمی و رابەرکاری سیاسی، چالاک لە بواری مافی مرۆڤ

هەڵبژاردنەکانی عێراق ، لاپەڕەیەکی سیاسی نوێ و ئەزموونێکی تر لە خەباتی دانەبڕاوی کورد بۆ گەیشتن بە هیوا و ئامانجەکانی

هەڵبژاردنەکانی عێراق بەلیستێکی یەکگرتوو هۆکاری دابینکردنی عێراقی دواڕۆژە

لە یەکەم ساتی دارمانی رژێمی دیکتاتۆری، عێراق بە هەموو هێزە میللییەکانییەوە دەستی کرد بە هەوڵ و کۆششی جدی بۆ رزگاربوون لە هەموو ڕەفتار و سیاسیەتەکانی سەردەمی زۆرداری و چەوسانەوە و قەدەغەکردنی هاووڵاتی لە سوود وەرگرتن لە ئازادییە بنچینییەکانی، سەرباری کۆتایی هێنان بە حەشاردانی هەموو نەتەوەو گروپە ئایینی و تایفەگەراییەکان لە سنوقێک یان بەندیخانەیەک بە ناوی عێراقی زۆردار، عێراقی دیکتاتۆر کە بە فەرمانی ئەو کەسی مافی چارەی خۆ نووسینی نەبوو، چونکە جگە لە دەنگ و ڕەنگی خۆی چیدی نەبوو. لە دیارترین ئەو گرفتانە کە رژێمی زۆردار بۆ بارودۆخی ئێستای بەجێ هێشت، ئەو میراتگەرییە ڕەش و رسوایەتی لە چارەسەرکردنی دۆزی کوردا، چونکە گەلی کورد هیچی ئەو سەردەمەی لە یاد نییە جگە لە تاوانەکانی جینۆساید و هەموو ئەو هۆلۆکۆست و کاری تیرۆری خوێناوی کە رژێمی دیکتاتۆر دەرهەق گەلی کورد ئەنجامی دا. لە کاتێکدا ئەمڕۆ هێزە میللییە کاریگەرەکانی عێراق بە ئاراستەیەک دەڕۆن کە بەرجەستە دەبێت لە هاتن بە دەنگی پرۆسەی چارەسەری دیموکراتی بۆ عێراق، بە جۆرێک عێراق شیوازی فرەیی دەگرێتە بەر کە هەڵچنراوە لە سەر بنەمای دام و دەزگای دیموکراتی، هەروەها ڕەنگ دەداتەوە لە پرەنسیپی چارەسەری فیدرالی بۆ کوردستان کە بە ئیرادەی خۆی لەم قۆناغەدا یەکێتی فیدرالی لەگەڵ گەلانی دیکەی عێراقدا هەڵبژارد. لە راستیشدا هیچ چارەسەرێک نییە کە بە هێز و زۆرداری بە سەر گەلی کوردا بسەپێنرێت، چونکە ئەگەر وێسترا بڕیارێک راست و ڕەوابێت پێویستە لە سەر بنچینەی ئازادی تەواو لە هەڵبژاردنی داهاتووو شێوەی پەیوەندی نێوان کوردستان و عێراق هەڵچنرا بێت. واتە لە سەر بنچینەی دڵنیایی مافی چارەی خۆنووسینی گەلی کورد دیاری کرابێت. مافی نەتەوەی کورد لە چارەی خۆ نووسینی کارێکە ناتوانرێت دەستکاری بکرێت، بەڵام هەڵ و مەرجی نێو دەوڵەتی هەنوکەیی بە کەڵکی سەربەخۆیی تەواو نایەت، بەڵام عێراقی نوێ لەوانەیە ببێتە بنەڕەتێکی جدی راستەقینە بۆ دەستەبەرکردنی ئەو مافە ڕەوایە. یەکەم هەنگاوی دەستەبەرکردنی مافی چارەی خۆنووسینی جێبەجێ کردنی ڕاپرسی کوردستانە و دەکرێت بە پشتیوانییەکی جدی و بە هێز لە عێراقەوە وەدەست بێت.بە گەڕانەوە بۆ بابەتی دیموکراتی لە عێراق و پێکهێنانی دام و دەزگا دیموکراتییەکان، دەبینین کە ئەم کارە جێگر نابێ ئەگەر ڕێز لە فرەیی نەگیرێت و سیاسەتێکی تازە دەست پێ نەکرێت کە دەسەڵات تێیدا دەست و دەست بکەوێت. دیموکراتی تەنها کەم و کوڕنابێت بەڵکو لەوانەشە هەر نەیەتە ئاراوە بە بێ چارەسەرکردنی کێشەی کورد و دەستەبەرکردنی مافی چارەی خۆنووسینی کوردستان. چونکە جۆری ئەو دیموکراتییە چییە کە مافی گەلێک لە گەلان یان نەتەوەیەک لە نەتەوەکان وەک گەلی کوردستان و نەتەوەی کورد پێشێل بکات؟ لێرەوە پێویستە پەنابردنی بۆ ئەو چارەسەرییە دیموکراتییەی کە مافی چارەی خۆنووسینی ڕەچاو بکات و ملکەچبوون بۆ سنوقەکانی دەنگدان لە ڕێگەی ڕاپرسی و پاشی جێبەجێبوونی فیدرالی لە سەربنچینەی دیموکراتی، ئەو کاتە کارێکی بنەڕەتی و زۆرە ملێیە کە دەنگدانی هەڵبژاردنی پەرلەمانی کوردستان لە لایەن پەرلەمانی عێراقەوە ڕێز لێ بگیرێت.

بەڵام ئەو پرسیارەی کە لەم کاتەدا لێمان دەکرێت: چۆن دەکرێت بگەینە ئەو جۆرە مافانەی کە مافی میژوویی گەلی کورد وەک گەلانی دیکەی گیتی دەستەبەربکات؟ بۆ وەڵامدانەوەی ئەوە دەبێت بگووترێت: (ئەو زەمانەتەی کە ئێستا پەسەند دەکرێت لە (گرێبەستی سیاسی) دا یا خود گرێنامەی شەرەفی نیشتمانی کە زۆربەی هێزە نیشتمانی و دیموکراتییەکان ڕازی دەبن ل سەری. لە راستیشدا کارەکە مەبەست نەبوو کە کورسییەکان و هەژموونی تێدا بەشی بکرێت، بەڵام لە ناوەڕۆکدا زەمانەتێکە بۆ ڕاگرتنی ڕێژەی پێکهاتەکانی گەلی عێراق و هاوسەنگییەکانی عێراقی نوێ. بۆ ئەوەی کە خۆمان بپارێزین لە کشانەوەی ئەم لایەن و ئەو لایەن یا خود پشت گوێ خستنی پەیماننامەی تایبەت بە یاسای بەرێوەبردنی دەوڵەت (دەستور کاتی) کە مافی کوردی دیاری کرد و جەختی کرد لە سەر تایبەتمەندییەتی کوردستان لە نێشتمانی عێراقدا، پێویستە جەخت بکرێت لە سەر چوونە ناو هەڵبژاردنەکان بە لیستێکی یەکگرتووەوە کە هەموو هێزە سیاسییەکان کۆک بن لە سەری. ئێمە لە بەرامبەر قۆناغێکی گواستنەوەداین کە هێزە سیاسییەکان یەکتری ناناسن و شەقامی سیاسی باڵە سیاسیە جۆراو جۆرەکانی نە ناسیوە. مەسەلەی دامەزراندنی عێراقی نوێ پێویستی بە بەشداریکردنی هەموو هێزەکان هەیە، ئەمەش دەستەبەرناکرێت بەبێ لیستێکی یەکگرتوو کە بە سەر هەموو هێزە عێراقییەکان بە بێ جیاوازی کراوەبێت وڵە سەر بنەمای ڕێککەوتن و پەیماننامەی هاوبەشی و گرێنامەی سیاسی کە ڕێگە بۆ عێراقێکی دیموکراتی فیدرالی خۆش بکات. لێرەشەوە بەشداریکردنی کورد لە لیستێکی یەکگرتوو بە ڕێگە خۆشکەر دادەنرێت بۆ پتر تووندکردنی باوەڕ بەیەکتر و جەختکردنی ل سەر مافە بنەڕەتییەکانی کورد وەک عێراقییەکانی دیکە. (لە نێوان لیستی یەکگرتوو ولیستی سوننی؟ ئاسەوار و نیشانەکان؟) عێراق ئەمڕۆ ڕووبەڕووی هێرشی مەترسیدار دەبێتەوە بە تایبەتی لە وڵاتانی دراوسێیەوە لەوانەی کە جەخت دەکەن لە سەر پارچە پارچەکردنی و و نەهێشتنی یەکێتییەکەی. کارێکەری ئەو پرۆسانەی کە هەڕەشە لە یەکپارچەیی عێراق دەکەن لە هەندێک پێکهاتە سیاسییەکاندا دەرکەوت کە هەواداری بیرو بۆچوونی ئەو ڕژێمانەن کە حوکمڕانی لەدیدی ئایدیۆلۆجی یان ئایینی تایفەگەرایی ناسراوەوە توندڕەوی چەکداری کە لە ژێر فەرمانێکدان لە دژی بەرژەوەندییەکانی گەلی عێراق بە هەموو چین و توێژەکانی تەنانەت ئەوانەش کە بانگەشەی بەرگریکردنی لێ دەکەن. چونکە چۆن دەکرێت باوەڕ بکرێت بە هێزێک کە دەڵێت گوایە بەرگری لە تایفەیەکی دیاریکراو دەکات و دەستدرێژی بۆ سەر تایفەیەکی دیکە دەکات بە کۆمەڵێک بڕۆبیانووی تۆڵە ئامێزەوە؟! چونکە سادەترین پرسیاری هاوواڵتییەکی عێراقی ئەوەیە کە مندااڵەکانی لە کوێ دابنێت؟

ئایە لای ئەوانەی کە دەڵێن بەرگری لە شێعەدەکەن یان لای ئەوانەی کە بەرگری لە سوننە دەکەن؟

لە کاتێکدا شێعەکانی خاڵی مندااڵکانن و سوننەکان مامیان و پێچەوانەشی راستە! ئایا دەکرێت بەرگری لە لایەنێک لێدانی لایەنێکی تر بێت؟

لە راستیدا هەم ئیشکالییەتە دەکرێت قوڵتربکرێت و کەشی بەکڕی یەکدا چوون تیرەتر بکاتەوە، ئەمە ئەگەر چوونی بۆ هەڵبژاردن بە لیستێک لە سەر بنچینەی تایفەگەرایی بێت بە تایبەتی کە لە پێشکەوتنی هێزە دژەکان و سەرکەوتنیان بێت ئەویش بە شێواندنی هەر هاوپەیمانییەتییەکی نیشتمانی چونکە هێرش برایە سەر پەیوەندییە نیشتمانییەکانی.نێوان هێزە دیموکراتییە سەر ڕاستەکان و دانانی حیسابا لە سەر بنچینەی مەزهەب کردنی تایفەگەرایی ئەوەش واتای پارچە پارچەکردنی عێراق و هێزە نیشتمانییەکانییەتی. بەڵام وەڵامدانەوەی بەرپرسیار و جدی لەوەدایە کە ئەو جۆرە لیستانەی کە هەڵی شێواندن و یاری لە سەرپەتی جیاوازی تایفەگەرایی دەکەن، ڕەت بکرێنەوە، ئێمە لە دیموکراتی و هاوپەیمانییەتی هەر جۆرێک بێت ناترسین، بەڵام ئێمە لە قۆناغێکداین پێویستی بە هەندێک تەنازولکردن هەیە لە مافی بەشداریکردن بە هاوپەیمانییەتی یان هی دیکە لە بەرژەوەندی لیستی یەکگرتوودا کە هەڵ دەرەخسێنێت بۆ ڕێگەبرین لە پیلان و توانجی دوژمنان. ئەوەی کە چاوەڕوان دەکرێت لە هێزەکانی کورد کە لە لیستێکی (مەزهەندەکراوی) سوننیدا دانەبەزن تا بوار نەڕەخسێنێت بۆ پرۆپاگەندەی مەبەستدار، بێ گومان بە چاوپۆشینی لە مەسەلەی بارودۆخی هەندەیی ئەگەر هات و پێویستی بە هەر جۆرێک هاوپەیمانییەتی بوو، چونکە ئەم بابەتە پەیوەستە بە بەرژەوەندی نیشتمان و گەل و کورد. **بۆ لاپەڕەی ٧**

هەموو شتێ لە عێراقدا ئاستەمە و دەکرێت! هێزەکەیشی لەوەدایە کە ئەو گەلانەی لە بیرزەتامیادا ژیاون ئاستی خۆیان لە وشیاری وەرنەگرتووە! کارڵ یۆنگ دەڵێت: (گەلان بە تەوارەتی وەک تاکە کەسان وان. چونکە نەخۆش دەکەوێ و چارەسەردەکرێن و دەتوانێت خۆیشی بپارێزێت و ئەوەشی لە چارەسەرکردن باشترە).

هەموو فەرمانڕەوایانی ناوچەکە خوێنڕێژ و شێێتن، هەر لە (گلگامش)ەوە پاشای ئوروک تا دەگاتە بوختەنسەرو حەمورابی... هتد و ئەفرە نە دڕێیت بەوەی کە گلگامش بە دوای نەمریدا گەڕاوە! پاشان زانی کە بایەخدان بە ئوروک و گەلەکەی نەمرییە نەک نەمری تاکە کەسی و دەسەڵات! بوختەنسەریش دوو جار بابڵی سوتاند تا نەیارەکانی لە ناوبەرێت و یەکێک لە نەیارەکانی براکەی (شەمش موکین) بوو! پێغەمبەرانی ئیسرائیلی بەتیاساو بەدیل گرت و دەربەدەری کردن! حەمەرابی یەکەم یاسای دانا بۆ کۆمەڵگە مرۆڤ و سوکایەتی کردن بە ئافرەت و کزیلە بە جۆرێک بچوکترین بێ ئاگایی لە پەرلەمەر بەرپرسیارد، ئافرەت یا خود کزیلە ناچار دەکات کە لە سەر قیلایەک دابنیشێت! کەچی لەگەڵ ئەوەشدا ئەوانەی کە ئەم یاسایەیان نە خوێندۆتەوە شانازی بەوەوە دەکەن کە یەکەم یاسایە و چارەڕۆشی لەوەش دەکەن ، کە یەکەم یاسایە کۆویلایەتی بەناپەسەندترین شێوەکانی دەچەسپێنێت! نوعمانی کۆری موئزر (یەمەنیە عێراقی حوکمڕانی کردەوە) نەخۆشی خوێنڕێژی و میزاری هەبوو، لە کارمەندێکی یەکڕی گیراو لە لایەن کرێشکی کیسراوە بۆ پاراستنی سنوورەکانی یەو لاوە چیدی بەبوو، هەمان شتیشی لەگەڵ کۆرەکانی ماریا (کە فەرمانڕەوان و یەمەنی بووە) فەرمانڕەوای شێخ نشینی غەساسینە و خۆکەرانی ڕۆمانیوون! لە سەردەمی ئیسلامیشیدا ئەوانەی کە لە ژاین هەڵگەڕانەوە بە سەر موسڵمانەکاندا سەرکەوتن و بەو پێیەش موغیرەی کۆری شەعبە و خالیدی کۆری وەلید و موعاویە وەیازید و عەبدولمەلیک و و و... تا ئەم کاتژمێرە حوکمڕانیان کرد!! کەواتە کەی گەل دەرفەتی خۆی هەبووە تا تاسی دیموکراسی بکات و دانابێت لە بوارەکانیدا؟ سەربوردە دڕێژە و زۆر درێژیشە! بەڵام ئەی سەماحەتی سەید عەلی سیستانی و بەڕێز دکتۆر ئیاد عەلاوی و بەڕێزان هەردوو سەرکردە مەسعود بارزانی و ئاڵەبانی و ئەی هەموو ئەوانەی کە بەرپرسن لە دۆسیەی هەڵبژاردن! دەڵێم چیتان ئامادە کردووە بۆ سنوقەکانی دەنگدان و ئێوە توانای پاراستنی خێزانەکانی خۆتان و پیارەکانتان نییە! چیتان ئامادەکردووە و عێراقییەکان بڕسین و بێکاری کۆشتی کۆمەڵگە هەمجۆر هەنجن دەکات! کوان بەرنامەکانی ڕۆشنبیرکردنەوە! هەڵوێست لە حاشامییەتی موقتەدا ئاسەدر و ڕانانکانی سوننە چییە!! دووپاتی دەکەمەوە هەڵبژاردنەکان کرنگ و پیرۆزن بەڵام بەم شێوەیە دراوێکی بێ نرخە وبێتاتیکە لە سەر هەوا و ژێربێی لەم قسانە تێدەگا.



پرۆفیسۆر عەبدولئیلاهولساتیغ - ئەمریکا

فیۆس: بەشداریکردنی کورد لە هەڵبژاردنەکانی میرانیدا بەلیستێکی یەکگرتوو واتای چی دەبەخشێت؟

ساتیغ: بەنیسبەت منەوە بەشداریکردن ئارامبەخشە بە هەرەوە نەخۆش ئازارەکانی لە بیر دەهێتەوە!

پزیشکیش لە تاڵەو ئازاری نەخۆشەکە ڕزگاری دەبێت!

چارەسەری لە لیستێکی یەکگرتوویان دروانیدا نییە!

چونکە هەر وەک گوتم ئەمە ئازارەکانی و لەوانەشە سڕکەرێک بێت کە نابێت بەخۆشی لە سەری ڕابێت!

تاوتوێ کردنی مافی ئەو گەلانە کە لە میژوتامیادا دەژین چارەسەری ڕەوایە و غەیری ئەوە سڕکەرو ئازارەبەخشە.

فیۆس: جیاوازی چییە لە نێوان ئەوەی کە هەموو هێزە سیاسییەکانی کورد لە هەڵبژاردنەکانی عێراقدا بە لیستێکی یەکگرتوو بەشداری بکەن، یان بە لیستێکی هاوبەشی لەگەڵ هێزە سیاسییە عەرەبییە سوننیەکاندا بۆ نموونە؟ واتە کارێکەری ئەوە بۆ سە ئەنجامەکانی هەڵبژاردن چییە؟

ساتیغ: شیعە پشتیوانێکی بێ چەندو چۆنن بۆ کوردا کوردیش پشتیوانێکی بەتین بۆ مافەکانی شیعە!

چونکە هەردووکیان ستەم و غەدریان لێکراوە وهەرچی ئەوەی تاڵە لە قەزمانڕەوا عەرەبە سوننەکانیان چێشتووە!

وەک پرەنسیپێک مافی هەر گەلێکە کە کاری لە گەڵ گەلێکی دیکەدا ڕێک بخات.

لە سنووری هەڵبژاردنەکاندا مافی هەر گرۆپێکە خزمایەتی لەگەڵ هەر گرۆپێکی دیکەدا بکات بە پێی بەرژەوەندی هەردوو گرۆپەکە! بەڵام ئەوەی کە زیتر لێی دەترسم کورد فریو بدرێت، چونکە سوننەکان ئێستا وەک ڕووکەش کلکی یەعس و وەهابی و تیرۆرن، لەگەڵ ئەوەیش کە زۆربەی سوننە لەگەڵ بیری پێشکەوتووخوازان کەچی تۆیەنی سوننە ئێستا بەپرسن لە هەموو ئازارەکانی عێراقییەکان لە سەردەمی سەدام یان سەردەمی ئیاد عەلاوی!!

پێم چاکترە کورد بە لیستێکی یەکگرتوو دابەزن کە هەردوو حکومەتەکەیان کزبکاتەوە.

فیۆس: ئاماتوی سیاسی کورد لە میانەی بەشداریکردنییەوە لە حوکمڕانی عێراق لە چوار چێوەی سیستەمێکی فیدرالیدا لە عێراقی دوارۆژدا چۆن هەڵدەسەنگێنیت؟

ساتیغ: کورد خاوەنی مافی خۆیانن لە دیاری کردنی چارەنووسیان. پێویستە لە سەر عەرەب ئاگاداری ئازارو خواستەکانی گەلی کورد بن، دەکرێت لە میانەی ئەم قۆناغەی ئێستا پرۆتۆکۆل لە نێوان کورد و عەرەب و گەلانی دیکە گرێ بدرێت لە پێناو گەیاندنی عێراق بۆ ئاشتی و ئاسوودەیی و لە بارودۆخێکدابێت کە بتوانێت یاسا چارەنووسسازەکان دەربکات.

فیۆس: ئەی چۆن ئەگەر کورد لە هەڵبژاردنەکاندا بەشداربیان نەکرد، ئاراستەیەکی ڕاوان لە نێو ئارەزووەکانی نووسەرانی کوردا هەیە بانگەشە بۆ بەشداری نەکردن لە هەڵبژاردنەکانی ئایندەدا بەکەن؟

ساتیغ: دەبێت لەم قۆناغە هەستیارەدا کورد وا بیر نەکاتەوە کە لە هەموو کەسێک دابڕاون و ئێمەی عەرەبی شەیدای گەلی کورد ئیحراج نەکەن!

بارودۆخەکە ئێستا سەختە و دەبێت کورد یارمەتی ئەم حکومەتە بدات بۆ گەیشتن بە سنوقەکانی دەنگدان تا بەعسییە پیاو کوژەکان کەلێنێک نەدۆزنەوە و دزەی لێوە بکەن. کەواتە بڕۆنە ناو هەڵبژاردنەوە بەڵام بەم شێوەیە دراوێکی بێ نرخە و بێتاتیکی ڕوون و دیاریکراوەوە.

دیداری هەڵکەوت زاهیر لەکەڵ:

تاریق فەقێ عەبدوڵا دەربارەی شیعری گۆرانی

هەڵکەوت: ئایا ئەو تێکستانەی کە نووسیوتن، بە تایبەتی بۆ گۆرانی نوسراون،؟ یا خود وەک هۆنراوەیەک لەوە پێشتر نووسراون؟

وەڵام: ڕاستتروایە لە بڕی تێکستی گۆرانی بووترێ "هۆنراوەی گۆرانی"، ئێمەی کورد زۆر هەژار و کەم دەرامەتین لە بواری "تێکست یان هۆنراوەی گۆرانی" دا، کەر سەیری گۆرانی کوردی بکەیت "هەر لە حەیران و لاوک و سیاچەمانە و هازە و بەستە و مەقام و لاواندنەوە و بەستە و گۆرانی بژنە ئایینییەکان و سروود و بەشەکانی تری گۆرانی، ئەوا هۆنراوەی هەر یەک لەم بەشانە تایبەتمەندێتی خۆی هەیە، کەچی بەداخەوە لە کتێبخانەی کوردیدا بە دەگمەن سەرچاوە بەر دەست دەکەون لە سەر هۆنراوەی تایبەت بە هەر یەک لەو شێوازانەی گۆرانی کوردی. لە لای ئێمە هۆنراوە لە مانا گشتی یەکەی زیاتر نەخراوەتە هیچ چوارچێوەیەکی تەوە، ئەمە وێڕای ئەوەی وەک نەتەوەیەکیش نەمانتوانیوە هەرچی ئەرشیف و گەنجینەی هەر یەک لەو سیما دیارێکراوانەی هۆنراوەی تایبەت بەو شێوازە هونەرییانەی گۆرانی کوردی بپارێزین، ئەوەی هەیە زۆر کەمە و دەکرێ بوترێ لەخانەی نەبوانداید.

هەرچی سەبارەت بە پرسیارەکەتان ، ئەو تێکست یا هۆنراوە گۆرانیانەی کە من نووسیومن، تایبەت بۆ گۆرانی نووسراون، گەرچی لەوە پێشتر وەک ئیلهامێکی شیعر لە هۆنراوەیەکدا خۆیان نەبینیوەتەوە، بەڵام ناکرێ کاریگەرێتی هەستی شیعر هۆنراوەکانی لەوە پێشووتر یان خولیایەکی شاعیرانەیان بە سەرەوە نەبێت. لە گەڵ ئەوەشدا هەر هۆنراوەیەکی گۆرانی هەر لە سەرەتای نووسینەوە تاکو دواساتی دارشتنی و تۆمارکردنی وەک گۆرانیەک بە چەندین بواری گۆڕان و دەستکاریدا تێدەپەڕێ، ئەوەش بەپێی گووتوویژ و لێدوانی نێوان من و برای ئاوازدانەر دەبێت.

هەڵکەوت: ئایا شاعیرانی کورد بە هەستی گۆرانی شیعر دەنووسن، یا خود وەک ئیلهامێکی شیعری دەنووسن؟

وەڵام: بێگومان شاعیرانی کورد لەگەڵ بژهاتنی هەر ئیلهامێکدا شیعر دەنووسن، لەوەشدا زۆربەی شاعیرانی ئێمەی کورد وا بەستەی هەناوی ڕیسوا نەرێتی باون کە خۆیان گیرۆدەی ئەوە کردووە بیر لەوە نەکەنەوە هۆنراوەیەکە داڕێژن، بەواتا کاتی نووسینی هۆنراوەکانیان وا بەستە کردووە بەو ساتانەی کە ئیلهامی شیعریان بۆ دێت و ساتەکانی دی لە چاوەڕوانی ئیلهامدا بەسەر دەبەن، ئەم نەریتە تا ماوەیەک پێش ئێستاش هەر باووبووە، بەڵام ئێستا هەناوی لە شاعیران لەو چوارچێوە دەرچوون و گەیشتوونە ڕادەی هونەرزانی و چەندین بەرهەمیان خستۆتە سەر خەرماتی شیعری کوردی، لەوانە شاعیرانی ناسراوی وەک شێرکۆ بێ کەس و د. عەبدوڵا پەشێو د. ڕەفیق سابیر و فەرهاد شاکەلی و چەند بەڕێزێکی تر.

بەڵام لە بواری گۆرانیدا ئێمە تا ئێستا تێکست نوسی گۆرانی وا نییە کەوەستایانە لەگەڵ ئەم بوارەدا کار بکات، هەندێکیان تەنیا ووشە ڕێزکردنە لە ناوەڕۆکدا و بگرە هەناوی تێکستی گۆرانی هەیە کە ڕۆڵی نیگەتیف دەبینێ و هونەری هۆنراوەی گۆرانی دەشوێنێ.

هەڵکەوت: چی بکرێت، تا تێکستی گۆرانی نووسین بەرەو باشتر بچن، ڕاوبۆچوونتان چییە بۆ ئەو کەسانەی تێکستی گۆرانی دەنووسن؟

وەڵام: ئەوەی شاعیر بێ هانای ئەوەنییە تێکستی یان هۆنراوەی گۆرانی دەتوانێ



تاریق فەتح عەبدوڵا خاوەنی دیوانە شیعری "بێ ناو نیشان" و چەندین دەفە شیعری کراوەتە سروود وگۆرانی: "بەڵێ بۆ ڕیفراندوم.. بەڵێ بۆ ڕاپرسی" نموونەیەکی دیاری بەرهەمە شیعریەکانیەتی.

بنووسێ. ئەوەش دەگەڕێتەوە بۆ نەبوونی بنەما سەرەکییەکانی چونیەتی دارشتنی تێکست، هەتا سەرەدەمانێکی پێش ئێستاش ئەو هۆنراوانەی کە کراون بە گۆرانی، لە بەر نەبوونی تێکستی گۆرانی ، کراون بە گۆرانی، ئەگینا زۆر گونجاو نەبوون و زۆربەی کاتیش دێرەکانی هۆنراوەکە گۆرانی بە سەرداهاتووە تاکو بگونجێ بۆ گۆرانی.

هەرچی ئەوە بنەما سەرەکییانەی کە دەبێ ڕەچاوبکرێن لە نووسینی تێکست یان هۆنراوەی گۆرانی، بە ڕای من بریتین لە: نووسین بە زمانێکی سادەی ئاخاوتنی خەڵکی لە شێوازی نوسینەکەدا نزیکبوونەوەی زیاتر لە ناخ و دەروونی تاکی کۆمەڵ و شێوەیەکی گشتی بدات بە تێکستە کە بەو جۆرەی هەردوولایەنی نێرینە و مێینە خۆیان لەو ئەندێشەیەدا ببینەوە کە لە تێکستەکەدا هاتووە (یەکەی بابەت) لە تێکستەکەدا هەبێت لە یەک تەوەرەدا خۆی ببینێتەوە نەک بە سەر چەند تەوەرێکدا دابەش ببێت، ئەو دێرە هۆنراوانەی کۆپلەی تێکستەکە پێک دێنێت لەمانا بەخشیندا تەواو پڕ مانا بێت نەک تەنیا ووشەڕێزکەدن بێت.

هەڵکەوت: وا هەست دەکەیت کە شاعیرێک شیعرەکەی دەکرێ بە گۆرانی ، ئیلهام و هەستی شاعیرێتی لەگەڵ ئاواز دانەر لە تای ترازودان، ئایا ئاوازدانەر هەقی داوە بە شیعرەکانت یان تێکستەکانت؟

وەڵام: دەبێت ئاواز دانەر و شاعیر پێکەوە یەکەیەکی کاری هاوبەشی پێک بهێنن. بە ڕای من دەست نیشانکردنی دەنگی شیاو بۆ هەر تێکستێک، هەر دەبێت لە لایەن ئاوازدانەرەوە بێت، چونکە ئاوازدانەر دەزانێ پێویستە چۆن هەڵس و کەوت لەگەڵ ووشە و دێرو کۆپلە شیعرییەکەدا بکرێت. من ئاوازدانەرم وەک دەرهێنەری هەر کارێکی هونەری شانۆ یان سینەما دێتە بەرچاو، هەر وەک چۆن دەرهێنەر کارەکتەرەکان و هەڵس و کەوتیان دیاری دەکات، ئاواش ئاوازدانەر دەزانێ چ ئاستێکی دەنگێک گونجاوە یان چ تێکستێک بۆ ئەو ئاوازە دەگونجێ.

هەرچی دەربارەی ئەو تێکست و هۆنراوانەی بۆ گۆرانی و سروود نووسیومن، برای ئازیز کاک هەولکەوت زاهیر هەقی تەواوەی داوە بە هۆنراوەکانی من و زۆر وەستایانە بە ناخی ووشەکاندا ڕۆچووە و لە سیمایەکی قەشەنگدا، هونەرییانە دایڕشتوون.

هەڵکەوت: بە ڕای تۆ باشترین ئاوازدانەر کە تێکستی کردبێتە گۆرانی یان سروود کێیە؟ چەند هەقی داوە بە شیعرەکە؟

وەڵام: زۆر بە ڕاشکاوی دەڵێم باشترین ئاوازدانەر کە بە شێوەیەکی زۆر ئەکادیمیانە هەڵس و کەوت دەکات لەگەڵ تێکستی گۆرانیدا برای خۆشەویست (کاک هەولکەوت زاهیرە)، من پێم وایە ئەم هونەرمەندەی ئاوازدانەرە بە توانایە دەتوانێ ڕێچکەیەکی نوێ و گۆرانکارییەی تەواو و مۆدێرن بە سەر هونەری گۆرانیدا بهێنێت و بە دووری ناگرم گەر دەرفەت و پێکەو زەمینەی لە باری بۆ دابین بکرێ ئەوا کاک هەولکەوت دەتوانێ شاکاری زۆر مەزن بەدی بێنێ.

هەڵکەوت: کێ لەو گۆرانی بێژانەی کورد حەز دەکەی تێکست بکات بە گۆرانی؟ تا چ ڕادەیەک ڕازیت لەو گۆرانی بێژانەی تێکستی تێزیان کردووە بە گۆرانی یان سروود؟

وەڵام: سەبارەت بە بەشی دووەمی پرسیارەکەت، سروودی (بەڵێ بۆ ڕیفراندۆم... بەڵێ بۆ ڕاپرسی) کە لە لایەن هەردوو گۆرانی بێژی ناسراوی کورد بەڕێزان (کاک ناسری ڕەزازی و خاتوو مەرزیيە فەریقی)ەوە پێشکەش کرا. دەتوانم بڵێم ئەو دوو دەنگە کالای پڕ بە بالای ووشەکانی ئەو سروودەبوون و زۆر مامۆستایانە گۆلاوی مسک و ڕێحانەی ئەو ووشانەیان دا بە ڕووماناً، زۆر عاشقانە لەگەڵ شەپۆلی ووشە و نەعرەتەی دەنگی دڵێرانەی ئازادیخواهانی کوردستانا بە دیار ئالای کوردستانەوە ئەو سروودەیان چڕی لەگەڵ زایەڵەی دەنگیانا من پێم وایە ڕوحیانەتی هەر پێنج هەزار پەپوولەکەی هەڵەبجەی شەهیدو دەیان هەزار گوڵاڵە سورەی قوربانیانی گۆڕە بە کۆمەڵەکان وەک کۆڕاڵێک ئەو سروودە دەڵێتەوە، زۆر بەڕێزەوە دەست خۆشیان لێ دەگەم.

دەکرێ ئامازە بەوەش بدەم کە چەند بەرهەمێکی تریشم لە لایەن خاتوو مەرزیەوە ئامادەکراون و لە داهاتوویەکی نزیکدا بڵاوەکرێتەوە.

لەو ڕووەوە دەنگی گۆرانی بێژانی ناسراو (کاک ناسر و خاتوو مەرزیيە و کاک شڤان پەروەر لە لای من زایەڵەی هەستێکی شیرینن لە سەر دڵان.

هەڵکەوت: دوا ووشەت بۆ پەیامی کورد؟

وەڵام: خوازیارم پەیامی کورد بۆیرانە ڕاستیەکان دەربخات و لەو ڕەوتە ئاساییەی کە ڕۆژنامەی کوردی سیمای پێوە گرتووە دەربچێ، هەر چەندە پەیامی کورد وەک سەرەتا هیچ شێوازو ڕەوتێکی نوێی وای پێشان نە داین، هەر بۆیە ئەگەر بیەوێت ببێتە پەیامی کورد، ئەوا دەبێت سنوری ئاسایی باوی ڕۆژنامەگەری ئەمڕۆی کوردی ببڕێ و بە دوای ڕاستیەکاندا بگەڕێ، سەر لە نوێ لە میانەی ووتارو لێکولینەوەوە ئەو چەواشەکاری و تەم ومژییەی بە سەر زۆربە بواڕە جیاجیاکانی ژیانی سیاسی و کۆمەڵایەتی و فەرهەنگی و تەنانەت کلتوری کوردیدا هاتووە ڕەت بکاتەوە و لە کەوشە نێکی ڕاستیی و حەقیقەدا تۆماریان بکاتەوە. دەبێ هەوڵ بدات نووسەرو خوێنەری کورد و جەماوەری کوردستان لە سەر بە دیار خستنی پەیامی مرۆڤایەتی و بە مرۆڤ بوونی کورد ڕابهێنی. بەڕنا دشۆ لەو بارەیەوە ووتەیەکی هەیە دەڵێ (گەر تەمی سەرچاوت لانەدەی، هەموو شتەکان بەلیلی دەبینی) خۆزیا "پەیامی کورد"یش لە هەڵس و کەوتیانا لەگەڵ نوسەران و ڕۆشنبیران و خوێنەرانیانا بەپێی ڕێسا و یاسای ڕۆژنامەگەری لە جیهاندا ڕەفتاریان دەکرد.

پیرۆزبێت فیستڤاڵی گۆرانی کوردی

لوقمان بەرزنجی

بەستنی فیستڤاڵی هونەری و ئەدەبی و یا خویی یانەکانی تۆپی پێ لە هەر شارێکی کوردستان هێمایە بۆ ئارامی و باری ئاسایی پتەوبوونی پاراستنی ئاسایشی کۆمەڵانی خەڵک، دیارە ئەوەی باسی لێوە دەکەین ڕاستیەکە کە ئەمڕۆ لە کوردستان دا هەیە و لە کاتێکدا ئەوەتا باری ئاسایی لە ناوەڕاست و خواروی عێراقدا بەدی دەکرێ. بە هەر حال.

جاران ئەگەر چەند تیپێکی هونەری لە شارو شارۆچکەیەکی کوردستاندا کۆبوونەوەو کەرنەڤاڵێکی مۆزیکی کوردیان سازدەدا و ناویان دەنا فیستڤاڵ، ئەوەش لە بەر چەند هۆکارێکی ئابووری و تەکنیکی و ئیعلامی بوون، بەڵام ئەو خۆپیشاندنە هونەریە کەورەیەی کە لە شاری هەولێر سازدرا لە ژێر ناوی (فیستیڤاڵی گۆرانی کوردی) بە ڕاستی ڕووداوێکی مێژووی گەورەبوو کە دەڵێین مێژوویی لە بەر چەند هۆکارێکی گرنگ.

١. لە دوای هەشتا ساڵ بۆ یەکەمین جارە کە خۆپیشاندانێکی وەها ئەو هەموو هونەرمەندە کورە لە هەر چوار بەشی کوردستان بگرێتەوە ناودارترین کەسایەتی هونەری گورانی بەشداری بکەن وێڕای ئەوەش بەرپرسی ڕادیوی یەڕێڤان و چەند میوانێکی بیانی و ئەڵمانی و ئەمریکی ... هتد ئامادەی ئەو فیستڤاڵە بەن.

٢. ئەم جۆرە خۆپیشاندنە بە هەق دەتوانین ناوی بنێین فیستیڤاڵ چونکە هەموو تایبەتمەندییەکانی فیستیڤاڵی لێوەدی دەکرێ.

٣. ئەوەی زۆر گرنگە ئێستر لەم فیستیڤاڵە نارۆناوەکان لێک جیا دەکرێنەوە، وەک، چاوەش، دەنگبێژ، هونەرمەند و هەر یەک لەم جۆرانەی باسمان کردن کەلێنێک لەو فیستیڤاڵە پر دەکەنەوە.

٤. بوونی ئەم جۆرە فیستیڤاڵە کەسایەتیەکی هونەری دەدات بە کورد پێتاسەیەک دەداتە هونەری کوردی لە بەرامبەر گەلانی تر چونکە وەک کزنفۆشیۆس دەڵێ: (ئەگەر ویستت نەتەوەیەک بناسی گوێ لە مۆسیقای ڕابگرە).

٥. کۆبوونەوەی ئەو گوڵبژێرە لە هونەرمەندانی کورد لە هەر چوارپارچەی لە سەر خاکی کوردستان وەقعێکی مەعنەوی گەورەی هەیە لە سەر خودی کەسایەتی کورد. چونکە هەرگیز ناکرێ مۆسیقا لە خەباتی نەتەوایەتی جیابکرێتەوە.

٦. ئاشکرایە تاوەکو ئێستا هیچ حیزبێک نەی توانیوەیە قەد (سروودی ئەی ڕەقیب کورد لە یەک خانە کۆبکاتەوە، سەرپەرشتی کردنی ئەم فیستیڤاڵە لە لایەن خودی سەرۆکی حکومەتی هەرێمی کوردستان ئیدارەی هەولێر کاک نێچیرڤان بارزانی و بەڕێز کاک سامی شۆرش وەزیری ڕۆشنبیری کاردانەوەیەکی نەفسی چاکی لە سەر فیستیڤاڵەکە و بەشداربوان هەبووە.

ئەوەی دەمێنی ئاماژەی بۆ بکەین هەر چەندە ئەوە یەکەمین هەنگاوە لە هەزار میلەکە. خۆزگە و پێشنیار دەکەین. ئەم فیستیڤاڵە تەنها هۆکارێکی ڕاگەیاندن نەبێت بەڵکو بەردەوام بێت و ئەم فیستیڤاڵە سەرەتایەک بێت بۆ فیستیڤاڵی دووهەم و لە ئایندە. لە تەک مۆزیکی کوردی، کەسانی پسپۆر و شارەزا لە بواری لێکزلینەوەی زانستی و هەڵسەنگاندن و سیمیناریشی تێدا بەشدار بێت. بەم شێوەیە دەبێتە کارێکی تەواوکار (المتکامل) بۆ ئەم مەبەستە دەعوەتنامە بکرێ بۆ بەشی ئەرشیفی موزیکی لە ڕێکخراوی (یونکسۆ) ی سەر بە نەتەوە یەکگرتووەکان بۆ ئەوەی کەللتوری کوردیش لە تەک کەلتوورەکانی تری گەلان ئەرشیف بکرێت. بپارێزرێن، بەم کارەش شوێن پێیەکی تریش دەکەینەوە لە نێو ئەدەب و کەلتووری گەلان، بەم شێوەیە هەنگا بە هەنگاو جارێکی تر ناوی کورد و نەخشەی کوردستان دەخەینەوە سەر ئەتلەسی جیهان، مۆسیقای کوردیش بێتەوە بەوێردی سەر زمانی هەموو ئینسانێکی کورد و جارێکی تر زەردەخەنەی خۆشی دەگەڕێنەوە سەر لێوی منالان و دایکی شەهیدان و ڕۆحی شەهیدان شاد دەکەین، بەو هیوایەی یەک ڕیزی و یەک دەنگی ئەم ئاسایشەی کوردستان بپارێزین. ئیتر لە شوێنی چەک کەمانێک بژەنین و لە شوێنی هەر مینێک گوڵێک بچینین و مۆزیکی کوردی بگەرینینەوە هەموو ماڵێکی کورد لە کوردستان ولە هەر سوچێکی ئەم جیهانە.

پیرۆزبێت فیستڤاڵی گۆرانی کوردی و هۆڵی میدیاش بوو بە میۆزو.

شەشەمین ڤیستیڤاڵی چیرۆکنووسانی خۆرئاوای ئێران

ڕۆژی ٢١،٢٢،٢٣ی خەزەلوەری ئەمساڵ لە شاری بانە، شەشەمین ڤیستیڤاڵی چیرۆکنووسان بەڕێوە چوو. ئەوەی کە ئەم ڤیستیڤاڵەی لەوانی پێشتر جیا دەکردەوە؛ ئامادەبوونی ژمارەیەکی بەرچاو لە چیرۆکنووسانی کوردستانی عێراق بوو. لەوانە بەڕێزان: شێرزاد حەسەن، ڕەئوف بێگەرد، ئاکۆ کەریم مەعروف، مەولود حەسەن ئیبراهیم، بە گوێرەی هەواڵی ڤیستیڤاڵەکە ١٥ چیرۆکی کوردی و ١٥ چیرۆکی فارسی هەڵبژێردران بۆ پێشبڕکێی ڤیستیڤاڵەکە و ١٥ چیرۆکی تری کوردی و فارسیش خرانە لاوە کە دوای تاووتوێکردنیان بڕیاری هەڵبژاردنیان بۆ بدرێت. لە بارەی چیرۆکی کوردییەوە میژگردێک بۆ چیرۆکنووسان (شیرزاد حەسەن، ڕەئوف بێگەرد، ئاکۆ کەریم، مەولود حەسەن ئیبراهیم، عەتا نەهایی، محەمەد ساڵح سوزنی، ناسر باباخانی، عەبدولخالق یەعقوبی) سازکرا کە بە شێوەیەکی زانستیانە چیرۆکی کوردییان شرۆڤە کرد. لە کۆتایشدا دەستەی هەڵسەنگێنەران ڕێزیان لەم بەرهەمانە نا: خەڵاتی یەکەم بۆ " خولیای ناو زێرابەکان" بەرهەمی مامەند قادری خەڵکی شنۆ. خەڵاتی دووەم بۆ " یەکشەممە سەرم لێتادەیت" بەرهەمی ئومێدی ڕەحمانی خەڵکی بانە. خەڵاتی سێیەهم بۆ " خەونەکەم لە تاوسانا فێنکن" بەرهەمی تۆفیق موشیر پەناهی خەڵکی سنە،

هەروەها ئەم بەرهەمانەش خەڵاتکران وەک : دەترسم دیسان سێبەرێک بە سەر گۆڕەکەمدا بخشێت" بەرهەمی خەلیلی ڕەحیمی خەڵکی مهاباد، خەڵاتی یەکەمی وەرگرت و چەندین بەرهەمی تریش. شایەنی باسە دەستەی زانستی و هەڵسەنگێنەرانی بەشی فارسی و کوردی ئەمانە بوون : عەبدوڵا کەیخوسرەوی، عەتا نەهایی، محەمەد ساڵح سوزنی، ناسر باباخانی، عەبدولخالق یەعقوبی.

بۆ ڕێنمایی کار و باری باج و دارایی لە ئەڵمانیا

Dipl. Volksw. Hoschnav Sleman

Steuerberater Dipl. Ing. Hannes Elter

بەڕێوەبەری کاری ژمێریاری و دارایی

Von Guericke Alle 21 53125 Bonn
Tel. : 0228 / 29 83 07 Mobil : 0170 32 44 831
e-Mail : sleman@web.de

محسن نوسمان

دیالوگا ئەز و ئەو

مەبەست ژ دیالوگا ئەز و ئەو (یێ دی) وەک هەڤرکیا شارستانی و ژ بەرداگیرانا کەسێ دی، ئەنجامێ هەرە گرنگێ خونیاسیتایە. بەلێ مخابن مە هندی یێ دی نیاسی (شارستانیا روژئاڤا) مە هند خو نەنیاسیە. چونکی گەلەک بویەر و قوناغێن (دیروک، داستان، ئول، جڤاک و...) خومالی هەنە هێشتا ئەم ژێ د هاڤینە. چونکی مە بویەر و قوناغێن هەلسەنگاندنێ نە هەلبژارتینە، بەلکو ئەم ل دویڤ بێن وان ڤیاین چوینە. بقێ پروسیسێ مە ژ یێ دی وەک بیانیبوون دەسپێکریە نە وەک دیالوگەکا هەڤسەنگ، بەلکو وەک بەرمایێ گومان بخو هەبونا. تا نوکە مە خو نەنیاسیە و یێ دی ژێ وەک شارستانیەت فام نەکریە. ئەڤرو ژێ ل روژهەلات سەرەدەری دگەل یا دی لسەر ئاستێ توکا نەعلەتێ دهێتە کرن. نە قەبولکرنا کەسێ دی ژ دەرکرنا شەیتانی بگرە تا دگەهێتە پەیدابوونا تیکەها دایکسالاری و بابسالاری دیار دبیت، کو مە گێولێ یێ دی نەبوویە. مە نەشیایە ژ ڤی کراسێ رەشبین دەرباز ببین. بقێ چەندێ دابرین و کوشتنا یێ دی وەک (هزر و گیان) کەتیە فەرهنگا مروفاتیی. هەر پەیدابوونا ڤان داستانێن دلداری و مێرانی ئەنجامێ نە حەواندنا کەسێ دی بوویە. ئەف یاسا و قانونێن ل شارستانیێن کەڤن پەیدابووین، ب چەمکێ سانسورێی لغافکرنا یێ دی بوویە. لقێرێ زالبوونا هزر و رەفتارێن بخورتی لسەر کەسێ دی (لایێ دی) وەک رەهنکەکێ تیرورا (نەڤەبوولکرنا) هاتەکرن. ژ بەر چیسبونا (تەسلیم) سروشت و خەیالی، مە نەشیایە سنورێن چەمکێ پیرۆزیێ ب شەقینین و بستە نەکریە خو وەک بەرهەلست بدەینە نیاسین...! خونیاسین ژی ب رامانەکا ئەپستمولوژی، وەک ئەنجامەکێ فرە رەوشەنبیری، کو مروفی دئێخیتە خانا ملیانێ. هەر چەندە خو یان دی نیاسین ئەنجامی کەشکەکێ دیموکراسی و باژێڤانیا مودێرنە. بەلێ ئەو تیکەهێن دیموکراسیەت، مافێ مروڤ، جیهانگیری و..." ئەڤرو ئەم سەرەدەرێن دگەل دکەین، وەک نافێن رەهوریت مە نیاسینە. ئەم دگەل رەه و ریشالێن ڤان ئیدیەما نە ژیانە، ژ بەر هندێ ئەڤنە هێشتا لنک دکویڤینە. تیکەهشتنا یێ دی ئەنجامێ گەوهەرەکێ فرە رەوشەنبیریە، وەک فەرهەنگا سیاسی ب دیلوماسی ناڤکری. مە دوبەرەکیا دناڤ خودا وەک چەمکێ مروڤاتی، کین ژ دلوڤانیێ پتر نیاسیە. هەر پارڤەبوونا سروشتی بو نێر و مێ دو توخمێن ژیکجودا پەیداکرن، بنایەتی پشتی کێشا (ئادەم و حەوا) سەرەدەریا نێر و مێ هاتە گوهوزین و ل داویێ نفشی مێ بو پلا دوێ. لسەر ئاستێ چیناتیا (هابیل و قابیل) بوونە بەرێ دەرافێ. چینا بلند ب چافەکێ نزم ل چینا ژێر نێریە، بەلێ بو دەسەلاتێ چەمکێ (ئەز یەتی) وەک چافترسین بگرانی مە بکارئینایە. ئانکو مە چ جارا یێ بەرامبەر وەکی خو (باشتر) نەدیتیە، چونکی ئەم بەرمایێ هزرا ئیسلامانە، کو خو وەک ئول و داویێ و باشتر دایە نیاسین و یێ دی نزم دبێتینە. بقێ پەروەردەیێ مە یێ دی قەبول نەکریە و نەکریە جهێ پویتەپێدانا خو. ژ ژانگرتنێن دیروکا مەم و زین، خەج و سیامەند، تراژیدیا حەلاجی و... دیار دبیت، روژهەلات نەشیایە (مارتن لوتەر)ەکی پەیداکەت، ئولی ژ ژیانێ (دەولەت)ا جوداکەت. ژ بەر هندێ ئەم وەک روژئاڤا دقوناغا رینیسانس و روشنگەریێ را نەبورینە. ئانکو ب کورتی ئەم ئەنجامی پەیامێ ئیسلامینە. یاکو ئەڤرو ب تیرور ل قەلەم دهێتەدان. وێ ئیسلامێ سیاسیا دو ئەنفالین قوتبر لسەر سەپاندین. بقێ سرتێ نە مە شیایە بریکا ئولی بەرسڤێن ژیانێ بدەین و نە ژێ مە ژیان وەک پێناسەکا دورەست نیاسیە. بقێ جیهانبینێ مە پەنا بریە بەر خەیالێ و هەر زوی چیسبوینە بەر حنگا سروشتی، لەورا ئەم بووینە قوربانێ فەلسەفا وەهم و گومانێ. ژ بەر گەلەک سەدەمێن ژ دەرڤەی ڤێ مژارێ مە نەشیایە خو ژ ڤی کابوسی رزگار کەین و بقێ ئاوایی ژی ئاڤابووینە، مە گەلەک جارا بو خو بخو کابوس چێکرینە. ئەو هەلامەتێ جارا جوتیاران ل ئاف زەڤێین خو ڤەدان، دا فرندە ڤ دەرامەتێ ب رەڤن. ئەم نهو بخو وان هەلامەتا نوژەن دکەین، ئەم بەند و بەرمایێن گەلەک شوپ و سرتاینە ژ بنەمال، گوند، قەبیلە، نەتەوە و ئولان بگرە تا دگەهێتە رێبازێن هزری، فەلسەفی و.. کەسێ روژئاڤا شیایە ژ گومانێ بچێتە یاوەریێ. لێ ئەم روژهەلات دخەلەکا گومانادا دژڤرین... بقێ کەساتیا لاواز مە پەنا بریە هێزەکا بلندتر وەک پیرۆزی بەنی هەرێ بهویکە و هێزا رزگاربوونێ وەک پەرستن هەرا ل ئەڤراز. کەسێ روژئاڤا ئەنجامێ گەلەک شورەشێن هزری و فەلسەفی بوویە قوناغێن هوڤانە ل پشت خو هێلاینە و دەربازی قوناغێن پتر مروڤانی بووینە. کولتوری شورەشا فرەنسی (ئازادی، برایەتی و وەکهەفی) باشترین نموونا ڤی مەبەستێیە. ئەم ل وەلاتێ خو لبەر چەقویا نەمانا سێکوچکا رژێمێن (تورک، ئەرەب و فورسا) پروژی گەڤا ژنافرێنینە. ژنافرین وەک کولتور، کەساتی و هەبوون، کوردا ج جارا یێ دی وەک هاریکار نەدیتیە. ژ بەر هندێ یێ دی بو مە هەر چێن ترس و هەرەشی بوویە، ئانکو ڤی دەڤەرێ سەقایەکێ داوڤان دورست نەکریە، ئەم هەناسەکێ ب هەبوونا خو وەک مروڤ هەلکێشین. یێ دیروکا مە بخوینیت، دێ باشتر د یێ دی گەهیت. ئەڤ شەرێ خو گوشتنێ رەوشەنبیرێ کورد نەشیایە بیتە یێ دی (هێزا سیا). بقێ پیڤانێ مە نەشیایە خو یان یێ دی وەک هەبوون قەبول بکەین، وێ قەبولکرنا کو خو پێ بنیاسین. مە نەشیایە کۆرەکێ ساخلەم ژ چوار پارچا پێک بینین، چونکی مە کولتورێ قەبولکرنا کەسێ دی دناڤ خودا نەبوویە. بقێ گیانێ ژ بەرێکچوین نەشێین ببینە بنگەهێ قەبولکرنا کەسێ دی ژێ. سەقایێ هەست ب کیماتیکرنا مروڤێ کورد هند هێز نەدایە مە ب بگیانەکێ بوێرانە رەخنێ ل خو بگرین یان رەخنا یێ دی قەبول بکەین. بقێ ئاوایێ پەروەردەبوونێ، مە هەر خو ژ خەلکی باشتر دیتیە. ئەگەر مە خونیاسیا دا شێین ئولێ ئیسلامێ کەینە رێک بو ئاڤاکرنا دەولەتا کوردی، هەر وەکی تورک و فورسا ئیسلام کریە ئیدیولوژیا دامەزراندنا هەبوونا خو. هەروەسا دا سیستەمێ هزرا چەپ کەینە بنگەهەک بو قەوژاتنا کیانێ خو، هەر وەک گەلەک ژ وەلاتێن روژهەلاتا ئەورووپا پێ رابوون. ئەگەر مە خو نیاسیا دا پێ ل پەراسیا خو دانێن و یێ دی قەبول کەین، ئەم پارچە ژی نە دبووین و مە ژ بەر دوژمنان ژی نە دادگیرا! بقێ عەقلیەتێ ئەم ئاسوێین پاشەروژەکا گەشتر نابینین. ژ بەر هندێ پەنایێ دبەینە بەر رابوردوی (نە ب تیگەهەکا ئەلمانی دیروک ئانکو سوبەهی)، بەلکو وەک تشتەکێ پیرۆز و دەست تێگەدان یکارەکێ ئابویی دزانین! ئەف شەرێ ئالیسەنگێ دەمێ باهاتی و بوری کار کریە سەر تیگەهشتنا مەیا رەوشەنبیرێ ژێ. کو هەر چەندە ژی ئەڤرو رومان (چیروک) سەرکێشە، بەلێ هێشتا هەلبەست لنک مە سەرپشکە. چونکی گیانێ هەلبەستێ پتری گرێدایی ئەندیش و خەیالێیە. ڤی نەڤەبولکرنا یێ دی کار د هەڤکێشا نفیسەر/خاندەڤای ژی کریە ب تیگەها رولان پارتی (مرنا نڤیسەر)ای ژ دایکبوونا خاندەڤای دەسپێکریە و دەسەلاتا راڤەکرنا دەڤی کەتە دەستێ خاندەڤا/رەخنەگری. لقێرێ نڤیسەر بوویە قوربانیێ خاندەڤا/دەڤی. لنک مە خاندەڤا/دەڤ بوویە قوربانیێ نڤیسەری، بقێ تیگەهشتنێ خاندەڤا/رەخنەگری کورد ب ئاوایەکێ بێگونەه (بریئ) و ب چافەکێ گومانێ دەڤی دخوینیت. بقێ دوئالیزمێ خاندەڤایێ کورد نەشیایە مرنا (نڤیسەری) (هەلبەستا نوی یاکو ب زیندانا زمانی ـ ئیمپراتوریێ نڤیسینێ ناڤدکەن) راگەهینیت و ب گرانیا شروڤەکرنێ گیانی بدەتە تێکستی. ڤی پروسیسێ ئالاف و پرێن دناڤبەرا هەلبەستڤانی (مری) و خاندەڤا/رەخنەگری (لاواز) دا نە ژێکگرتنەک پەیداکر، ژ بەر هندێ نڤیسەری و خاندەڤای زمانێ دیالوگا وەک ستراتیژی ژ دەستدا... بقێ سەهما گومان بخو هەبوونێ مە ژ هەستێن مروڤی گرنگی پتر دایە گوهی ژ چافی، ئانکو هەر چەندە بریکا تەکنولوژیایا (تەلەڤزیون، ئەنترنێت و....) رولێ چافی وەک هەست ئەڤرویێ سەردەستە، بەلێ مە هەر پەنا بریە بەر گوهی وەک ژێدەرەکێ ئەپستمولوژی. بقێ بوچونێ جیهانەکا دوئالیزم پەیدا بوویە، جیهانا پێشکەتی وەک ئەم دبینین ڤ جیهانا پاشڤەمایی وەک مە گۆهلێ دبێت. هوسا ئەم وەک پاشبەند و بەرمایێن کەساتیەکا دوتایا هەڤدژ ل دژی خو وەک مروڤ و دگەل خو وەک یەند بوویینە، گەریانا من/یێ دی د گرفتاریا باوەری و گومانا دایە، ڤی گیانێ ئالوز دبێژنێ مروڤی روژهەلات. هەکە جیهانێ بو دو جەمسەرا (روژهەلات و روژئاڤا) پارڤەکەین، ئەم بەرمایێ دو کولتور و عەقلێن ژێکجودا ینە. گیانەکێ بەرزەیێ روژئاڤا پێشکەتی و روژهەلاتا پاشڤەرویە. کەساتیا مە د ناڤبەرا ڤی نال و بزمارێ دا پەروەردە بوویە. کەساتیا مەیا روژهەلات ژ چەند کولتور، نەتەوە و ئولێن ژێکجودا پێکهاتیە. ئەم لسەر بنگەها خومالیێ خودان رەه نەهاتینە ژیانێ. تێکهەلبوونا ڤان کولتور و عەقلا ل روژهەلات لایەک دکتاتوریەت و لایێ دی ژی کەساتیەکا ڤالا و دابڕی ژ عەقلانیەتێ چێکریە. لەورا مە نەشیایە کەساتیا خو کومکەین و بکەینە کاریکتەرەکێ ساخلەم، کو بشێت بەرسنگێن پسیارێن ڤی سەردەمی بدەت و یێ دی وەک هەبوون قەبول بکەت. ژ لایەکێ بوویە قوربانێ هەڤرکیا شارستانیا، کو گرنگی دایە کێشوەرا ئەورووپا و ژ لایێ دی شورەشا ئیسلامیا سیاسی شارستانی و کەساتیا مە ژ هولێ راکریە و ئەم کرینە خودان کولتورەکێ سیوی. د ئەنجامدا ئەم بوویینە خودانێ کەساتیەکا دەسکردە، کو ئەڤرو نەزانین دەسپێک چیە و داویێ دێ چلێ هێت. ئەرەبا ب ریکا زمانێ خو، کو قورئان پێ هاتیە نڤیسین، شیانە گەلەک کولتور ڤ ئیمپراتوریەتا لسەر کیستێ یێ دی پێک بینن و هێزا زمانێ فارسی د هندێ دا بوویە تا بەری هاتنا ئیسلامێ ژی زمانێ مەزدەکیا بوویە و بوویە بناغێ شارستانیا ئەخمینی و ساسانیا ژی... چونکی هەکە فارسی ل چەرخێ رینیسانسا ئەرەبی کو لسەردەمێ ئەباسیا بو زمانەکێ ب هێز نەبا شەهناما فیردەوسی ژ دایک نەدبوو. لێ کورد وەک زمان، ئول و شارستانیەت هاتینە بوهژاندن... بزانە زمانێ سومەری تا سەردەمێ ئاشوریا ژی پشتی بوورینا چەند کولتور و شارستانیا، بەلێ هەر وەکی زمانەکێ پیرۆز دهاتە بکارئینان. زمانێ لاتینی ژی هەمان شوپ گرتبوو بەر. ئەڤ گرێینن کەنیە کەساتیا مە هند ئاڤاهیەکێ بهێز بو مە چێتەکریە، کو مە باوەری بخو هەبیت و ل داویا مە پەنا بریە بەر قەرکرنێ. بقێ گیانێ هژمۆک نە مە وەک کەسەکێ خورستی و نورمال خو دیتە و نە ژی مەیێ دی قەبولکریە. گوهورین ژ ئولەکێ ئازاد بو ئولەکی بەندکری، ژ شارستانیەکا ملاک بو ئیکا دەسکردە کەساتیەکا لەنگ بو مە چێکریە. ئەگەر داستانێن ئەڤینی کور و کچەک بن، مە نەشیایە بەرسڤا داستانا مەم و زینی بدەین، بوچی دو کور دو کچێن ئەڤیندار؟ دوئالیزما مەیا سیاسی نە ئەنجامی تیر و تەسەلیا مەیا هزریە، بەلکو نە قەبولکرنا کەسێ دیبە. هەکە ئەم لسەر فەلسەفا گومانێ پەیدا ببین و کلیلێن ژێدەرباز‌بوونێ، نە ب تیگەها عەمێ گوزی هاڤێت بن، بەلکو ب چەمکەکێ کەلە رەقی ئەم نڤشەکین بقێ خوینێ هاتینە فرشککرن. بقێ تیگەهێ ئەم نەشێین بو مفایەکێ گشتی ژ بەر یێ دی داگیرین، بەلکو بو دژی خو ئەم دشێین. چونکی مە هێشتا وەک دیروک و جڤاک خو نەنیاسیە، هەردەم گازندا مە یێ بوویە و یێ دی بو مە نەبوویە جهێ تمامکرنا، بەلکو بوویە جهێ نەکامیێ. ئەم لسەر ئول، کولتور و عەقلێ بیانی پەروەردە بوویینە ژ بەر هندێ ئەم وەک گیانەکێ هاڤی پێکهاتینە، پێکهاتنا مەزێن مە ژ گەلەک رەهنگێن سەیر و سەمەر پەیدا بوویە ڤان رەهنگا نەشیایە رەهنگەکێ بکەتە سەرکێش. یێ سەرکێشیا مە نە قەبولکرنا مە بو رێبەرەکی وەک هزرا ساخلەم ئەم ژ کاروانێ بروڤاتیێ دابرینە. هەر چەندە ژی ژیان و شارستانیەت هەر ژ نک مە وەک روژهەلات (میزوپوتامیا) سەرهلدایە. لێ پسیارەک هەرا ڤەکری بوچی ئەڤ شارستانیێن ل میزوپوتامیا (سومەری، بابل، ئاشوری و...) ژیاین وەک کولتور و زمان ژ ناڤچوون. بەلێ ئەم کورد وەک کولتور و زمان هەر ماین!؟ مە شوپێن پێغەمبەر و ئولێن خو بەری ئەنفالا ئیکێ نە نیاسینە، مە کولتور و رێکێن ژیانێ بریکا ئیسلاما سیاسی نیاسینە... مە گورێن باپیرێن خو ب گاور ل قەلەم دانینە و یێن گاور ب شەهید نیاسینە. بقێ خونیاسینێ گوڤەندا لبەر ستراتیژبوونێ، نە ب تیگەها عەمێ گوزی روژهەلات ئەم فێری هندێ نەبوویە دیروک و بویەرا بەروپشت بخوینین، بەلکو وەک دویهاڤو کەتینە ری، ئانکو کەشێ سەرکوتکرنا دەڤکا مە. ئەم فێری تەمەرودا نەکرینە. کێ (دەیکا مە مارکریە) مە ئەو ب باب زانیە. ئەڤ فەلسەفا تەپەسەرێ ئەم فێرێ پابەندیی کرینە، شورەشێن مە ژی ژ ڤی هێلی رزگار نەبوویینە! دەسەلاتێن کوردی گرنگی نەدایە ئاڤاکرنا کەسێ کورد و ریک بو یێ دی خوش نەکریە. پەیدابوونا گەلەک ئولان بوونە ئەگەرا ململانا ئیدیولوژی لسەر ئاستێ سیاسی. ڤان ئەگەرا توڤی دو بەرەکیی د ناف مە دا پەیداکر یان ئەم دشێین بێژین سروشت، ئول و سیاسیەت بوونە سەدەمێن دو بەرەکیا دناڤبەرا مروڤاندا. مادەم ئول، نەتەو و پارتا من ژ یێن دی باشترە پا ئەز ژی دێ ژ یێ دی باشتر بم بقێ تیگەهشتنێ مە ژیان فامکریە. ئەڤ پروسیسا ژ یێ دی باشتر لسەر ئاستێ هەڤرکیی نەهاتیە، بەلکو لسەر ئاستێ شکاندنا یێ دی کا دێ کی ڤی یاریا چارەنڤیس ژ یێ دی بەت. ڤی رەفتارێ ئەز و یێ دی رەدکرینە و جهێ ئیدیەما قەبولکرنا من'ێ د فەرهنگا دەڤرا مە دا نەبوویە. بقێ گیانی مە سەرەدەری دگەل ئیکودو کریە. ل دوماهیێ دڤێت وێ ژی بێژین نە بەس بتنێ خالا گەوهەری کێشا من و تە یە، بەلکو دەردێ مە یێ تابەلاڤە سەدەمێن کویرترین جڤاکی و... لپشتن.

درامانووسانی جیهان

مەهدی مید جاف ..



١٠ـ کالدرون
Pedro Calderon Barca

پیدرۆ کالدرون بێرێسا، شاعیر و درامانووسی بەناوبانگی ئیسپانی لە شاری مەدریدی پایتەختی ئیسپانیادا، لە سالی (١٦٠٠ز) لە دایک بووە. باوکی لە سەردەمی فیلیپی یەکەم و دووەمدا لە کۆشکی پاشایەتیدا خاوەن پلە و پایەیەکی بەرز بووە.

کالدرون خوێندنی سەرەتایی بە پێی خۆ و نەریتی خێزانی لە قوتابخانەیەکی ئایینی یەسووعیدا تەواو کردووە. پاشان بۆ تەواوکردنی خوێندنی بەرز لە زانکۆی سالامکا لە بەشی مافپەروەری دەستی بە خوێندن کردووە. پاشان بە نیوەچڵی وازی لە خوێندنی زانکۆ هێناوە و چووەتە ناو سوپاوە و لە شەڕی نێوان ئیسپانیا و ئیتالیادا بە شێوەیەکی زۆر ئازایانە و چاو نەترسانە دەجەنگێ و خەڵاتی پاڵەوانیەتی لە جەنگدا پێ بەبەخشرێت. پاش دوو ساڵ واز لە سوپا دەهێنێت و لە مااڵی یەکێک لە نە جیبزادەکاندا کار دەکات.

لە تەمەنی بیست ساڵیدا وەک شاعیرێک خەڵات دەکرێت و ئەمەش دەبێتە هاندەرێک درێژە بە بواری ئەدەبی بدات.

پاشان دەست بە نووسینی درامە دەکات، لە یەکێک لە شانۆنامەکانیدا زۆر بە تۆندی هێرش دەکاتە سەر دەسەاڵتدارانی کۆشک دەنووسێت. بابەتی ئەم درامانەشی لە ئەفسانە کاڵسیکییەکانەوە وەرگرتووە. زۆربەی شانۆنامەکان سادە و کورت بوون و بزگات و حاڵاتی کۆشک لە سەر شانۆی زارزوێاڵ لە کۆشدا پێشکەشی کردوون. لە دواییشدا بە ناوی درامای زارزوێاڵاوە ناسراون.

لە ساڵی (١٦٥١ز)دا واز لە کاری درامانووسی کۆشک دەهێنێت و دەچێتە ڕیزی پیاوە ئایینییەکانەوە و بۆ ماوەی دە ساڵ وەک قەشەیەک لە کەنیسەدا کار دەکات، لەگەڵ ئەمەشدا هەر لە کاری درامانووسین بەردەوام دەبێت و چەندان شانۆنامە دەنووسێت.

دەتوانین دراماکانی کالدرون بکەین بە سێ جۆرەوە:

جۆری یەکەم: دراما ئایینییەکان.

جۆری دووەم: دراما ئا ئایینییەکان.

جۆری سێیەم: دراما کۆمیدی و تراژیدییەکان.

ئەم جۆرە درامانەی ناوبانگی جیهانیان هەیە و لە ماوەی ساڵانی ١٦٢٢و١٦٤٠ نووسیونی.

یەکێک لە دراما بە ناوبانگەکانی کالدرون شانۆنامەی (ژیان خەونێکە) یە و دراماى (قازیی سالامیا) یەکێکی ترە لە کۆمیدیا بە ناوبانگەکانی.

ئەوەی شایانی باسە کە کالدرون بە یەکێک لە ڕابەر و درامانووسە پێشڕەوەکانی سەردەمی باروک دادەنرێت لە میژووی سانۆدا. هەندێک لە دراما بە ناوبانگەکانی کالدرون وەک:

●شانۆنامەی جادووگەری سەرسوڕهێنەر.

● شانۆنامەی جنۆکە.

●شانۆنامەی شازادەی کۆنستانت.

●شانۆنامەی گالیسکەی بەهەشت.

●شانۆنامەی عەشق.

●شانۆنامەی شانازی و دەسەاڵت.

●شانۆنامەی گەمارۆدانی بەردا.

●شانۆنامەی خێزانی خەیاڵی.

●شانۆنامەی ئەفسانەی عەشق.

کالدرونی مەزن لە ماوەی ژیانیدا نزیکەی ٧٣ درامای ئایینی و ١٠١ نا ئایینیی نووسیوە. کالدرونی بلیمەت و نەمر لە تەمەنی ٨١ ساڵیدا دڵە مەزنەکەی لە لێدان دەکەوێت و ماڵئاوایی لە ژیان و هونەر دەکات.

پاشماوەی: "باکووری عێراق" - بەناو کوردستانێکی ئازاد و ئارامدا



شاندی GfbV لەگەڵ عومەر فەتاح سەرۆکی حکومەتی هەرێمی کوردستان - ئیدارەی سلێمانی

بەردەگرێت: چونکە ڕێگە لە وانە وتنەوە بە زمانی ئارامی نوێ ناگیرێت، هەندێک لەو گوندانەی کە پاکتاوی نەژادییان لێکرابوو دراونەتەوە بە ئاشوورییەکان، ئەو هەڤاڵە ئێزیدیانەی کە بەهەمان شێوە ڕاونرابوون، دانیشتوانە کۆنە نوێیەکان کە بە درێژایی چەندین ساڵ لە ناوەڕاستی ئەورووپا وەک پەنابەر دەژیان، دەستیان کردووە بە دروستکردنەوەیان. هەموو لوتبەرزی و ناحەقیی و زەبر و زەنگ و ملهوڕی هەشتا ساڵەی تورک بەرامبەر بە خەڵکی کوردی بندەستکراو لە خاڵی سنوورەی خاپور هێترایە پێشچاومان: چەند سەکۆیەک بە هەمان شێوە ژووری بە کۆنکرێت "چیمەنتۆ" و چەنگەری ڕۆیو دروستکراویان لەسەر بوو، تەنیا دوو فەرمانبەر کە وادەردەکەوێت بە ئاڕەزووی خۆیان و بەڵام وەک "لەسەرەوە" فەرمانیان پێکرابێت زۆر زۆر لەسەر خۆ کارەکان کە زۆربەیان هی شۆڕشگێڕی تەنکەڕەکان و کوردی تورکیان ڕادەپەڕێنن، بەو هۆیەوە بەپێی ئەو فەرمانانەی پێیان سپێردراوە بە ئاشکرا زنجیرەی چاوەڕوانکەرانی پتر لە ٣٥ کیلۆمەتر درێژ بەرهەم دەهێنن. زۆر بە ڕەقی لەگەڵ ئەو کەسانەدا هەڵسوکەوت دەکەن کە ئەیانەوێت بچنە هەرێمی کوردی عێراقەوە (مەبەستی هەرێمی کوردستان)ە. لەگەڵ دواکەوتنی هەرچار چەند ڕۆژێک و ماندوو بوون لە ژێر پلەی گەرمای نێوان ٣٥ تا ٤٠ تەنانەت لە ڕۆژانی دوایی ئۆکتۆبەریشدا هێشتا ئەو کاروانە بۆ ئەو کوردە هەژارانە هەر سوودمەندە، چونکە نەوت لە عێراق هەرزانە بەڵام سوپای تورکی تەواو بێمەڵانە زیان بە ئابووری داڕوخاوی خۆیان دەگەیەنێت.. مەبەستی بنەڕەتی ئەوەیە کە بە توندی ڕێگە لەو هاوسێ بەشە دەوڵەتە کوردییەی ئەوبەر زۆبارەکەوە بگرن کە بەرەو سەرکەوتن هەنگاو دەنێ. هێشتا بە تەواوی لە پردەکەی سەر ڕوبارەی سنووری هێزل بەرەو کوردستانی عێراق نە پەڕیبوونەوە کە دیمەنەکە بەتەواوی گۆڕا، کۆمەڵێک باخچەی گوڵی زەنوێر لەبەردەم ئوتێلێکی تازە دروستکراودا و، چەن چێشتخانەیەک و هەروەها چەند فوارەی ئاو لەناو پارکێکی نوێدا پێشوازییان لێکردین، لە ژێر تابلۆیەکی گەورەی سەرکردەی نەمری کوردامستەفا بارزانی؛ بوویە بینەری ئەوەی کە چۆن فەرمانبەری سنوور ڕێک و پێک و ڕووخۆش خێرا کار ڕادەپەڕێنن. هێندەی کە سەرنجەکانمان پڕۆژەتیف و باش بوون لە خاڵی سەرسنوور، بەو شێوەیەش کوردستانی ئازاد و ئارام خۆی نیشاندین کە ئەمڕۆ بە ڕەسمی بەشێکی دەوڵەتی عێراقە. لێرە گەشەی ئابووری سەروەرە، لە هەموو شوێنێک خانوو دروستدەکرێت. بۆ بیۆەژنانی شەهید و خاوەن کۆڕاوەکانیش کۆمەڵگە و خانووی نوی بنیاتدەنرێن. هەڵمەتێکی مەزنی ڕواندنی نەمام و دروستکردنەوەی جەنگەڵ لە حەوت ساڵ لەمەوبەرەوە دەستپێکردووە، جادە و ڕێگا و بانی نوێ سەرتاسەری وڵاتی گرتۆتەوە. لە ئوتێلە کوردییەکاندا زۆر عەرەبی دەوڵەمەند بەرچاودەکەون کە لە خوار و و ناوەڕاستی عێراقی بە جەنگ هەژاوەوە هاتوون دەیانەوێت لێرە بە ئارامی بێنەوە سەرخۆ. کوردستانی عێراق ئەمڕۆ بڕێتییە لە ٣٦٠٠٠ کیلۆمەتری چوارگۆشە، نزیکەی هێندەی سویسرا گەورەیە و، وەک ناوەڕاستی ئەوروپاش ئارامە، ئێمە لەگەڵ سەرۆکی هەردوو گەورەترین زانکۆی هەولێر و سلێمانی کۆبوینەوە، شیوازی ئەندازیاری زانکۆی سەلاحەدین لە هەولێری پایتەخت سەرنج ڕاکێشە، زۆر پێشکەوتوو" مۆدێرن"ە و لەگەڵ ئەوەشدا هاوئاهەنگی لەگەڵ داب و نەریتدا لێدەڕەوشێتەوە. ڕێژەی کچان لەناو ٢٥٠٠٠ خوێندکاری کوردەکاندا" ٥٤٪ " ە زمانی خوێندنیش کوردی و ئینگلیزی و عەرەبییە. ٨٠٠,٠٠٠ قوتابی بەزمانی کوردی دەخوێنن. ئێمە هەروەها لەگەڵ سەرۆک شارەوانییەکان و نوێنەرانی گەلە بچوکەکانی کلدۆ ئاشووری و تورکمانیش وتوێژمان کرد، ئەوانیش سیستەمی خوێندن و میدیای تایبەتی خۆیان بە زمانی خۆیان هەیە. ئێمە سەردانی " لالش " مان کرد کە دێرینترین ناوەندی پیرۆزی ئێزیدیانە و، لەوێ چاومان بە "میر"یان میر تەحسین بەگ کەوت، کە دەبوو تا ئێستا لە بەغدا بژیایە. ئەو داوادەکات ناوچەی شەنگار کە ٥٠٠,٠٠٠ لە برا کوردزمانە هاودینەکانی ئەوی لێدەژی بخرێتە سەر بەشە کۆمارەکەی کوردستان (مەبەستی هەرێمی کوردستان)ە، هەتا ئێستا لە بندەستی سەدام حوسێندا ژۆر ئازاریان چێشتووە و بوونەتە قوربانی ڕاگوێزانی ژۆردەملیی و خزێنراونەتە ئۆردوگای ژۆرەملییەوە کە بە چیمەنتۆ دروستکراوە، ئێستا ئەو کۆمەڵگە دێرینە ئایینیە نامەسیحی و نا موسڵمانە کوردیزمانە دەستپێکردووە بەوەی کاروباری بگرێتە دەستی خۆی. بۆ یەکەمجارە لە مێژووی عیراقدا کە ئێزدی لە حکومەتی هەرێم و هەروەها لە بەغدایش وەزیریان هەبێت. ئەوە هەنگاوێکی مەزنە بەرەو پێشەوە بۆ ئەو کەمینەیە کە لە لایەن پارتی دیموکراتی کوردستان KDP و یەکێتی نیشتمانی کوردستان PUKوە سەپێنراوە. شەنگاریش وەک شاری گەورەی خاوەن نەوت کەرکوک، بەڵام ئەو ناوچەیەی دەوروبەری خانەقین و بەرەوخوارتر تا مەندەلی دەکەونە ناو ئەو (سێبەکە) ناعەرەبییە لە لایەن سەدامەوە داگیر کراو و پاکتاوی نەژادی لێکراوەی باکووری عێراقەوە کە زوو لە پێش هەموانەوە کورد، بەڵام کلد و ئاشووری مەسیحیش لێرە نیشتەجێبوون (ژیاوون). لە کاتێکدا کە هەرێمی پارێزراوی کوردستان لە ساڵی ١٩٩١ەوە دەستی پارتی بەعسی نەدەگەیشتی، بارودۆخی مرۆڤی ئێرە لەژێر دەسەڵاتی سەدامدا زۆر ناهەموار بوو، شەپۆل لە دوای شەپۆل بەزۆر دەردەکران ئاوارەنران و دوور دەخرانەوە) لەم ماوەیەدا بە سەدان هەزار کەس گەڕاونەتەوە، هێندێک لەو ناوچانە ئێستا ئارامە، لە هێندێکی دیکەیان وەک کەرکوک بەشێک لە ئانیشتوانە عەرەبە هاوردەکان دەیانەوێت ڕێگە لە گەڕانەوەی دانیشتووە کوردە بنەڕەتییەکان بگرن هێرش و بزمبگوزاری ڕووداووی ڕۆژانەن، لەگەڵ ئەوەشدا ڕاپۆرتەکانی جێگرە کوردەکەی پارێزگاری کەرکوک حەسیب ڕۆژبەیانی و نوێنەری خاوەن دەسەڵاتی پارتی دیموکراتی کوردستان لە ئەنجوومەنی شاری کەرکوک کەمال هەروەها ئاسووری و زۆر لەو تورکمانانەش کە وتوێژمان لەگەڵدا کردن، کەمێک گەشبینن. لەگەڵ عەرەبە کۆنەکانی شاری کەرکوک پیاو ڕێدەکەوێت. گەڕاوەکان پێش هەموو شتێک ترسیان لە دەستێوەردانی تورکیا هەیە کە بەشێک لە تورکمانەکان بکاتە ئامێری دەستی خۆی بۆ ئاژاوەنانەوە، پێشتر کوردە نیوەی دانیشتوان و تورکمان چوارەکی دانیشتوان و ئاشوریی ٦٪ دانیشتوانی شاریان پێکدەهێنا، بۆ شار و هەروەها بۆ پارێزگای کەرکوک کە بە دەیان هەزاران و لەناو خێمە و کەلاوەدا ژیانی ناخۆش دەبەنە سەر لە پێش چاو ناگیرێت. هەڤاڵە کلد و ئاشوریەکانمان، بیت نەهرەمین ڕۆمێز هەکاری سکرتێری گشتی پارتی دیموکراتی،سالم کاکور جێگری سەرۆکی پڕووتنەوەی دیموکراتی ئاشووری و سەرۆکی شارەوانی شارۆچکەی بە تەنیا کلد و ئاشووری نشینی عەینکاوە لە ڕاونانی دیانەکانی باشوور و ناوەڕاستی عیراق تۆقیون، هەتا ئێستا چوارەدە١٤ خانەی خوادی سەر بە دیانەکان بە هێرشی بۆمبا گاولکراون. بە لایەنی کەمەوە ٢٠٠ دیان"مەسیحی" ەلە لایەن تیرۆریستانەوە کوژراون، هەندێکیان سەربڕاون وCDی ئەنجامدانی کوشتنەکەیان لە بازارەکاندا فرۆشراون. کەسانێک دەیانەوێت پتر لە ٧٠٠,٠٠٠ دیان لە وڵات وەدەرنێن، شاری بەسرا لەم ماوەیەدا دیان ی تێدا نەماوە، دەشێ هەر هەموو ٤٠٠٠ خێزانە کلد و ئاشوریەکە بوینە پەنابەر (رایانگردبێت) بە پێی چەند ئاماری جۆر بە جۆر نزیکەی ٤٠,٠٠٠ تا ٧٠,٠٠٠ دیان عێراقیان بەجێهێشتووە و هەڵاتوون بۆ سوریا و ئەردەن و کوردستان. بەڕێوەبەرایەتی کوردی دەستێکردووە بە نیشتەجێکردنی ئەو خێزانە پەنابەرانە، یەکێتی نیشتمانی کوردستان puk پارچە زەوی و کەرەسەی خانوو دروستکردنی پێدان، پارتی دیموکراتی کوردستان یارمەتی کۆمەڵایەتییان دەداتێ وانە ماڵگەیەکی بۆ بڕیونەتەوە بۆ ئەوەی پێی بژین. کۆمەڵەی گەلاتی هەرە شەلێکراو(GfbV)دوای گەڕانەوەی شاندەکەی بە نووسین داوای یارمەتی لە وڵاتانی ڕۆژئاوا و یەکێتی ئەورووپا کرد بۆ نیشتەجێکردنیان لە باکووری عێراق. وتووێژەکان لەگەڵ کێژان و کۆرانی لاوی ڕێکخراوە جەماوەرییە نوێیەکاندا ژۆر سەرنجڕاکێش بوو، ئاڕەزووی پێکەوە کارکردنیان هەیە، دەیانەوێت " کۆمەڵەی گەلانی هەرەشەلێکراو" وەربگرن لە تۆرەکەیاندا .. تۆڕی ڕێکخراوە نا حکومییەکانNGO. سەردانی بیۆەژنەکانی دۆڵی بارزان ژۆر خەمناک بوو، لەوی GfbV ١٩٩١ تا ١٩٩٣ کارگێڕی دروستکردنەوەی ٥٠ گوندی کاولکراو بوو. فازیلە مەیسەقیج بەڕێوەبەری GfbVی بۆسنیا چەند وشەیەکی ڕاستەقینەی بەسۆزی دۆزییەوە و ئاراستەی ئەو ژانەی کرد کە بەهۆی کۆمەڵکوژییەک لەلایەن سەدامەوە سالی ١٩٨٣ هەشت هەزار لە کوڕان و پیاوەکانیان لەدەستدا. فازیلە لە شاری سیربرینیتسا چالاکە و کار بۆ خێزان و لە پاش بەجێماوانی بە لانی کەمەوە ٧٨٠٠ کوڕ و پیاوی کوژراوی ئەو شارە دەکات. لەبارەی کارو چالاکییەکانی خۆیەوە بۆ بیۆەژنەکانی بۆسنیا قسەمان کرد. ئەو باسە ئەنجامێکی گەورەی بەدەستهێنا چونکە چارەنووسەکان وەک یەکن، منداڵانی قوربانیانی دۆڵی بارزان پێکەیشتوون واتە گەورە بوون؛ مرۆڤی کارن، سەردانی پێشانگاکەیانمان کرد کە پتر لە ٢٠٠٠ تابلۆی بە دواداگەڕان - وێنە، ناو، تەمەن، ناونیشان - ی قوربانییانی تێدا بوو لە ناوایاندا وێنەی قوربانیانی دیان ی گوندێکی دۆڵی بارزان و بڕیاری پێکەوە کارکردنماندا.هەروەها "ناوەندی ئەنفال" ڕێکخراوی قوربانیانی "ئەنفال" دەیانەوێت لەگەڵ لقی GfbV ی نوێ لە باکووری عێراقەوە کاربکەن، بەهۆی هێرشی "ئەنفال" ی سەدامەوە ١٨٢,٠٠٠ کەسی سڤیل کوژران کە بە هێرشی کیمیایی باران دەستپێکرد. بەکارهێنانی چەکی کیمیایی تەنها لەبەر ئەوە بە ئەنجام گەیشت چونکە (کۆمپانیا ئەڵمانی و ئەورووپییەکان یارمەتی دروستکردن) یان دا. GfbVی باکوری عێراق/ کوردستان لە داهاتوودا دەیەوێت یارمەتی ڕێکخراوەکانی کەسوکاری ٥٠٠,٠٠٠ کەس لە قوربانییانی گەلکوژی بدات، ڕژێمی بەعس/ ئەوەندە کورد و لەگەڵ ئەوانیشدا ئێزدی و کلد و ئاشوری لە ماوەی ٣٥ ساڵدا لەناو بردووە GfbV دەیەوێت بەردەوام بۆ هێنانەدی مافی گەلە بچکۆلەکان و ئاوارە گەڕاوەکان کاربکات و لە بارودۆخی ئەو کۆمەڵە گەلانەش بکۆڵێتەوە کە لە ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاست هەڕەشەیان لێدەکرێت. ئێمە - ماریا سیدۆ کە کوردێکی خاوەن ناسنامەی ئەڵمانییە لە بۆن و لە ساڵی ١٩٧٢وە لە ناو GfbVدا چالاکە، فازیلە مەیسەقیج لە ساراییڤۆ، سوڵەیمان یەلدرم لە گیرتینگن، کەمال سیدۆ ڕۆژنامەوانی تەڵەفزیۆنی، دانیال بیزگە لە ڤاندۆرف، خالید حەنتا شاوێ ئاشوری کلدانی و نووسەری ئەم بابەتە لە ڤیسبادن - لە هەموو شوێنێک پڕ بە دڵ پێشوازیمان لێکرا. بینینی وڵاتێک لە دوای ساڵانێک لە ڕاگوێزان و گەلکوژی کە هەردەم پتر بەرەو ئاساییبوونەوە دەگەڕێتەوە و تامی ئاشتی دەچێژێت، هەستکردن بوو بە پاداشتێک بۆ پتر لە ٣٠ ساڵ کارکردن لە لایەن GfbV وە و بە تایبەتی چەند هەزار ئەندام و بەخشندە و هاریکارەکان کە هۆگارێ ئەنجامدانی ئەو کارانە بوون بۆ پاراستنی مافی مرۆڤ لە کوردستان. هەموو ئەو کەسانەی وتوێژمان لەگەڵدا کردن، دڵنیایان کردین کە هاریکاری نووسینگەی نوێی GfbV دەکەن. نێچیرڤان بارزانی سەرەک وەزیر، دکتۆر ناسیح غەفور ڕەمەزان سەرۆکی فراکسیۆنی KDP لە پەرلەمان،کەمال فوئاد سەرۆکی پەرلەمان،فازیل میرانی سکرتێری م.س KDP، هەر سێ وەزیری ناوخۆ و مافی مرۆڤ، ڕێکخستنی کاروباری مرۆڤایەتی حکومەتی هەرێم لە هەولێری پایتەخت. بەختیار ئەمین وەزیری مافی مرۆڤی عێراق ، کە ئێمە لە ساڵی ٢٠٠٢ دا وەک بەرپرسێکی مرۆڤ پارێز لە بەرلین پێکەوە کۆنفرانسێکی ڕۆژنامەوانیمان سازدا ، گووتی: ئێمە پێویستیمان بە ئەو "ڕێکخراوی پاراستنی مافی مرۆڤ"ەی ئێوە هەیە کە ماوەیەکی ئەوەندە درێژە بە ئازار و مەینەتی خەڵکی ئێرەوە خەریکە، لە هەرێمەکەماندا بۆیە ئێوە لێرەوە ڕەخنەگرانە هاریی کارەکانمان بن. بە خەم و پەژارەوە یادی چەندین هەزار قوربانی تیرۆر لە ناوەڕاست و باشووری عێراق دەکەینەوە، هیوادارین کە ئەوانیش وەک دانیشتوانی کوردستانی عێراق هەمان ئاسایش و هەمان ئاشتی بچێژن کە بۆ هاوڵاتییەکانی باکووریان ڕەخساوە. دەبێ ئامانجە بەوەش بدەین کە تەڵەفزیۆنی کوردی هاوڕێی گەشتەکەمان بوو و ڕۆژانە هەواڵی وتوێژەکانمان و سەردانەکانمانی لەگەڵ ڕێکخراو و ناوەندەکاندا بڵاو دەکردەوە. لە هەولێر نووسەری ئەم بابەتە لە لایەن یەکێتی ژنانی شۆڕشگێڕی وتاریک - کە ناونیشانەکەی " گەلکوژی لە جیهاندا" لە ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاستدا، چۆنییەتی خەباتکردن دژی و سزادانی تاوانبارەکانی.

تیمان تسیواش سەرۆکی کۆمەڵەی گەلانی هەرەشەلێکراو - نێونەتەوەیی

سوڵێمان یەلدرم - یاریدەدەری مافی مرۆڤ

ئۆکتۆبەری ٢٠٠٤

پاشماوەی یاسای نوێی ئەڵمانیا بۆ.....

دژێ خایەن لە شوێنێکدا جێگیر ببێت.

لە یاسای نوێ دا یاسای یەکەم زیاتر نرخ و بایەخی هەیە. لە ساڵی ٢٠٠٥ وە هەموو بێگانەیەکی دانیشتووی ئەڵمانیا کە ماندەوەی یاسایان پێبەخشراوە، بە شێوەیەکی ئۆتۆماتیکی یەکێک لەو دوو مافەی بیرەوەی پێدەدرێت.

بەو کەسانەی تاکو ئێستا مافی پەنابەری، دیاری کراویان ماددەی(٥١ و ٥٣)هەیە، یان بەهۆی خوێندنەوە مافی ژیانیان هەیە لە ئەڵمانیا یان مافی مرۆڤایەتی و کۆمەڵایەتیان پێ بەخشراوە ،ئەمانە مافی ماندەوەی شێوەی دووەم

وەرئەگرن.

ئەو کەسانەی ماندەوەی نادیاریان هەیە (ماددەی ٢١٦ مافی ماندەوەی شێوەی یەکەم وەرئەگرن. کە بەئاسانی مافی کارو بازرگانی ئازاد بە جۆری یەکەم بەخشراوە.

لە یاسای نوێدا ئەوانەی مافی پەنابەری سیاسیان پێ دەدرێ، گرنگ نییە لە ڕێگەی ئاسمانی یان ووشکی هاتبنە خاکی ئەڵمانیا، هەردوو شێوە بە پەنابەری سیاسی دەناسرێن.کە لە دەستووری کۆندا ڕێگەی ئاسمانی ماددەی ١٦لە یاسای پەنابەری سیاسی بۆ دائەنرا.ڕێگەکانی تر ماددەی ٥١ و ٥٣ یاسای پەنابەری وەرئەگرت.

لە پەیوەندی هێنانی ژن و منداڵ یاسای نوێ دارژراوە،جاران دابین کردنی ژیانی خێزان مەرجێکی سەرەکی بوو کە لە یاسای نوێ دا لابراوە.

خاڵێکی گرنگ چەسپاوە بۆ ئەو منداڵانەی کە کاتێک لەگەڵ باوک و دایکیاندا هاتونەتە ئەڵمانیا، تەمەنیان لە ١٨ساڵ کەمتر بووە، تاکو ئێستا وەک پەنابەر نەناسراون، چونکە ئێستا لە قوتابخانە و زانکۆکاندا قوتابین بە پێی یاسای نوێ مافی مانەوەیان پێ دەدرێ.

بۆ ئەو کەسانەی لە ئایندەدا دەبنە پەنابەر لە ئەڵمانیا، دوای وەرگرتنی مافی شێوەی دووەم، ئەبێت لە خولێکی خۆ ساز دان و ئاشنا بوون و تێکەڵ بوون، بە زمان و یاساو داب ونەریتی کۆمەڵگای ئەڵمانی بەشداری بکەن.خەرجەکەی لە لایەن دەوڵەتەوە دابین ئەکرێت.

بۆ ئەو کەسانەی گەرێکن و بە مەبەستی گەشت وگوزاری دێنە ئەڵمانیا یاسای نوێ ڕەچاو کراوە، بۆ نموونە دەتوانن پسوڵەی ٥ ساڵە وەر بگرن بۆ هاتنە ناوەوە، بە مەرجێک هەر جارەی زیاتر لە ٣ مانگ نەمێننەوە، تا سەفەری داهاتوو نابێت کەمتر لە ٦ مانگ بێت.

بە پێچەوانەی پرۆپاگەندەی ناو خەڵکی، لە یاسای نوێدا بە هیچ شێوەیەک باسی ئایندە و چۆنییەتی مانەوەی ئەو کەسانە ناکات کە لەم چەند ساڵەی دواییدا داوای مافی پەنابەریان کردووەو تا ئێستا چارەنووسیان نادیارە.

ئەمانەی سەرەوە تەنها چاوخشاندن بوو،بۆ زیاتر شارەزایی لە خاڵەکانی ئەم یاسایە تایبەتمەندییەکانی، باشتر وایە پەیوەندی بکرێت بەوانەی پسپۆرو شارەزان و لە نزیکەوە لێ گەڵیاندا ڕاوێژو گفتو گۆ بکرێت.

دۆزینەوەی گۆڕێکی گەورەی بەکۆمەڵ لەنزیک سلێمانی



سەرلەبەیانی ڕۆژی شەممەی ڕابردوو گۆڕێکی گەورەی بەکۆمەڵ لەنزیک سلێمانی دۆزراوەتەوە، کە مەزەندە دەکرێت تەرمی نزیکەی ٥٠٠ قوربانیی تێدا بێت. گۆڕەکە دەکەوێتە دیوی دەرەوەی شەقامی شەست مەتری نزیک پردی دەباشان (ڕێگەی چوارتا) و بەپێی زانیارییە سەرەتاییەکان بۆ ساڵانی هەشتاکان دەگەڕێتەوە. وەزارەتی مافی مرۆڤ (ئیدارەی سلێمانی) کەسوکاری ئەو قوربانییانەی ئاگادار کردۆتەوە کە تاکو ئێستا ئاسەوارێکیان نییە تا لەکاتی هەڵدانەوەی گۆڕەکەدا کەسوکاری خۆیان بناسنەوە.

عەلی کیمیاوی یەکەم کەس دادگایی دەگرێ

حازم شەعلان وەزیری بەرگری عێراق ڕایگەیاند کە عەلی حەسەن ئەلمەجیدی ناسراو بە عەلی کیمیاوی و ئامۆزای سەدام یەکەم کەس دەبێت کە دادگایی دەکرێت. هەروەها گوتی: "دادگایی نێوبراو لە چەند ڕۆژێی داهاتوودا ئەنجام دەدرێت"، بەڵام وەزیری بەرگری ئەوەی ئاشکرا نەکرد کەی سەدام حوسین دەدرێتە دادگا؟ عەلی کیمیاوی چەند تاوانێکی گەورەی بەرەوڕووکراوەتەوە، لەوانەش کیمیابارانکردنی هەڵەبجە لە ١٩٨٨ و کوشتنی بەکۆمەڵی خەڵکی عێراق. شایانی باسە لە مانگی نیسانی ٢٠٠٣ دا ئەمریکیەکان پێیان وابوو کە عەلی کیمیاوییان کوشتووە لە بۆمبارانکردنی شاری بەسرەدا. بەڵام لە مانگی ئابی ٢٠٠٣دا لەلایەن سوپای ئەمریکاوە دەستگیر کرا.

UN داوا دەکات ئاوارەکانی کوردی ڕۆژهەڵات وەک پەنابەر وەربگیرێن

ئاژانسی نەوەتە یەکگرتووەکان بۆ کاروباری پەنابەران UNHCR داوای لە وڵاتان کرد کە مافی پەنابەری بدەن بەو ٩٠٠ ئاوارەیەی کە ڕۆژبەیان کوردی ڕۆژهەڵاتی کوردستانن و ماوەی ١٨مانگە لە ئۆردوگای (ئەلکەرامە) کە دەکەوێتە نێوان عێراق و ئوردون دەژین. هەروەها ئاژانسەکە گوتی هیواداربن چەند وڵاتێک ئەم ٩٠٠ کەسە بگرنە خۆیان و مافی پەنابەریان بدەنێ، چونکە ئەم هاووڵاتیانە کە لە بەهاری ٢٠٠٣) عێراقییان بەجێهێشتووە هەڵاتوون، ئێستا لە باروودۆخێکی زۆر خەراپدا دەژین. ئاوارەکانی کوردی ڕۆژهەڵات لە سەرەتای ئەم مانگە لە لایەن تیرۆریستانەوە پەلامارەدران و ئۆتۆمبێلێکی مینڕێژکراو لە نزیک ئۆردوگاکە لە لایەن هێزەکانی ئوردنەوە پوچەڵ کرایەوە. دوای ئەم ڕووداوەش هاریکاری لە ئاوارەکان برا و داموودەزگاکانی ئوردن و خزمەتگوزاریی تەندروستی بۆ ماوەی چەند ڕۆژێک بە بیانووی نەبوونی ئەمنییەت لەو شوێنە سەردانی پەنابەرانیان نەدەکرد. لەبەرامبەر ئەمەشدا ئاوارەکانی کوردی ڕۆژهەڵات بە مەبەستی ناڕەزایی دەربڕین، لە بەردەمی بارەگای (UNHCR)دەستیان بە مانگرتن کرد. بۆیە پێدەچێ ئەم هەنگاوەی UNHCR لە وەڵامی خواستی ئاوارە کوردەکاندا بێت. شایەنی باسە کە پێشتر لەسەر بڕیاری نەتەوەیەکگرتووەکان وڵاتی سوید مافی پەنابەری بە ١٨٥ کەس لەو ئاوارانە بەخشی و ئێستاش پاشماوەی ئەو کوردانە چاوەڕێی ئەوەن کە وڵاتێکی دیکەش مافی پەنابەرییەتیان بداتێ.

پۆلیسی ئەڵمان "سەنتەری کۆمەڵەی کوردستان"ی لە شاری دوویسبۆرگ کۆنترۆڵ کرد

ڕۆژی ٢٠٠٤/١٢/١٤ هێزێکی زۆر لە پۆلیسی تایبەتی ئەڵمانی سەنتەری کۆمەڵایەتی پشتیوانی کوردستانیان لە شاری دوویسبۆرگ بۆ ماوەی دوو سەعات کۆنترۆڵ کرد و تەواوی سەنتەرەکەیان لە سەعات ٤ تا سەعات ٦ ئێوارە پشکنی. لە ئاکامدا هیچ شتێکی تەوتۆیان لە سەنتەرەکە نەدۆزیوە. شایەنی باسە ئەم سەنتەرە شوێنی بە یەک گەیشتنی برا کوردەکانی باکوورە.

Impressum
خاوەنی ڕۆژنامە
Peyama Kurd Verlag
Peyama Kurd
Thomas-Mann-Str. 22
53111 Bonn / Germany
Fon: +49 (0228) 18 00 654
+49 (0228) 18 00 655
Fax: +49 (0228) 18 00 656
www.peyama-kurd.com
info@peyama-kurd.com
دەستەی نووسەران
گرمانجی ژێدەر
بانا عەلی، فیلۆس فایەق، زەکەن هەژیز، نزار جاف، جوتیار دارفۆش، مەنسوور سیدانی
دەستەی چوارنایی
گرمانجی ڤۆدی
فادل شەرجیل، بێروان حاجی بەرۆژ، سلێمان ئاشتیانی، ڕێبەر کەمال
کردنی ڕۆژاکی
سەبەدخان ئۆرەمێش
پەیامی کورد بە مافی خۆی دەزانێ کە کەس بابەتانەی پێی دەگات کورت بکاتەوە و لە بارەی ڕۆژنامەی ڕابردوو کاتەوە و بابەتی بڵاوکراوە لەدەستی چاپ بەجێ بهێڵێت. پەیامی کورد ئاوڕ لە بابەتانەش دەداتەوە کە بڵاو و هێزێی نابەجێی تێدابە بڵاو نەکاتەوە.

فەرەنسا : دەبێت تورکیا دان بە قەتڵوعامی ئەرمەنەکاندا بنێت



میشێل بارنییە وەزیری دەرەوەی فەرەنسا، دووشەممەی ڕابردوو لە بڕۆکسێل ڕایگەیاند کە وڵاتەکەی لە تورکیا خوازیارە دان بەو قەتڵوعامەی ئەرمەنەکاندا بنێت کە ساڵی ١٩١٦ لەسەروبەندی جەنگی جیهانیی یەکەمدا و لەسەر دەستی دەسەڵاتدارانی ئەوکاتی تورکیای عوسمانیدا ڕوویدا. بارنییە ڕایگەیاند کە وڵاتەکەی وا چاوەڕوانە، لەچوارچێوەی دانوستانەکانی ئایندەی نێوان یەکێتی ئەورووپا و تورکیادا، دەربارەی پەیوەستبوونی ئانکەرە بەو یەکێتییەوە، دان بەوەدا بنرێت کە لەو ڕۆژگارەدا قەتڵوعامێک دەرهەق بە ئەرمەنەکان ئەنجامدراوە. وەزیری دەرەوەی فەرەنسا لە لێدوانێکیدا بۆ ڕۆژنامەوانان گوتی "فەرەنسا لەچوارچێوەی ئەو دانوستانە چاوەڕوانکراوەدا پێ لەسەر ئەو مەسەلەیە دادەگرێ". چونکە، وەکو بارنییە گوتی "پرۆژەی یەکێتیی ئەورووپا لەسەر بیرۆکەی ئاشتەوایی نێوان دەوڵەتە ئەندامەکانی دامەزراوە". هەروەها گوتی "پێویستە تورکیاش لەپێناوی ئاشتبوونەوە لەگەڵ مێژووی تایبەتی خۆی و زیندووڕاگرتنی ئەو یادەوەرییەدا، بەو ئەرکە هەستێ و دان بەو کارەساتەدا بنێ کە دەیان هەزار کەسی تێدا بوونە قوربانیی". وەزیری دەرەوەی فەرەنسا کە بۆ کۆبوونەوەی وەزیرانی دەرەوەی وڵاتانی نێو یەکێتیی ئەورووپا چووبووە بڕۆکسێل، دەربارەی ئەو قەتڵوعامە قسەی دەکرد کە ساڵی ١٩١٦ لە دەورانی جەنگی جیهانیی یەکەمدا لەلایەن دەسەڵاتدارانی ئەوکاتی ئیمپراتۆرییەتی عوسمانییەوە دەرهەق بە ئەرمەنەکان ئەنجامدراوە و تێیدا سەدان هەزار کەس بوونە قوربانی و سەدان هەزاری دیکەشیان پەراگەندەی وڵاتانی ناوچەکە بوون. دەسەڵاتدارانی تورکیا تاکو ئەمڕۆش نکوڵیی لەو ڕووداوە دەکەن و ناچنە ژێربارێ دانپێدانان بەو تاوانەدا.

هەنگاوی یەکەمی هێرشی ئەمریکا بۆ سەر ئێران: بەیەک ڕۆژ سوپای پاسداران لەنێودەبردرێت

ڕۆژنامەی "الشرق الاوسط" بەشێک لە سیناریۆی هێرشی ئەمریکا بۆ سەر ئێرانی بڵاوکردۆتەوە کە لەلایەن پلاندانەرانی ئەمریکا داڕێژراوە، بەپێی پلانەکە هێرشەکە لەسێ قۆناغ پێکدێت، لە قۆناغی یەکەمدا سوپای پاسداران تەفروتونا دەکرێ کە بەڕۆژێک کۆتایی دێت. لە قۆناغی دووەمدا بۆردومانی کووڕە ئەتۆمیەکان دەکرێ کە لە ٣٠٠ کووڕە پێکدێن و ١٢٥یان پەیوەندییان بەچەکی ئەتۆمی و کیمیایی و بایلۆژی هەیە. قۆناغی سێیەمیش لەشکرکێشی سەربازانی ئەمریکایە لە ٥ ئاراستە کە لەکەنداو و عێراق و ئازربایجان و جۆرجیا و ئەفغانستان سەرچاوە دەگرێ و دواجار بەرەو تاران دەچن کە پێشبینی دەکرێ تەنها ٢ هەفتە بخایەنێ، بەڵام ناچنە ناو تاران، یەک لەدانەرانی ئەو پلانەش ناوی سامە گاردنەرە کە بەر لە ٢٠ ساڵ پلانی هێرش کردنە سەر عێراقی دانابوو. لەسیناریۆکەدا ئەگەری ئەوەش دانراوە کە لەوانەیە بەر لەجێبەجێکردنی ئەم هێرشە ئێران دەستی خۆی بوەشێنێت و گوزرێک لە هێزی ئەمریکا لە کەنداو بدات و بەرەیەکی شیعە لەعێراق لە دژی ئەمریکا پێکبهێنێت.

مشتومڕی وەزیرانی ناوخۆیی وڵاتانی هاوسێی عێراق

لە تاووتوێکردنی کێشەی عێراق و هاوپەیمانان..لە کۆبوونەوەی وەزیرانی ناوخۆیی وڵاتانی هاوسێی عێراق، مشتوومرێک ڕوویدا بە جۆرێک کە هەر دوان و سیانیان کەوتبوونە دەمەقاڵە و هەر ئەوەی مابوو پەلامری یەکتری بدەن، یەکێک لەو ڕووداوانەش لە زمانی خودی وەزیرانی بەشدار گواستراوەتەوە کە موسەوی لاری تێیدا کەوتە هەڵوێستێکی شەرم ئامێزەوە ئەوەبوو کە وەزیری دەرەوەی کوەیت گوتی: ئەگەر بە یەک وشە دەستێوەردانی ئەمریکا لە عێراق و ئەفغانستان پڕۆتستۆ بکەن، ئوردن و تورکیا و میسریش هەمان شتیان دووبارە کردەوە. هەوڵەکانی دەسەڵاتدارانی ئێرانی بۆ گۆڕینی ئەم هەوڵێستە بێ ئەنجام بوو، ئەمە لە کاتێکدا بوو کە مشتوومڕی موسەوی لاری و جێگری سەرەککۆماری عێراق ئیبراهیم جەعفەری گەیشتبووە ئەوپەڕی؛ جەعفەری بە توندی بە موسەوی لاری گوت ئێوە گرفتی ئێمە تێناگەن و دەتانەوێت بۆ ئێوە هەموو دنیا لە خۆمان بڕەنجێنین. بڕیار وابوو وەزیرەکان سەردانی خامنەئی بکەن بەڵام دوای ئەم دەمەقاڵێیەی (موسەوی لاری و جەعفەری) سەردانەکە لە بەرنامەدا لابرا، وەزیرە تورکەکەش گووتبووی: سوپاس بۆ خودا کە لە زەحمەتی پێڵاو داکەندن و عەزابی مەراسیمی دیتنی ئەو(واتە خامنەئی) ڕزگارمان بوو.یەکێک لە ڕۆژنامەکانی ئێران ئەم کۆبوونەوەیەی لە کۆبوونەوەکەی شەرم ئەلشێخ بە گەنتر لە قەڵەمدا و یەکێک لە پارێزگارانی ئێرانیش داوای ڕوونکردنەوەی زیاتری لە وەزیرەکەیان کردووە، ئامارۆی بەوە داوە کە پێشتریش لە لایەن دەسەڵاتی باڵاوە پێڕاگەیەنراوە کە لەم کێشانەدا زۆر خۆ نەباتە پێش.

سەرچاوە: ڕۆژنامەی نیمرۆز
ژمارە ٨١٢، ٢٠٠٤/١٢/٨

ڕاگەیاندنی مەکتەبی سیاسیی ی.ن.ک بە بونەی کۆچی دوایی دکتۆرکەمال خۆشناو

بەداخ و کەسەرێکی زۆرەوە مەکتەبی سیاسیی یەکێتیی نیشتمانیی کوردستان کۆچی دوایی تێکۆشەری ماندوونەناس و ئەکادیمی ناسراوو هەڤاڵی دێرینمان ئەندامی پێشووی مەکتەبی سیاسی کاک دکتۆر کەمال خۆشناو سەرۆکی زانکۆی سلێمانی بەهەموو لایەک ڕادەگەیەنێت، کە ئەمڕۆ (٢٠٠٤/١٢/١٢) بەهۆی نەخۆشییەکی کوشندەوە لە وڵاتە یەکگرتووەکانی ئەمریکا کۆچی دوایی کرد. کۆچی دوایی ئەو پیاوە تێکۆشەرەی بوارەکانی خەباتی شاخ و شارو خەباتی دیپلۆماسی و خزمەتکردنی زانست و زانیاری لە زانکۆدا، بۆشاییەکی گەورە لەنێو ڕیزەکانی کوردایەتی و کوردەواریدا بەجێ دەهێڵێ، کە پڕکردنەوەی وا ئاسان نابێ، ئەو هەڤاڵە دێرین و ماندوونەناسەمان کە هەموو ژیانی خۆی لە پێناوی شۆڕش و کوردایەتی و خزمەتکردنی زانست تەرخانکردبوو، جگە لەبەشداریکردنی چالاکانەی لەشۆڕشی ئەیلولدا، لەشۆڕشی نوێی گەلەکەماندا ڕۆڵی دیارانەی لەسەرکردایەتیکردنی شۆڕشەکەدا بینی و یەکێک بوو لەو سەرکردە دیارانەی کە چ لەسەرکردایەتی ی.ن.ک و چ لەنێو مەفرەزە سەرەتاییەکانی شۆڕش دا بەگیانی پێشمەرگانەوە ژیانی خۆی خستبووە خزمەتی شۆڕش و کوردایەتی. جگە لەوەش کە خۆی پیاوێکی ئەکادیمی بوو هەمیشە لەخەمی ئەوەدابوو کە گەلەکەی بەچەکی زانست و زانیاریی بەرەنگاریی دوژمنەکانی ببێتەوە، بۆیە چ لە دامەزراندنی زانکۆی سلێمانی (١٩٦٨) و دواتریش لە دامەزراندنەوەی زانکۆکەدا (١٩٩٣) لەپێشەوەی پشتیوان و داکۆکیکارانی دامەزراندنی ئەو ناوەندە زانستییە بوو، هەر بۆیەش لە ماوەی چەند ساڵی ڕابردوو توانی بە لێهاتوویی وەک سەرۆکی زانکۆی سلێمانی دێرێژە بەو خزمەتە بەرچاوانەی بدات و ڕۆڵی بەرچاوی هەبێت لە پێشخستن و گەشەپێدانی زانکۆکە، کە بەهەوڵی ئەو تێکۆشەرەو دڵسۆزانی تر، ئەمڕۆ نەک تەنیا لە کوردستان، بەڵکو لە سەرجەم عیراقدا بەزانکۆیەکی نموونەیی دادەنرێ. سڵاو لەگیانی تێکۆشەرانە و بەرزەفڕی کاکە دکتۆر کەمال خۆشناو و لەخوای مەزن دەپارێینەوە کە بە بەهەشتی بەرینی خۆی شادی بکات.

انا لله وانا الیه راجعون

مەکتەبی سیاسیی ی.ن.ک

٢٠٠٤/١٢/١٢

کۆبوونەوەیەکی سێ قۆڵی بۆ لێدانی پ.ک.ک

بە پێی هەواڵی ڕۆژنامەی **Hurriyet** ی تورکی، بڕیاروایە کە بە مەبەستی لێدانی جەنگاوەرانی کۆنگرەی گەڵ(پ.ک.ک)، عێراق، تورکیا و ئەمریکا کۆبوونەوەیەکی سێ قۆڵی ئەنجام بدەن. ڕۆژنامەکە لە زاری سەرچاوەی نزیک لە حکومەتی تورکیاوە ڕایگەیاندووە کەوا بالیۆزی ئەمریکا لە تورکیا ئێریک ئێدەلمان، لە دیدارێدا لە گەڵ سەرۆک وەزیرانی تورکیا ڕەجەب تەییب ئەردۆغان پێشنیازی ئەوەی کردووە کە کۆبوونەوەیەکی سێ قۆڵی لە نێوان تورکیا، ئەمریکا و عێراق ئەنجام بدرێت بۆ ئەوەی بە هەموو لایەک وا بکەن کە بوونی چەکدارییی پ.ک.ک لە (باکووری عێراق) کە بووەتە مایەی نیگەرانیی قۆڵی تورکیا، نەمێنێت. ڕۆژنامەکە وادەی ئەنجامدان و ئاستی ئەم کۆبوونەوەیەی ڕوون نەکردۆتەوە.

www.peyamakurd.org

پەیامی کورد

ژمارە ١٥ (ساڵی یەکەم) رۆژنامەیەکی هەفتانەی گشتییە ٢٠٠٤/١٢/١٧

پیرۆزبێت فیستڤاڵی گۆرانی کوردی



لاپەڕەی ٢

"باکووری عێراق" ـ بەناو کوردستانێکی ئازاد و ئارامدا

- لە ناو کوردستانی تورکیادا تەنانەت یەک وشەی کوردی لەسەر تابلۆیەکی گشتی نابینیت.
- گەڕاوەکانی کەرکوک پێش هەموو شتێک ترسیان لە دەستێوەردانی تورکیا هەیە.



شاندی GfbV لە پارلەمانی کوردستان- هەولێر

سەفەرنامەی کۆمەڵەی " گەلانی هەڕەشەلێکراو" Gesellschaft für bedrohte Völker

" لەو چرکەیەوە کە لە سنوور دەپەڕنەوە ئێوە میوانی ئێمەن"، ئاوا دڵشاد بارزانی نوێنەری حکومەتی هەرێمی کوردی باکووری عێراق لە ئەڵمانیا، شاندە حەوت نەفەرییەکەمان؛ شاندی کۆمەڵەی گەلانی هەڕەشەلێکراو- نیونەتەوەیی دڵنیاکرد. دواتر مەسعود بارزانی سەرۆکی پارتی دیموکراتی کوردستان پێی گوتم: ئێوە لە ناخۆشترین کاتی مەرگەسات و کارەساتی دڵتەزێنی گەلی کوردماندا، لە دژی گەل کۆڕی و کیمیاباران و ڕاگوێزانی زۆرەملیی، بۆ ڕزگاربوون لە نەمان و بەدەستهێنانی مافی چارەنووس پشتگیریتان کردین، ئێمە ئەو کارەی ئێوەمان لەیاد ناچیت. ئێمە بە دڕێژایی دوو هەفتە لەناو چیاکانی کورد (کوردستان)دا، لە دۆڵی بارزان، لە شارەکانی زاخۆ، هەولێر، سەلاحەدین و سلێمانی، هەر وەک لە چێشتخانە کۆن و نوێیەکاندا، هەروەها لە ماڵی هەڤاڵە کوردەکانیشمان، لە زانکۆ و وەزارەتە کوردییەکانیش چێژیاری ئەو میوانداریە بووین، زۆر هەڤاڵیشمان دۆزییەوە کە لە یەکێک لە دەوڵەتەکانی ئەڵمانیا یان نەمسا خوێندنیان تەواو کردووە و بە پرسی کوردەوە خەریکن. بەڵام پێش ئەوەی بێینە ناو کوردستانی عێراقەوە بە هەرێمی کوردی تورکیادا تێپەڕبووین، دواتر ئەو جیاوازییە زەقە ڕوون دەبێتەوە کە لە نێوان ئەو دوو هەرێمەدا هەیە. لە ناو کوردستانی تورکیادا دەبێ مرۆڤ هەنگاو بە هەنگاو لەگەڵ هەژارکردن و بندەستکردن و سەرکوتکردنی ١٥ ملیۆن کوردا بژی. تەنانەت یەک وشەی کوردی لەسەر تابلۆیەکی گشتی نابینیت، لەسەر تابلۆکانی ریکلام.. پڕوپاگەندەی بازرگانیش هەروەها لەبابەت مافی زمانەوە چاکسازی بەتەنها لەسەر کاغەز هەیە. ئەو پێشکەوتنە بچووکانەی کە لەو بوارەدا هاتوونە گۆڕێ وەک پڕۆگرامی کوردی کەمخایەن لە تەلەفزیۆندا و بوونی ئینستیۆتی کوردی لە ئەستەمبوولێ دوور، هیچ لەو بابەتە ناگۆڕن کە دیاربەکر پایتەختی نهێنی کوردە لە تورکیا. پەنابەران دیمەنی شار دیاریدەکەن، ئەوان دوو لەسەر سێی دانیشتوانی شار پێکدەهێنن و نزیکەی هەر هەموویان بێکارن و هیچ داهاتوویەکی ڕوونیان نیە. ئەوان ئەو خێزانە جوتیارانەن کە لە گوندە کاولکراوەکانیان بەزۆر ڕاونراون و ڕێگەیان پێنادرێت بگەڕێنەوە. لە سەردانەکەماندا بۆ لای سەرۆکی شارەوانی شاری دێرینی حەسەن کێف "وەهاب کوسین" گەشبینییەکمان هاتەڕێ، تاکو لە ساڵی ٢٠٠٠دا "کۆمەڵەی گەلانی هەڕەشەلێکراو" GfbV لە بەرلین کۆنفرانسێکی ڕۆژنامەوانی و وتووێژێکی بۆ نوێنەرایەتی ئەو مۆڵگە ٣٠٠٠ ساڵ دێرینە لەگەڵ حکومەتی فیدراڵی ئەڵمانیا ڕێکخست، کە بە ئارەزووی حکومەتی ئەو دەمەی تورکیا دەبوو بکرێت بە ژێر بەنداوێکەوە و ونبکرێت. ئێستا دوای ئەوەی کە "سەرەکۆزیری چاکسازییەکان" ڕەجەب تەیب ئەردۆغان کە لە هاوینی ساڵی ٢٠٠٤ دا لە شاری باتمان هەواڵی ڕزگارکردنی " حەسەن کێف"ی ڕاگەیاند، پێدەچێت ئەو مەترسییە دوورکەوتبێتەوە. هەروەها لە جوانترین دێر (کڵێسە)ی دییان " فەلە" ی سووری ئارتۆدوکسی لە تورکیادا مار گابریێل لە نۆر عابدین کە هەزاران ساڵە ئاسووری ئارامی زمانی لێنیشتەجێیە و دەکەوێتە سەر سنووری سووریا. عێراقە هەست بە گەشبینی دەکرێت. لێرەدا سیاسەتی چاکسازی ئەردۆغان بۆ یەکەمجار

بۆ لاپەڕەی ٣

چی دەزانیت دەربارەی کوردەکانی ئوردن؟

- کەمایەتییەکی دانەبڕاون و چەندین سەرۆک حکومەتیان تێدا هەڵکەوتووە..
- زۆربەیان کوردی نازانن و لە زمانی عەرەبیدا پسپۆڕن

لاپەڕەی ١٣

کورد لە دۆسێی هەلبژاردنەکانی عیراقدا

میوانانیئەم ژمارەیە:

- دکتۆر تەیسیر ئەلئالوسی (دکتۆرا لە ئەدەبی عەرەبی نوێ- پسپۆڕ لە بواری شانۆ)
- پرۆفیسۆر عەبدولئیلاهولسائیغ ـ ئەمریکا

لاپەڕەی ٦

دیدارێک لە گەڵ وێنەگری کەنالی وەرزشی تەلەفزیۆنی ئەڵمانی DSF فەرهاد عەبدولعەزیز کەرکوکی

لاپەڕەی ٧

سیستەمێکی سەرکەوتووی خواردن بۆ کەمکردنەوەی کێش لە مانگێکدا

لاپەڕەی١٣



یاسای نوێی ئەڵمانیا بۆ مافی پەنابەری

- لە یاسی نوێ دا تەنها ٢ جۆر مانەوە بۆ بێگانە پێش بینی کراوە.
- ئەو کەسانەی کەخاوەن سەرمایەی زۆرن بۆ بازرگانی، بە ئاسانی مافی مانەوە لە ئەڵمانیا وەردەگرن.

هوشیار عوسمان ـ ئەڵمانیا

چەند ساڵ پێش پارتی سۆسیال دیموکراتی **SPD** دەسەڵاتداری ئەڵمانیا، لە ڕێگەی وەزیری ناوخۆی، داوای گۆڕینی یاساکانی مافی پەنابەری کرد کە بەهۆی پارتە نەیارەکانی ئەم وڵاتە بەتایبەتی هەردوو پارتی **CSU,CDU** ڕووبەڕووی دژایەتی بووەوە. تا لە ئەنجامدا حکومەتی ئەڵمانیا پاشەکشەی لە هەندێک برگە کرد، بە ڕەزامەندی هەموویان لە سەر یاسایەکی نوێ ڕێکەوتن و هەردوو ئەنجومەنی یاسادانان دەنگیان لە سەر دا. لە سەرەتای ساڵی داهاتوودا ٢٠٠٥ لە تەواو ئەڵمانیا جێبەجێ دەکرێت. کە لێرەدا بە کورتی چاوێکی پێدا دەخشێنین:

یاسای نوێی پەنابەری، بەو کەسانەی کە لە بواری زانستییەکاندا پسپۆڕن یان خاوەن سەرمایەی زۆرن بۆ بازرگانی، بە ئاسانی مافی مانەوە لە ئەڵمانیا دەدات. هەروەها قوتابیانی دەرچووی زانکۆکانی ئەم وڵاتە.

بۆ ئەو کەسانەی کە دەکەونە بەردەم هێرشی تووندو تیژی سیکسی کە ئافرەتان و ئەوانە دەگرێتەوە کە لە گەڵ هاوڕەگەزی خۆیاندا ڕەفتاری سیکسی دەکەن ئاسان کاری بۆ وەرگرتنیان لە بەر چاو گیراوە.

ئەوانەی لە دەستی شەڕ و ناڕاوەی میللی گەرایی، نەک بیروباوەڕی سیاسی دژی ڕژێمی دەسەڵاتداری وڵاتەکانیان ، ڕادەکەن لە دادگادا زووتر بە خواستی پەنابەریان وەلامی باش دەدرێتەوە.

ئەو کەسانەی لە ئێستادا لە ئەڵمانیادا دەژین و مافی مانەوەیان نیە، بەڵام بە بریارێک پڵیس ناتوانێت دیپۆرتیان بکاتەوە، لە ساڵی داهاتوودا مانەوەی یاساییان پێ ئەدرێت.

ئەو کەسانەی لە بەر نەخۆشی و چارەسەر کردن دەرناکرێن.ئەگەر ٢ ساڵ بەو شێوە بووبن، ئەوا مافی مانەوەی یاسایی وەرئەگرن.

لە یاسی نوێ دا تەنها ٢ جۆر مانەوە بۆ بێگانە پێش بینی کراوە :

- **Niederlassungserlaubnis**
- **Aufenthaltserlaubnis**

ئەم دوو زاراوەیە لە ڕووی مانای واژەییەوە جیاوازی سەرەکییان نییە،بەڵکەمیان بە مانای ئەوە دێت یەکێک لە جێگەیەکدا ژیان و کاری دەچەسپێت.دووەمیان مانایەکی گشتی هەیە کەسێک بۆ ماوەیەکی کورت یا

بۆ لاپەڕەی ٣